chili pepper bîbera sorr

chills tasarr (Tasarr yê li min e. *I have chills.*)

chimney bixêrî (f)

chin erzînk (f)

chips (snacks) çips

chocolate (1) kekew (f) [hot chocolate drink]
 (2) nestele (f) [chocolate bar or candies]
 (3) (*see also* cocoa powder)

choice (*see* choose)

choke (v) hilingiftîn, hilingifte (Dihî tu hilingiftî. *Yesterday you choked [on food or water].*)

choose (v) bi xwe jê girtin, bi xwe jê bigire (Bi xwe jê bigire. Te kîşk divêt: av, şerbet, şîr? *Choose. Which do you want: water, juice, milk?*)

chop (v) hîr kirin, hîr (bi)ke (Pîvaza hîr ke. *Chop the onions.*)

chore xizmet (Xizmetekê bu min bike, Hana. *Do [a job / something / a chore] for me, Hana.*)

Christian (1) Fileh (m/f) [orthodox; from Kurdistan's Assyrian church]
 (2) Incîlî [nominal or evangelical]
 (3) Mesîhî (Ar) [nominal or evangelical]
 (4) (*see also* believer and believe (v))

Christmas 'Îd mîlada 'Îsaî

church dêr (f)

cigarette cişare (f)

cigarette lighter çeqmaq (f)

cinema sîneme

cinnamon darçîn (f)

circle (1) grrovirr (f)
 (2) daîre (Ar) (f)

circle (v) grrovirr kirin, grrovirr bike

circular (1) grrovirr
 (2) daîre (Ar)

circumcize (v) sinnet kirin, sinnet bike (Te kurrê xwe sinnet kir? *Did you circumcize your son?*)

circumstance delîv (f) (hevalê dilîvêt teng *all-weather / faithful friend = friend of difficult circumstances [idiomatic]*)

citizenship cinsîe (Tu Emrîke ne şêî cinsîe wergîrî heta pênc sala. *In American you can't get your citizenship until you've been here for 5 years.*)

city (1) bajêr (m)
 (2) bajêrr (m)
 (3) bacêr (m)
 (4) menteqe (f) (Ar)
 (5) beled (m) (Ar)
 (6) qeza (f) (Ar) [small, e.g., Zaxo]
 (7) cihê jîanê

city hall (1) mihaðe [of a big city]
 (2) qeymeqamî [of a small city]

clam qewqe'

clan 'eşîret (f) (Ar)

clap (v) qotan, biqote (Me desta qotan. *We clapped.*)

clarify (v) dîar kirin, dîar bike (Ka bu min dîar ke. *Please clarify this for me.*)

class (1) sef (f) (Ar)
 (2) jur (f)

claw (1) penc
 (2) penceruk

clean paqij

clean (v) paqij kirin, paqij bike (Amanêt xwe paqij ke. *Clean your dishes.*)

cleanser (for scrubbing) fas (f)

clear (1) safî (Ar) [no fog or pollution]
 (2) sahî [no clouds]
 (3) zelal [pure]

clever (capable) zîrek

clip (v) (1) bîrrîn, bibirre [with scissors]
 (2) pê ve girêdan, pê ve bigirêde [with a paper clip]

cloak (1) kurik (m)
 (2) 'eba (m) [black; worn by Muslim women]

clock se'et (f)

clogged up xetimî (Meşwêl xetimî. *The sink is clogged up.*)

close (to one's heart) (1) ezîz
 (2) emîn (Hevala min emîn e. *My friend is a very close friend.*) (Bawerîa min pê têt çinko emîn e. *My beliefs are very close to my heart.*)

close (v) girtin, bigire (Derrgehî bigire. *Close the door.*)

closet (1) mexzen (f) (Ar)
 (2) xezînk (f) (Ezê wê deynim xezînk xwe ve. *I'll put it in my closet.*)

cloth (1) pate (m) [for cleaning]
 (2) qimaş (m) [new fabric]

clothes cilik (pl)

cloud ewir (m)

cloudy ewir

club (playing card) sînek

coat qapît

cockroach sîsirk (f)

cocoa powder kekew (f)

coconut gîzahind(ê) (f)

coffee (1) qehwe (f) (Qehwe tax e. *Coffee is bitter.*)
 (2) neskafe [instant; made with sweet hot milk]

coffee cup (small) fincan (f)

coffee shop çayê xane

coffee table mêze (f)

coffin kifin (m)

coin (1) lîra
 (2) derhem

Coke kuk

cold (1) serrma (f) [sickness] (Serrmaê ezê girtîm. *I'm getting a cold.*)
 (Serrmaê yê li min daî. *I have a cold.*)
 (2) sarr [temperature] (Min sarr e. *I'm cold.*)
 (3) tezî [temperature] (Ava tezî bu min bîne. *Bring me cold water.*)

collander sefuk (f)

collect (v) (1) kum kirin, kum ke (Min bi xwe hindek heywanê biçîk kum kirin. *I collected some small animals.*)
 (2) lêk dan, lêk bide
 (3) standin, bistîne (Min kaşez ji wan stand. *I collected the paper from them.*)

college kûllîe (f) (Kûllîa 'Ilumê *College of Science*) (Kûllîa Adabê *College of Arts*)

cologne (1) lewente
 (2) ava gula

colony (1) bindest (m) (Emrîke bindestê Inglîzî bî. *America was a colony of England.*)
 (2) miste'mire (Ar) (m)

color reng (m) (Eve çi reng e? Eve rengê kesik e. *What color is this? It's green.*)

color (v) (1) elwan kirin, elwan bike (Ar)
 (2) reng kirin, reng bike
 (3) renga lê dan, renga lê bide

colorful (1) rengîn (Kurdistanê ya rengîn *colorful / beautiful Kurdistan*)

(2) milewin (Ar)
 (3) reng u reng
coloring book kitêba renga
comb şeh (m)
comb (v) şeh kirin, şeh ke
come (v) hatin, bê (were) (Ez hatim. *I came.*)
come back (v) (1) zivirrîn (ve), bizivirre (ve) (Kengî tu zivirrî ji sîkê?
When did you come back from the market?)
 (2) hatin ve, were ve
 (3) vegeîn, vegere (Dihî ez vegeîm ji South Carolina. *I came back from South Carolina yesterday.*)
come down (v) hatin xwar, were xwar
come together (v) (1) kum bîn, kum bibe (her çi cihekê dû yan sê bi navê min kum bîn *for where two or three come together in my name*)
 (2) pêk hatin, pêk bê (were) (Yêketî u demokratî pêk hatin. *PUK and PDK came together / made an agreement.*)
come up (plants) (v) serkeftin, serkeve (Ew zî bi serkeft. *It came up quickly.*) (Evroke 2 roja şîn bîn u serkeft. *(My flower) sprouted and grew up in 2 days.*)
comfort (v) xweş kirin, xweş bike (Ez dê dilê te xweş kim. *I'll comfort you(r heart).*)
comfortable (1) mirtaî (Ar) [people, situations]
 (2) rehet [people, situations]
 (3) xweş [things]
comforter (for a bed) (1) cudelîa ser textî [thin]
 (2) ferîşa ser textî [thin]
 (3) futka ser textî [medium]
 (4) lihêfka ser textî [thick]
command (v) ferman dan, ferman bide (Xudanê wî ferman da wî bifruşin. *His master ordered that he be sold.*)
command(ment) (1) ferman (f) (2) beramber(?)
commit (v) girtin, bigire (Em rojîa bu Xwedê digirîn. *We commit the days to God.*)
commit adultery (v) dehmen pîsî kirin, dehmen pîsî bike (Wî dehmen pîsî kir. *He committed adultery.*)
community school [idiomatic] kumalgeh (f) (Ew çû ye kumalgehê ye. *He graduated from community school, i.e., from the school of hard knocks / life / experience.*)
compassion (Dilê wî pê ve man. *His heart filled with compassion.*)
compassionate (Dilê min bi te ve ma. *He was compassionate.*)
complain (v) (1) gazinde ... kirin, gazinde ... bike (Min gazinde ji xoşka xwe kirin. *I complained about my sister.*) (Min gazinda te kir. *I complained about you.*) (gazinda jê bike *show him his fault*)

(2) zirran, bizirre [very informal] (Ew wek kerî dizirrit. *He sounds like a donkey [because he's complaining and griping so much].*)
 (3) qese gotin, qese bêje (Rêzanê qese gotin wextê Suzan çû nik hevala xwe. *Rêzan grumbled when Suzan went to her friend's house.*) (Demê ewan dînar wergirtî qese gûti ne xudanê xanî. *When they received the denarius, they grumbled against the landowner.*)
complete (1) dirist
 (2) xilas
 (3) tamam
complete (v) (1) dirist kirin, dirist bike
 (2) xilas kirin, xilas bike
 (3) tamam kirin, tamam bike
computer kemputer (f)
computer programmer [idiomatic] (Ew programî çêdikît. *He does programming*)
conception daykbisûn (f)??
concerned ne bê xem
condemnation sizadan (f) (Ew dê hêne sizadan. *They will have condemnation / They will be condemned.*)
conditioner (for hair) mikeyif
condom lastîk (m) (Jiberî bê def te lastîkî kit ber xwe. *Before you have sex, put on a condom.*)
conductor cabî
confess (v) aşkira kirin, aşkira bike (Wî aşkira kir hemî tiştê xwe. *He confessed everything.*)
confidence bawerî (f) (Min bawerî bi te heye. *I have confidence in you.*)
confused şaş
confused (v) (*see be confused*)
Congratulations! Ser xêrê bit!
conscience derûn (m)
conscientious zemîre (Ar) (Zemîre heye. *She's conscientious.*)
consequences îeq (m) (Hemî tişt ji Nazdarê birîn, îeqê wê ye, çinkî naçite mektebê? *If Nazdar doesn't go to school, the consequences are that they'll take all of her things from her.*)
conservative bi sitar (Cilkê min bi sitar in. *My clothes are conservative.*)
constipated qeviz (Ez qeviz im. *I am constipated.*)
contact lenses adese (Çavêt wê adese ne. *She wears contacts.*)
contagious (v) vegeîn, vegere (Nesaxîa wê navegerit. *Her sickness isn't contagious.*)
container (metal; for milk, oil, yogurt, etc.) qodîk (f)

continent qare (f) (qara Emrîka jêrî *continent of North America*) (qara Emrîka jurî *continent of South America*)

continuously ser êk (Baran ser êk têt. *It rained continuously.*)

contract mi'amilet (f) (Min erdek kirî; ezê êm mi'amileta wê çêkim. *I bought a piece of land; I'm writing up the contract.*)

contractions of prepositions and (pro)nouns

(1) pê = bi + wî / wê (da ez şî pê bikim *in order to marry [with] him.*)

(2) jê = ji + wî / wê (Jê bigerre. *Leave it.*)

(3) tê = di + wî / wê (Ez tê gehestim. *I understood it.*)

(4) lê = li + wî / wê (Min lê gerra. *I looked for it.*)

conversation axiftin (f)

convert murted (Ew murted e. *He's a convert [to our religion].*)

convert (v) çûn, biçe (herre) (Ew çû dînek dî. *He converted to another religion.*)

cook (1) şef

(2) (Ew xwarinê çêdikit. *He makes food*)

cook (v) (1) çêkirin, çêke

(2) lênan, bilêne (Te xwarina xwe lêna? *Did you cook your own food?*)

cooked (1) kelandî [vegetables]

(2) çêkirî [meat]

cookie sheet sênî

cookies (1) piskêt

(2) piskuêt

(3) kade u kesme (f) [for Kurdish holidays]

(4) kilêçe (f) (Ar) [for Kurdish holidays]

(5) kade (f) [Kurdish; with filling]

(6) kesme (f) [Kurdish; no filling]

cool sarr

cool (v) tezîn??. biteze (Min gusik bire ser banî da bitezit. *I brought a jug [of water] up on the roof so that it would cool.*)

coop kulik (m) (kulkê mirîşka *chicken coop*)

copy (v) (1) istînsax kirin, istînsax bike (Ez evî rismî istînsax dikim. *I'm copying this picture.*)

(2) tebe' kirin, tebe' k(bi)ke [photocopy] (Van tebe' ke. *Print these.*)

copy book defter (f)

cord (1) weyr (f) [wire] (weyrê stîr *thick wire*) (weyra telefonê *telephone cord*)

(2) qeytan (f) [cotton or silk] (qeytana pêlava xwe *your shoelace*)

corn genim şamî

corner (1) kujî (m) (Hana serê xwe kujîê mêzê da. *Hana bumped her head on the corner of the table.*)

(2) qolaç (f) (Mala min yê li qolaça mehlê ye. *My house is on the*

corner of the general area.) (Mala min yê li qolaça "E" Street u Main Street. *My house is on the corner of "E" St. and Main St.*)

(3) rukin (m) (Xanîê min li ruginê ye. *My house is the first house in a row of houses.*)

corral guva çêla

correct dirist

correct (v) dirist kirin, dirist (bi)ke (Kahezê min dirist bike. *Correct my papers.*)

cost (1) heq (m) (Heqê vî perdaî dullarek. *The cost of this glass is one dollar.*)

(2) biha (m)

costume jewelry murik (f)

cottage cheese spil (m)

cotton pembî (m)

couch qenepe (f)

cough kuxik (f) (Kuxikê li Hanaê ye. *Hana has a cough.*)

cough (v) kuxîn, bikuxe (Ez dikuxim. *I'm coughing.*)

could (1) (*see "subjunctive" in the grammar book*)

(2) (Xwezî ka ez çû bam Kurdistanê. *I wish I could go to Kurdistan.*)

(3) (Xwedê xêra min vîa. [*said when explaining why I couldn't do something I had planned to do*])

count (v) (1) hijmartin, bihijmêre (Min gîz hijmartin. *I counted the walnuts.*)

(2) (*see also number*)

counter kewenter (f)

country (1) dewlet (f) (Ar) [political]

(2) weten (Ar) (m) [political]

(3) welat (m) [political]

(4) çul (m) [no houses; countryside]

(5) zevî (f) [no houses; farmland]

(6) (*see also nation state*)

courageous bi cir'et

course dawire

courthouse (1) mehkeme

(2) da'îra mehkemê

courtroom (1) mehkime (f)

(2) dadgeh (f)

courtyard hewş (f)

cousin (1) kiça mam [father's brother's daughter]

(2) kurrê mam [father's brother's son]

(3) kiça met [father's sister's daughter]

(4) kurrê met [father's sister's son]

(5) kiça xal [mother's brother's daughter]
 (6) kurrê xal [mother's brother's son]
 (7) kiça xalet [mother's sister's daughter]
 (8) kurrê xalet [mother's sister's son]
 (9) pismam (m) [father's brother's son]
 (10) dutmam (f) [father's brother's daughter]

covenant peyman (f)
cover (v) (1) nixaftin, binxêve (Min nixaft. *I covered it [e.g., the yogurt].*)
 (2) girêdan, girêbide (Serê xwe girêde. *Cover your head.*)
cover case rî (Rîêt duşekêt xwe bişo. *Wash your duşek covers.*)
cow çêl (f)
cowardly bê cir'et
crab kevilace
cracked derizî (Dîwar derizî ye. *The wall is cracked.*) (Parasîa wê derizî wextê timbela wê di'emî. *Her rib cracked when her car crashed.*)
cracked wheat (1) girar (f)
 (2) savar (m)
cradle (1) dêdik (f) [American]
 (2) lehendik (f) [Kurdish]
 (3) landik (f) [Kurdish]
crafty zîrek
crash (v) de'mîn, bide'me (Ar) (Heyva neh seyara min de'mî. *My car crashed / was in an accident in September.*) (Parasîa wê derizî wextê timbela wê di'emî. *Her rib cracked when her car crashed.*)
crawl (v) çalepka çûn, çalepka biçe (herre) (Kevî çalepka diçit. *Kevî crawls.*)
crayon (1) elwan (m)
 (2) qelem elwan (m) (qelem elwanî pirteqalî *the orange crayon*)
 (3) reng (m) (qelemêt reng u reng *crayons*)
crazy (1) dîn
 (2) sefî [only slightly crazy]
 (3) mendehuş
cream şîrê bi duhin
create (v) xeliq kirin, xeliq bike (Ar)
 (2) çêkirin, çêke
 (3) deynan, deyne
creation xeliqandin (f)
credit (letter of) bawername (f)
creek celal (f)
crib (1) text (m)
 (2) textê biçîka

criminal gunnebar (Heker gunnebar ne ba... *If he weren't a criminal ...*)
crochet hook (1) sinar (m) (Ar)
 (2) bîze (bîza sufî *yarn hook*)
crocodile (1) neheng
 (2) tîmsehî (Ar)
crooked (1) çewit
 (2) xwehir
crop (1) ber (m)
 (2) berhem (da heta ku berhemekê baş daî *until it gave a good crop*)
cross out (v) (1) jê birin, jê bibe (Min jê bir. *I crossed it out.*)
 (2) xirab kirin, xirab ke
cross over (v) (1) derbas bîn, derbas bibe (Ez derbas bîm. *I was finished / crossed over.*)
 (2) derbas kirin, derbas bike (Min derbas kir. *I crossed over.*)
crow (v) bang dan, bang bide (Dîkilî bang da. *The rooster crowed.*)
crowded qerrebaliş (f)
cruel xedar
crutches gulte (Ew bi gulta bi rê ve çit. *He walks with crutches.*)
cry (of the Muslim man who calls for prayer) bang (m)
cry (v) (1) girîn, bigirî
 (2) (*see also tears*)
crying girî (f) (Girîa wê ne xweş bî. *Her crying was awful.*)
cube mike'eb (Ar) (f)
cubicle mike'eb (Ar)
cucumber (1) xîar (m)
 (2) tîtik (m) [small]
cud (1) 'elik (m) (Ar)
 (2) benişt (m)
culture 'edet (m) ('Edetî Kurdistan: ew kiras u fistan bikin ber xwe. *Kurdish culture: wearing the kiras u fistan*) (Ez kitêba 'edetê Kurdî çêkim. *I'm writing a book of Kurdish culture.*) (Wextê ez çûm Kurdistanê, min hindek 'edetê Emrîka hêlan. *When I went to Kurdistan, I gave up some of my American culture.*)
cumin (?) rehazer (f)
cup (1) kûp
 (2) fincan (f) [small; for coffee]
cup (for coffee, tea) (1) kup (f)
 (2) xarîfk
cupboard (1) kewenter (f)
 (2) dulab (f) [for dishes, with glass doors] (Kurrê Çîmenê dulaba min rakir. *Çîmen's son set up my china cabinet.*)
 (3) çêydank (f) [for dishes, with glass doors]

curiosity mereq (f)
curious mereqçî
curling iron fêrr (f)
curly (1) xelek
(2) xelesa hîr [hair]
curry karî (f)
curse (1) le'ne (f)
(2) nifir(în) (f) (Nifirîna min bi cih hat. *My curse happened.*)
curse (v) (1) nifir(în) lê kirin, nifir(în) lê bike (Min nifirîn li Sedami kirin. *I cursed Saddam.*)
(2) le'ne kirin, le'ne bik
curtain perde (Tu perde î bu min. *You are my hiding place / curtain.*)
curved piçek grrovirr
custodian feraş (m)
custom 'edet (m)
cut (v) (1) ker kirin, ker ke [cloth for sewing] (Qimaşê xwe ker ke. *Cut your cloth.*)
(2) qet kirin, qet ke [into big pieces with a knife] (Goştî qet ke. *Cut the meat.*)
(3) hîr kirin, hîr ke [into small pieces with a knife] (Xîarî hîr ke. *Cut the cucumber.*)
(4) birrîn, bibirre [with scissors or a knife] (Min pirrça xwe birrî. *I cut my hair.*)
(5) qosandin, biqosîne (Ar) [with scissors] (Min pirrça xwe qosand. *I cut my hair. / I got my hair cut.*)
(6) qurtal kirin, qurtal bike (Min vê darê qurtal kir ji binê. *I cut this tree down at the base.*)
cut down (v) birrîn, bibirre (Min dar birrî. *I cut the tree down.*)
cut off (v) birrîn, bibirre (Dixturî destê wî birrî. *The doctor cut his arm off.*)
cute (1) taze [babies, clothes, flowers, plates, things]
(2) delal [animals, babies, people]
cutting board textik (m)

d

daily her roj
dairy food spîatî
damage (v) pîç kirin, pîç bike (Wextê baî u babelîsk hatî, mala me pîç kir. *My house was damaged by the hurricane.*)

damaged pîç (Çavka teboxê pîç bî. *The stove coil was damaged.*)
dance (v) reqisîn, bireqise
dangerous xeter
dark tarî (keskê tarî *dark green*)
darkness tarî (f)
dark-skinned (1) ismer
(2) reş [black]
(3) brunzî (Ar)
date (1) tarîx (f) [day] (Evroke çi tarîx e? *What's today's date?*) (tarîxa rojê *date of the day*) (tarîxa deyk bîna te *your birthday/date*)
(2) [idiomatic] (Evro çendî heyve ye? Evroke bîst u çar e. *What's today's date? Today is the 24th.*)
(3) qesp (f) [dried fruit] (qespê ter *fresh date*)
(4) xorme (f) [dried fruit]
(5) riteb (f, pl) (Ar) [fresh fruit]
date syrup duşav (f) (Teñîn u duşav xweş e. *Teñîn and date syrup is delicious.*)
daughter (1) kiç (f) (2) kiçik (f)
daughter-in-law bîk (f)
David Daûd
dawn spêde (f)
day roj (f) (serê rojê / rojê hemîa *all day long*) (roj bu rojê *day by day*) (her dû rojê çûin *for the last two days*) (betira pêr *three days ago*) (roja deyk bîna te *your birthday/date*) (her du sê roja *a few days*) (her roj *every day*) (rojekê e êkê ne *every other day*) (her dû roja carekê *every two days*)
day after (1) roja dî
(2) roja dîv ... da (Roj dîv Pêncşembê day çi ye? *What is the day after Thursday?*)
day after tomorrow duzbe
day before yesterday pêr
day off (1) îcaze (Kîş rojê tu betal î? / Kîş rojê te îcaze heye? *Which day to you have off?*)
(2) 'etle (f)
daycare dayîn (Min kiça xwe deyna def dayînekê. *I left my daughter with the daycare.*)
daydream (v) (1) hizirêt xwe kirin, hizirêt xwe bike (Tu î hizirêt xwe dikî? *What are you daydreaming about?*)
(2) tefkîr kirin, tefkîr bike (Ar) (Tu çi tefkîr dikî? *What are you thinking / daydreaming about?*)

daylight savings time (1) (se'et heft bit hest 7:00 becomes 8:00)
 (2) (se'etekê pêş / paş ve dibîn *one hour back / forward*)

dead (1) hîşik [plants]
 (2) mirî [people, animals] (mirovê mirî *dead person*)

deaf (1) kerr (Ew kerr e. *He's deaf.*)
 (2) [idiomatic] (Guhêt wî giran e. *He's hard of hearing.*)
 (3) (*see also ear*)

dear (1) 'ezîz (Tu 'ezîzê min î. *You (m) are my dear [friend].*)
 (2) delal (Tu delala min î. *You (f) are my dear [friend].*)
 (3) emîn (Hevala min emîn e. *My friend is a very dear friend.*) (Bawerîa min pê têt çinko emîn e. *My beliefs are very dear to my heart.*)

death mirin (f) (death bed *terimê mirî*)

debt (1) qeriz (m) (Wî qerzê hey. *He has a debt.*)
 (2) (*see also loan*)

debtor (who doesn't pay back his debt) (Wî gunnehbarîê kir. *He didn't pay back his debt.*)

deceitful (1) ne tebitî
 (2) şeytan [Kurds usually don't say this word]

deceive (v) şula xwe veşartin, şula xwe veşêre (Wî şula xwe veşart. *He hid his information. / He deceived [us].*)

December (1) Kanîna êkê
 (2) heyva duzde (f)

decide (v) qerar dan, qerarê bide (Mi qerar da gel te bixwînim. *I decided to study with you.*)

deck (of a house) hîewş (f)

decorate (v) bixemilîne (Ew dê timbêla bikê xemilînin. *They'll decorate the bride's car.*)

decoration tazahî (Perde bu tazahî ne. *The curtains are (just) for decoration.*)

decree ferman (f)

deeds kar (m)

deep (1) kîr (Nîva behirê kîr e. *The middle of the ocean is deep.*)
 (2) nuqî (Min nuqî di avê da ve da. *I dove deep in the water.*)
 (3) giran (nivistinekî giran *a deep sleep*)

deer (1) xezal
 (2) xezal (Ar)

degree (1) derece (Te çi derece heye? *Which (college) degree do you have?*)
 (2) nimire (Te çi nimire heye? *Which degree (from college) do you have?*)
 (3) şihade (Te çi şihade heye? *Which (college) degree do you have?*)

deliver (v) (1) qurtal kirin, qurtal bike (Me ji ewê çewit qurtal bike. *Deliver us from the evil one.*)
 (2) tewzî'e kirin, tewzî'e bike

delivery person sa'îê berîdê

demand (v) (1) xwastin, bixwaze
 (2) daxwaz kirin, daxwaz bike (Tu çawa ji min daxwaz dikî avê bideme te? *How is it that you demand some water from me?*)

democratic demokratî (Ez hês ji partî demokratî dikim. *I like the democratic party.*)

demon cin

denarius dînar

dental assistant berdeskê dixturî

dental floss (1) taê yê paqijkirna didanê
 (2) dezîê didanê

dentist dixturê didana

dentures taxima didana

deny (v) hîaşa kirin, hîaşa bike (Ewî hîaşa kir. *He denied it.*)

deodorant dermanê bêhinê yê bin çenga (Dermanê bêhinê li bin çengê xwe bike! *Use deodorant!*)

dependent (Her harî karî divêt. *He wants help with everything.*)

depressed (1) dil ... teng (Dilê min teng bi. *I was depressed.*)
 (2) bêhin teng
 (3) melîl
 (4) (*see also xem*)

depth (1) kîrahî (f)
 (2) kîratî (f) (Kîratîa avê sed metir e. *The depth of the water is 100 meters.*)

descendant (1) ber (m)
 (2) [idiomatic] (ji bine mala Harunî *a descendant of Aaron*)

descendant of the prophet Muhammed sêyid (m/f)

describe (v) wesif kirin, wesifê (bi)ke (Wesfê xanîê Dilnazê bike. *Describe Dilnaz's house.*) (Ez hês dikim wesfê min bikî. *I'd like for you to describe me.*)

description wesif (f) (Bu min wesfa mala xwe bike. *Describe your house to me.*) (Wesfa mala min eve: ... *This is the description of my house: ...*)

desert sehirra (f)

designate and distribute (v) belavekin, belaveke (Mala zavaî dê ser mala belavekin. *The groom's family will designate and distribute [the things].*)

desire (wish) (1) qest (f) (Qesta min ez siîfa te bikim. *My desire is to see how you're doing.*)

(2) meqsed (f) (Meqseda min e ez biçim sîkê. *My desire is to go to the market.*)
 (3) ħeq (m) (Ĥeqê min e ez biçim Kurdistanê. *My desire is to go to Kurdistan.*)

desk mêze (f)

destroy (v) (1) xirab kirin, xirab bike (Wan sikehê qîtarê xirab kir. *They destroyed the train track.*)
 (2) pîç bîn, pîç bibe (Seyarê min pîç bî. *My car was wrecked.*)

develop (v) pêş keftin, pêş bikeve (Ĥeta dû salê dî Sentera Kurdî dê pêş kevit. *The Kurdish Center will develop well in a couple of years.*)

develop photos (v) (1) istînsax kirin, istînsax bike (Ezê risimî istînsax kim. *I will develop pictures.*)
 (2) risim şîştin, risima bişo (Ez dê risima şom. *I will develop the photos.*)

developed (v) (see be developed)

development pêşkeftin (f) (Milletê Kurd pêt vî pêşkeftinê ye. *The Kurds need development.*)

devilish (1) mel'în
 (2) ne tebitî
 (3) şeytan [Kurds usually don't say this word]

devoted (Gelek çavê wê lê ye. *She is very devoted.*)

diabetes (1) sukerî (Min sukerîê hey. *I have diabetes.*)
 (2) nesaxîa şekirê

dial (v) (1) pîta lê dan, pîta lê bide (Min tîla xwe pîtêt telefonê da. *I dialed (pushed) the buttons on the telephone.*)
 (2) reqemê lê dan, reqemê lê bide

dialect (1) şiklê ezman (m) (Gelek şiklê ezmanê Kurdîê hey. *There are many Kurdish dialects.*)
 (2) şîwe (Gelek şîwe hene nav ezmanê Kurdî. *There are lots of Kurdish dialects.*)

diamond (1) dînar [playing card]
 (2) elmes (f) [gem]

diarrhea [idiomatic] (Zikê min diçit. *I have diarrhea.*) (Zikê wî çû. *He has / had diarrhea.*)

dice remil (f)

dictate (v) gotin, bêje

dictator ĥakimek zalim

dictionary (1) qamus (m) (Ar)
 (2) ferrheng (m)

die (v) mirin, bimre (Hevalê min mir. *My friend died.*) (Heker ew çû ba dixurî, ne dimir. *If she had gone to the doctor, she wouldn't have died.*)

diet (Dê tu parêzê bigirî. *You will change your diet.*)

difference between (1) feriq (f) (Feriq navbeyna biçîka wê u kiça wê yazde heyv e. *There are 11 months difference between her baby and her daughter.*) (Çi feriq heye di navbeyna kiçê u kurrkî da? *What's the difference between girl and boy?*) (Çi feriq beyna wan da heye? *What's the difference between them?*)
 (2) 'ekis (f) (Ar) ('Eksê wan çi ye? *What's the difference between them?*)
 (3) beyna (Ferqek heye beyna kiçkê u kurrkî. *There is a difference between the girl and the boy.*)

different from (1) feriq (f) ("A" feriq e ji "B-ê". "A" (is) different from "B". "A" ji "B-ê" ferqa. "A" (is) different from "B".) (Feriqê hey. *There are differences.*)
 (2) ne wek (Şîrîn ne wek Dilnazê ye. *Şîrîn is different from Dilnaz.*)
 (3) ne ştî (Tu ne ştî wê î. *You are different from her.*)

difficult (1) zehmet ('Erebî zehmet e. *Arabic is difficult.*)
 (2) giran (Inglîzî giran e. *English is difficult.*)
 (3) tengavî (Ew tengavî ye. *It was difficult.*) (wextê tengavî a difficult time)
 (4) teng (hevalê dilvêt teng *all-weather / faithful friend [idiomatic]*)
 (5) şaq (Çend şaq e! *This is very difficult!*)

dig (v) kulan, bikule

dime deh (f)

dining room oda xwarinê

dining table mêza xwarinê

dinner (evening meal) şîv (f) (Te çi xwar evro şîvê? *What did you eat for dinner?*)

dinosaur deynesor (Deynesor xerîb e bu min; min ne dîtî ye.) (*Dinosaur is unknown; I've never seen one.*)

diploma şihade (f)

directions (Tu dişê rêkê nîşa mi bidî? *Can you show / tell me how to get there?*)

director (1) xudan
 (2) mes'ul
 (3) midîr

dirt ax (f)

dirty pîs (Destê min pîs e. *My hand is dirty.*)

dirty clothes basket selka cilkê pîs

disabled seqet

disaster mikader

discard (v) (1) deynatin, deyne (Min karte deynat. *I discarded the card.*)
 (2) havêtin, bavêje

disciple (1) talib (m)
 (2) talîbe (f)
 (3) qotabî (m/f)
 (4) şagird (f/m) (şagirdêt ‘Îsaî *disciples of Jesus*)

disciple (v) nîşa ... dan, nîşa ... bide (‘Îsaî nîşa wan da. *Jesus disciplined them.*)

discipline ciza (m) (Cizaê wê gelek e. *Her punishment is a lot.*)

discipline (v) (1) ciza kirin, ciza bike (Min Hana ciza kir. *I disciplined Hana.*)
 (2) ceza kirin, ceza bike

discuss (v) (1) dan u standin kirin, dan u standin bike (Min dan u standin li kir li gel mi’elima Hanaê. *I had a discussion with Hana’s teacher.*)
 (2) behsa kirin, behsa bike

disease [infectious] telqîhî (Min şirenqa telqîhî deyna de Hanaê da ew ne sax nabit. *I gave Hana an immunization shot so that she won’t get sick.*)

disfigure (v) têk birin, têk bibe (Ewê navçavêt xwi têk diben. *They disfigure their faces.*)

disgrace (1) hetik (f) [a very, very bad disgrace] (Te hetka min bir. *You disgraced me.*)
 (2) ‘eyb (f) [slightly bad] (‘Eyb e. We ne ke! *Don’t do that. It’s shameful / disgraceful.*)

disgraceful ‘eyb (‘Eyb e, Roj! Rîne xwarê! *That’s disgraceful, Roj. Sit down.*)

disgusted (1) ‘aciz
 (2) ‘êciz

dish aman (m)

dish cabinet bufê (m)

dish drainer salik

dish soap sabîna amana ya ruhin

dishwasher xesale (amana)

dislocate (v) xelhandin, bixelhe (Min milê xwe xelhand. *I dislocated my shoulder.*)

disobey (v) (1) (*see obey (v)*)
 (2) me’ sîate kirin, me’ sîate bike (... çinko ewana me’ sîate Xwedê kirin. *... because they disobeyed God.*)

disorganized ne lêkdaî

distance dîr

distribute (v) (1) lêk vekirin, lêk veke
 (2) belav kirin, belav bike

ditch korik (f) (Ez ketim di korikê da. *I fell into the ditch.*)

dive (v) (see *head first*)

divide (v) (1) lêk vekirin, lêk veke (Ez dê van piskuêta lêk vekim. *I’ll divide these cookies.*)
 (2) teksîm kirin, teksîm ke (Ar)
 (3) belave kirin, belave bike [math]

divide among (v) behira ... kirin, behira ... bike (Min her êkê behira wî daî. *I divided [the food] among them.*)

division belavekirin (f)

divorce (v) ber dan, ber bide (Ahmedî jina xwe ber da. *Ahmed divorced his wife.*) (Zuzanê mêrê xwe ber da. *Zuzan divorced her husband.*)

divorced berdaî (Ev jinke berdaî ye. *This woman is divorced.*)

dizzy gêj (Ez gêj im. *I feel dizzy.*)

do (v) (1) kirin, bike (Wan çi kir? *What did they do?*) (Vî şulî bike. *Do this work.*)
 (2) we kirin, we bike (We ne ke! *Don’t do that!*) (We bike. *Do it [in the way that you want to do it].*)

do laundry (v) balav kirin, balav bike (Ezê balav dikim. *I’m doing laundry.*)

do miracles (v)?? seyr kirin, seyr bike

do one’s hobby xwe mijîl kirin, xwe mijîl bike (Tu dê xwe çi mijîl kî? *What will you do for a hobby?*) (Ezê xwe mijîl dikim. *I’m doing my hobby.*)

do witchcraft (v) seyr kirin, seyr bike??

do wrong (v) xelet bîn, xelet bibe (Ez xelet bîm. *I did wrong.*)

doctor (1) dixtur (m/f) (Ar) [general]
 (2) diktur
 (3) textir
 (4) hêkîm (m/f) [doctor who didn’t attend school; animist]
 (5) nujdar (m/f)
 (6) dixturê jinka (m) [OB-gyn]
 (7) dixturê batinî (m) [internist]
 (8) dixturê a’saba (m) [neurologist]
 (9) dixturê biçîka (m) [pediatrician]

doctor’s orders parêz (f) (Ez ne şem şekirê bixwim. Ez parêzê digirim. *I can’t eat sugar; doctor’s orders.*) (Parêz ez çayê navexwim. *The doctor’s orders are that I can’t drink tea.*) (Tu parêzê ji çi digirî? Ez parêzê ji duhinî. *What can’t you eat? I can’t eat oil.*)

dog se (m)

doll bîk (f)

doll house (1) l’abê biçîka
 (2) xanîek biçîkê

dollar dular (m) (735 dular \$735)
domestic animals heywanê elif
dominance desthelatî (f)
donkey (1) ker (m)
 (2) caş(ik) (m) [foal of a donkey]
donkey sound (v) zirran, bizirre (Suzan, ka wek kerî bizirre. *Suzan, make the donkey sound.*) (Ew wek kerî dizirrit. *He sounds like a donkey [because he's complaining and griping so much]. [very informal]*)
donkey's sound zirrzirr (f)
door (1) derrgeh (m) (Derrgehî bigire. *Shut the door.*)
 (2) der (m) [said by villagers]
dormitory qisim (m) (qismê 'ilumê [college of] science dormitory) (Ez li qisimê daxilî bîm wextê ez li kulîê. *I lived in a dormitory when I was in college.*)
dove kutir (f)
down xwar (Xwarê bixwîne. *Read down [the column].*) (Ji selal heta xwarê bixwîne. *Read from the top down.*) (Ji xwarê heta selal bixwîne. *Read from the bottom up.*) (Wextê tu bêî xwarê ... *When you come down ...*)
downhill ser nuşîvî (Rêka min ser nuşîvî ye. *My way [the road] goes downhill.*)
downstairs xwarê
downward xwar
drain qestele (f)
drapes perde
draw a picture (v) risimî çêkirin, risimî çêke
drawer çekmeçe (çekmeça bîfê *dresser drawer*)
drawing risim (m)
dream xewn (f) (Şevê dî min xewnek xweş dît. *Last night I saw / had a good dream. = Last night I dreamed.*)
dress (1) 'ezî (m)
 (2) kiras (m)
 (3) (*see also kiras u fistan and kiras u kurtek*)
dress (oneself) (v) ber xwe kirin, bike ber xwe (Biluzî bike ber xwe. *Put on the sweater.*) (Bike ber xwe. *Dress yourself.*)
dresser (1) bîf (f)
 (2) komedîn (f)
drill berîne
drink (v) vexwarin, vexwe (Min Bepsî vexwar. *I drank the Pepsi.*)
drinks vexwarin
dripping çipçip (Çipçipa avê ye ji heneffê têt. *The water is dripping from the faucet.*)

drive (v) (1) timbêl hajutin, timbêlê bihaju (Min timbêl hajut. *I drove [the car].*)
 (2) timbêl hajotin, timbêlê bihajo (Min timbêl hajot. *I drove [the car].*)
 (3) da dan, da bide (Min seyare da da. *I drove the car.*)
 (4) (*see also ride*)
driver (1) sayiq (m)
 (2) (*see also owner*)
driver's license (1) îcaze (Ezê çim îcazê înim der. *I'm going to go get my driver's license.*)
 (2) îcaza şîaqetê
driveway (1) hewş (f)
 (2) rêka geracê
driving (1) şîaqet (f) (Kengî tu dê şîaqetê nîşa min dî? *When will you show me how to drive?*)
 (2) seyar (f) (Ez dê seyarê nîşa Çîmenê dim. *I will give Çîmen a driving lesson.*)
drop çipik (f)
drop (v) ber dan, ber (bi)de
drought hîşik (f)
drown (v) (1) xeniqîn, bixeniqe (da ne xeniqin *so they don't drown*)
 (2) xeriqîn, biheriqe (Ar)
drugs (1) muxedîr (m) [illegal]
 (2) minewim (m) [make you drowsy]
drum dehol (f)
dry (1) ziha [clothes, hands, skin, ground, earth]
 (2) hîşik [plants, air, weather, bread, river]
dry (v) ziha kirin, ziha bike (Amana ziha bike. *Dry the dishes.*)
dryer (for clothes) xesala zihakirne
duck bet (f)
dumb lal
dump (1) gîfank (m)
 (2) kavil (m)
dungeon (1) zîndan (f)
 (2) hêbis
 (3) sicin
during (1) wextê (Wextê îcaza min ezê çim Holende. *During my vacation I'll go to Holland.*)
 (2) da (Heyva sê da ez çûm Holende. *During March I went to Holland.*)
dusk meşreb (f) (evro meşreb *today at dusk*)

dust tuz (f) (Gelek tuz li ser televizîunê. *There's lots of dust on the television.*)

dust (with furniture polish) (v) paqij kirin, paqij bike

dust pan hestîfka ziblî

dust ruffle çerçef (f)

dust storm (1) 'asîfe (f)

(2) babelîsk

dusty tuz (Gelek tuz e. *It's very dusty.*)

Dutch (people; language) Holendî

dwelt (v) man, bimîne

dyed (hair) sobeş

e

each other [used in conversation, as in talking to or agreeing with each other] êk u dû (Her dû biraêt êk u dû bîn. *They were brothers.*)

eagle seqer (f)

ear guh (m) (Guhêt wî giran e. *He's hard of hearing.*) (Guhê min diêşit. *My ear hurts.*)

earache (*see have pain*)

early zî (Bila ez zîtir bê m mala te? *Is it OK if I come to your house earlier [than we had arranged]?*) (Ez pênc heftîa zîtir ji wextê xwe Xwedê dam. *I was born five weeks early.*)

earnestly leza (leza ez ji te dixwazim *earnestly I seek you*)

earring (1) gihark (m)

(2) guhark [said by villagers] (Xwezî ez guhark bama guhê te bama. *I wish I were an earring in your ear. / "I wish I were a fly on the wall."*)

earth (1) 'edir (m)

(2) 'erd (m) (Ez ketim ser 'erdê. *I fell down on the earth/ground.*) (Cutîar 'erdê xwe dikêlit. *The farmer plows his land.*)

earthquake (1) zilzal (f) (Evro zilzalek çê bî li Tirkîe. *There was an earthquake in Turkey today.*)

(2) heze (f)

(3) (*see also shake*)

east (1) rojhelat (m) (Tav li rojhelatê diderkevit. *The sun rises in the east.*)

(2) şarq (Ar) (m)

East Indian Hindî

Easter 'Îda Rabûna 'Îsaî

easy (1) sanahî (Ev derse sanahî ye. *This lesson is easy.*)

(2) sehil

eat (v) xwarin, bixwe (Min îprax xwarin. *I ate the dolma.*)

eat one's fill (v) têr xwarin, têr bixwe (Min têr xwar. *I'm full. / I ate until I was not hungry any more.*)

eavesdrop (v) guhdarî kirin, guhdarî bike (Hevalê te piş derrgehî guhdarîa te kir. *Your friend eavesdropped [on your conversation] behind the door.*)

economics iqtîsad (f)

edge lêv (f) (Ew li ser lêva derîaê rînişt. *He sat by the edge of the lake.*) (lêva dîwarî / mêzê / pencerke / avê *the edge of the wall / table / window / water*)

educated zanaî (f) (Ev mirovekî zanaî ye. *This person is educated.*)

EEG (brain wave test) textîta demaî

egg hêk (f) (Mirişk hêka dicit. *The chicken lays eggs.*)

eggplant bacan reş(k) (f) (Bu min dû bacan reşka bikirre. *Buy two eggplants for me.*)

Egypt Misir (f) (Ev miselsele li Misrê êkirîne. *This TV series is made in Egypt.*)

eight heşt (f)

eighteen (1) hijde (f)

(2) hejde (f)

eighty heştê (f)

elbow enîşk (f)

elderly (1) mezin (Deyka min mezin e. *My mother is elderly.*)

(2) pîr

(3) êxtîar [very old]

(4) gelek di nav sala da [people] (Her dû gelek di nav sala da çû bîn. *They were both well along in years.*)

(5) (*see also age*)

electrician (Ew kehrebê çêdikit. *He does electrical work.*)

electricity kehreb (f) (Kehreb çû. *The electricity went out.*)

elementary school (1) mekteba ewilî (sefa êkê heta sefa şeşê *first grade through sixth grade*)

(2) iptîdaî (Ar)

elephant fîl (m) (Fîlê dû guhêt mezin yêt heyn. *The elephant has two large ears.*)

elevator mes'et

eleven yazde (f)

Elijah Êlîas

Elizabeth Elîzabêt

embargo (1) hêsar (f) (Ar) (Eve heşt sala hêsar li ser 'Îraqê ye. *There's been an embargo on Iraq for 8 years.*)

(2) abluqê aburî

embarrassed şerim

embrace (v) xwe havêtin, xwe pavê (Min deyka xwe dît, min xwe havêtê. *I saw my mom and embraced her.*) (Wê xwe havêta min. *She embraced me.*)

embroider (v) neqîş kirin, neqîşî bike (Ez neqîşî dikim. *I'm embroidering.*)

embroidery neqîş (m) (Ew neqîşî dizanît. *She knows how to embroider.*)

emergency (1) necde (Min telefuna necdê kir wextê agir ber bî mala me. *I phoned 911 when our house was on fire.*)
(2) wextê mehitace (Min hindek parêt xwe yêt rakirîn bu wextê mehitace ye. *I saved some money for emergencies.*)

Emmanuel 'Emanuêl

empty vale (Ev gilase vale ye. *This glass is empty.*)

empty (v) vale kirin, vale (bi)ke

encourage (1) [idiomatic] (Ezê li ber dilê te deynim. *I'll encourage you.*)
(2) [idiomatic] (Xwe zîrek / qeyîm bike! *Take heart! Be encouraged!*)

end (1) dîmahîk (f) (dîmahîka rêkê / çîrokê / axiftinê / mirovê [her mirine] *the end of the journey / story / conversation / people [because they all died]*) (Ev çîroke bi dîmahîk hat. *This story came to the end / is at the end.*)
(2) dumahîk (f)
(3) axir (m) (Ar)

enemy dujmin (m) (Ew dujminê min e. *He is my enemy.*)

energetic bi xîret

energy taqet (f) (Min taqet ne maî ye. *I don't have any energy.*)

engaged dezgire (f) (Ev kurrke he desgirê daî ye. *This boy here is engaged.*)

engagement (for marriage) (1) xwazgînîa [agreement visit between potential parties]
(2) nîşanî [party where the groom's relatives present part of the bridewealth to the bride]

engineer mihendis (m)

England Inglîzî

English (language, people) Inglîzî (f)

enough (1) bes (Min bes e. Xwedê zêde kit. *I had enough [to eat]. Thanks.*) (Dersa Kurdî vê gavê bes e. *I've had enough of the Kurdish lesson for now.*)
(2) besî (Ne besî bî. *It wasn't sufficient.*)
(3) hinde (Min hinde pareêt heyn bu kirîa şiqê. *I have enough money for the apartment rent.*)

(4) têr (Pare têra min ne kirin. *I didn't have enough money.*)
(5) (*see also* be enough)

enter (v) çûn ... da, biçe (herre) ... da (Ez çûm mezela wan da. *I entered their room.*)

entertainment center komedîn (f)

envelope (1) name (Pilekê li nama xwe bide. *Put a stamp on your envelope.*)
(2) zerfê mektubê

envious (1) hêsîdî (Tu çend hêsîdî î! *You're very envious!*) (Muhammed hêsîdîê bi hevalê xwe dibit. *Muhammed is envious of his friend [because he's rich].*)

envy (v) hêsîdîê ... bîn, hêsîdîê ... bibe (Ez hêsîdîê bi te dibim. *I envy you.*)

equal to rêz (f) (Te ew îna rêza min? *You made her equal to me?*) (Min ne îne rêza wê. *Don't make me equal to her.*)

erase (v) misahe kirin, misahe bike

eraser (pencil; blackboard) (1) misahe (f)
(2) hekake (f)

error xeletî (f)

escape (v) revîn, birreve (Em sala 1991 revîne çîaêt Tirkîe. *In 1991 we escaped to Turkey.*)

especially xîsusî (Ez hatime Holende xîsusî ji ber te. *I came to / visited Holland especially because of you.*)

establish (v) (1) deynan dan, deynanê bide (Emrîke li sala 1776 hate deynan dinê. *In 1776 America was established.*)
(2) (*see* be established)

etching neqîş (m)

eternal (1) ne mir (Bes Xwedê ne mir e. *Only God is eternal.*)
(2) ebedî
(3) da'imî
(4) her u her (jîana her u her *eternal life*)

ethnic niştîmanî (Stranê niştîmanî yêt stran bi Şivan gelek xweş in. *National (ethnic) songs, especially those sung by Şivan, are wonderful.*)

ethnic group millet (m/f) (Ew ji milletê Kurda ye. *He is of the Kurdish people.*)

Europe Ewrope

evaluate (people or things) (v) teqyîm kirin, teqyîm bike (Ez dişêm tiştê baş ji yê ne baş teqyîm bikim. *I can evaluate good things from bad things.*)

Eve Hêwa

even after hêta piştî

even though hindî (Hindî min ne vîa ez biçim, paşî ez çûm. *Even though I didn't want to leave, I left.*)

evening (1) êvar (f)
(2) êvarî (f) (se'et çarî êvarî 4:00 in the afternoon) (her êvarî *every evening*) (Evro êvarî ezê çim sîkê. *This afternoon I'll go to the market.*)

every her (her roj *every day*) (rojekê e êkê ne *every other day*) (her dû roja carekê *every two days*)

everyone (1) hemîa
(2) alem

everything hemî tişt (Min hemî tişt kirin di seyarê da. *I bought everything in the car.*)

evict (v) der êxistin, der bêxe ([Xudanê şiqê] ez der êxistim çinko min kirê ne da. *[The apartment manager] evicted me because I didn't pay the rent.*)

evil (1) xirab (on the good and evil *li ser baş u xiraba*) (Gunneh xirab e. *Sin is evil.*)
(2) mel'în
(3) xirabî (ez ji çi xirabîa natirsim *I will fear no evil*)

ewe mih (f)

exaggerate (v) axiftina xwe mezin kirin, axiftina xwe mezin bike (Wî axiftina xwe mezin kir. *He exaggerated.*)

examination (1) imtîhan (f) (Ar) [written or oral exam] (Min imtîhan hebî. *I had a test [in school].*)
(2) fehis (f) (Ar) [medical exam] (da fehsa min bikit *in order to have an exam*) (fehsa xwînê *blood test*)
(3) mi'yene (f) [medical exam] (Dixtur mi'yena mi kir. *The doctor gave me an exam.*)

except for (something or someone) (1) ji ... pê ve tir (ji min pê ve tir *except for me*)
(2) ji bilî ... (Heft mirov hati bîn heflê ji bilî min. *Seven people came to the party except for me.*) (Ji bilî Êkşemb e. *Except for Sunday.*)
(3) bes (Deramefî ez ne şêm bixwim bes xîar e. *I can't eat any vegetables except cucumbers.*)

exchange (money) (v) serif kirim, serif bike (Ez dê çim sîka para da ez pareêt xwe serif kim. *I'm going to go to the money changer's shop to exchange my money.*)

exchange (v) (1) bedil kirin, bedil (bi)ke
(2) zivirandin ve, bizivirîne ve [exchange something for another, similar item] (Ha vî qemîsî bizivirîne (ve). *Exchange this shirt.*)
(3) vegehurrin, biguhurre (Dihî min qemîsê xwe vegehurrî. *Yesterday I exchanged my shirt.*)
(4) (*see also* return)

excited (1) mendehuş [afraid] (2) gelek bi keyf [happy]

excuse (1) hêcet (f) (Min lazim e hêcetek hebit da ez ne çim evro medresê. *I must have an excuse to not go to school tomorrow.*)
(2) sebeb (Ar) (Çi sebeb te hebî te evro ne çûî medresê? *What excuse did you have for not going to school today?*)

Excuse me. Qosîrîa min 'efî ke.

exercise (v) rîade kirin, rîadî bike (Ar) (Ez temrînet rîadî dikim da ez ze'îf bibim. *I'm exercising so I'll get thin.*)

exercise [physical] temrîn (f) (Ev temrîne gelek baş e. *This exercise is very good.*)

exhale (v) nefes îan der, nefesa xwe bîne derê (Ez nefesa xwe înim derê. *I exhale.*)

exiled (v) (*see* be exiled)

exist (v) hebîn, hebe (Te qelem heye? *Do you have a pen?*) (Min dû qelemêt heyn. *I have two pens.*)

exit pêstirk (f)

expense (1) biha (m) (Bihaê vî qemîsî kê m e. *My expense for this shirt was only a little.*)
(2) mebilex (m) (Ar)

expensive giran

experience [idiomatic] kumalgeh (f) (Ew çûî ye kumalgehê ye. *He graduated from community school, i.e., from the school of hard knocks / life / experience.*)

expert (1) mamusta
(2) usta
(3) şehereza
(4) zanaîet desturî [expert of (Jewish) law] (Êk ji zanaîet desturî *one of the experts in the [Jewish] law*)

explain (v) (1) dîar kirin, dîar bike (Ka bu min dîar ke. *Please explain this to me.*) (Ev jinke rêka mala te bu min dîar kir. *This woman told me how to get to your house.*)
(2) ruhî kirin, ruhî bike (Bu min darsa Hanaê ruhî bike. *Explain Hana's lesson/schoolwork for me.*)
(3) şîr u vekirin, şîr u veke

explode (v) peqîn, bipeqe (Ew pifdanke peqî. *The balloon exploded.*)

explosion teqîn (f) (Wextê 11.9 ew teqîne çê bî li New York. Em gelek qehirîn u 'ecêb maî maîn. *When the explosion happened Sept. 11 in New York, we were very sad and shocked.*)

[expression of emphasis in conversation] ey (ey heval *friend*) (ey mamusta *teacher*)

extension cord weyrê kehrebê ya zêde

exterminator (Ew dermanî direşînit. *He works with poison.*)

extra zêde (Pareêt min bu min zêde (bi)ke. *Give me a raise.*)
eye çav (m)
eye glasses berçavk (pl) (Ez nabînim bê berçavik. *I can't see without glasses.*) (Berçavkêt min şikestin. *My eye glasses broke.*)
eyebrow (1) bireh
(2) birhu (f)
eyelashes mijîlank (f)
eyesight nezer (f) (Nezara wî kême. *His eyesight is poor.*)

f

fabric (new) (1) qimaş (Ar) (m)
(2) peruk (f)
face (1) navçav (m) (Herre navçavê xwe bişo. *Go wash your face.*)
(2) dêhim (m)
face down beramberî 'edrê (Navçavê wî beramberî 'edrê bî. *His face was face down.*)
face to face (1) beramberî (Ez beramberî te rîniştî me. *I was sitting face to face with you.*)
(2) miqabilî
face up beramberî seqfî (Navçavê wî beramberî seqfî bî. *His face was face up.*)
face veil xêlî (f) (Ez xêlîê nakim ber çavê xwe. *I don't wear a face veil over my eyes.*)
factory me'mil (f) (me'mila penîrî *cheese factory*) (Li me'mil şul dicit. *He works in a factory.*)
fail (v) saqit bîn, saqit bibe (Ez saqit bîm. *I failed [the test].*)
faint (v) dil girtin, dil bigire (Dilê wî girt. *He fainted.*)
fair-weather friend hevalê berîkê
fairytale xeyalî (f)
faith (1) bawerî (f) (Bawerîa min fereq e li gel bawerîa Şihud Yehwe. *My faith is different from the faith of Jehovah's Witnesses.*) (Bawerîa min bi Xwedê têt. *I have faith in God.*)
(2) bawer (hîn gelî kême bawera *you of little faith*)
faithful in / to (*see be faithful in / to*)
faithful to God (in actions: reading the Bible/Koran, giving to the poor, etc.) (1) ta'et (Ez ta'etî bu Xwedê dikim. / Ez ji Xwedê tirs im. *I'm faithful to God / afraid of God.*)
(2) mutedeyin (Ar) (Ev mirove mutedeyin e: ew bîre navexwit, cilkêt rîs nawergirit. *This person is faithful to God: he doesn't drink beer and doesn't wear immodest clothing.*)
fall (the season) (*see autumn*)

fall (v) (1) ketin, bikeve (Ez ketim ji derinckê. *I fell down the stairs.*)
(2) keftin, bikeve (fell into the hands of robbers *kefte lepê rê gira da*)
fall away (v) derketin, derkeve (Ew ji dînê xwe derket. *He fell away from his religion.*)
fall in love (v) dil ketin, dil bikeve (Dilê min ketê. Min hês jê kir. *I fell in love with him. I loved him.*)
fall on one's knees (v) xwi çemandin, xwi biçemîne (kuilê xwi çemand *the servant fell on his knees*)
false (1) ne rastî (beta ne rastî ne *false [wooden; not live] ducks*)
(2) direw
false prophets pêxemberêt drewîn
false testimony direw sînd (bi direw sînd ne xwe *don't give false testimony*)
family (1) mal (f) (Mala te çawan e? *How's your family?*)
(2) eyle (f) (Ar) (Navê di hêmî eyla xwe bidin me. *Give me the names of all your family members.*)
(3) xêzan (f)
famine (1) meca'e (f) (Li Efrîqîe meca'e ye. *Africa has a famine.*)
(2) birs (f) (Birs bi ser wî welatî hebî da hat. *There was a famine in that country.*)
famous meşhur
fan panke (f)
fantastic keşxe
far (away) (1) dîr (2) dur
fare (1) hîrde
(2) heq (m) (Hêqê te çend e? *How much is the [your] fare / fee?*)
farm (1) rez (m) [has trees and bushes]
(2) bîstan (m) (Ar) [has trees and bushes]
(3) mêrg (f)
(4) şuv (f)
(5) zevî (f)
(6) çûl (m)
farmer (1) cutîar (m) (Cutîar 'erdê xwe dikêlit. *The farmer plows his land.*)
(2) rezvan (m)
(3) tovçîn (m)
Farsi Îranî
fast bi lez
fast (v) (1) bi rojî bîn, bi rojî bibe [religious] (Ew bi rojî ne. *They're fasting.*)
(2) rojî girtin, rojîa bigire [religious]

(3) ne xwarin, ne xwe [medical] (Ez naxwim ji ber fehsê. *I'm not eating [I'm fasting] because of the medical tests.*)

fasten (v) girêdan, bigirêde (Qaîşê xwe bigirêde. *Fasten your seat belt.*)

fat (grease) (1) rûn (m) [liquid]
 (2) zeyt (f) (Ar) [liquid]
 (3) duhin (m) [solid] (Piçek duhinê bike binê qazanê da u rijdêt xwe biqelîne. *Put some shortening in the pan and fry the tiny noodles.*)

fat (overweight) qelew

fatal (see ill)

fate (1) qeder (f) (Nizar qedera min bî. *Nizar was my fate [that I would marry him].*)
 (2) nesîb (m) (Ar) [especially in regards to money and a spouse] (Nesîbê min e. *It's my fate.*)
 (3) şans (m)

father (1) bab (m)
 (2) baba (Ar) ["dad"]
 (3) babu ["dad"]

Father's Day 'îd li ab (Ar)

father-in-law xezîr (m)

faucet henefî (f)

fault (show someone his...) (see reproach)

favor [idiomatic] (Bê zehmet dê şêî bu min bikî? *Will you please do me a favor?*)

favor (v) ferqo cidahî kirin, ferqo cidahî bike (Xanê ferqo cidahî dikit navbeyna bîkêt xwe da. *Xanê favors some of her daughters-in-law over the others.*)

fax (1) faks (f) (Vê wereqê bu min faks ke. *Fax this paper for me.*)
 (2) birîsk (f) (Bu min birîskê virrêke / lê bide. *Send a fax for me.*)

fear (1) tirs (f)
 (2) tirrs (f) (Hevala min tirrsê hey ji pişîka. *My friend has a fear of cats.*)

fearful (1) tirrsuker
 (2) ceban (Ar)

feast 'ezîmet (f) [food for guests] (Sibe tu me'zumî li nik me çînkî min 'ezîmetê çêkirî bu we. *You're invited to our place tomorrow because I made a feast for you.*)

feather perr (m) (Min evro teyrek tewuz dît; perrê wî şîn bîn. *I saw a peacock today; his feathers were blue.*)

feather duster firça tuzê

February (1) Şibat (f)
 (2) heyva dû (f)

fee (1) îcar (f) (Ar) [taxes, rent]
 (2) kirê (f) [rent]
 (3) kirî (f) [rent] [villagers say this]
 (4) heq (m)

feed (v) xwarin dan, xwarinê bide

feel (v) destê xwe kirin, destê xwe bike [sensory]

feel shame (v) şerim kirin, şerim bike (Min şerim kir. *I was embarrassed.*)

feeling (1) hês (f) (Ew pê hêsa tiştek çû xwar. *She had the feeling something went down.*)
 (2) pêhesan (f) (Jiber hindê ewêt pêhesan rîz bîn u şerim bîn. *Therefore they felt naked and shameful.*)
 (3) (see also health)

feelings [idiomatic] (Dilê te namînit? *You feelings aren't hurt, are they?*) (Dilê wê ma. *Her feelings were hurt.*)

female (1) jin
 (2) mê

feminine sanitary pad santî

fence (1) sîac (f) (Dizî xwe ji ser sîacî havêt. *The thief jumped over the fence.*)
 (2) dîwar (m) (Pîng li rexê dîwarî ye. *The peppermint is next to the fence.*)

ferry sefine

fetus zikmak (Ew di zikmak da kure bî. *He was blind when he was a fetus.*)

feudal landowner (agha; chief of a tribe) axa (Pale bu axaî şul dikin. *Peasants work for the landowner.*)

fever (1) ta (f) (Taî ya li min e. *I have a fever.*) (Min ta gelek heye. *I have a high fever.*) (Ez ne sax im. Ez dirrecifim di taê da. *I'm sick. I've been shivering from fever.*)
 (2) hêraret (Hêraret bu te çê dibit? *Do you have a fever?*) (Mihrarê bîne. Hêraretê wî bigire. *Bring the thermometer and check his fever.*)

few (1) piçek (Min piçekê heyn. *I have a few.*)
 (2) kê m (Min kê mêt heyn. *I have a few.*) (Ders hebî bes talib kê m bîn. *We had class, but the students were few in number.*)
 (3) [idiomatic] (her du sê roja *a few days*)

fiance dezgîre (m/f) (Kî ye dezgîra wî? *Who is his fiancé?*) (Kiça mamê wî dezgîra wî ye. *His cousin is his fiancée.*)

fidget (v) livîn, bilive (Tu çend dilivî. Dê bes xwe bilivîne. *You sure do fidget a lot. Stop fidgiting!*)

fifteen pazde (f)

fifth (series) pêncê (biçikê pêncê *fifth child*)

fifty pêncî (f)
fig hêjîr (f)
fight (1) şerr (m) (Ez hês ji şerrî nakim. *I don't like fighting.*)
 (2) bel (f) (Wê bela xwe ji wî ne vedikir. *She didn't begin to fight with him.*)
fight (v) (1) şerr kirin, şerrî bike (Şerrî ne kin! *Don't fight.*)
 (2) qêrrqêrr kirin, qêrrqêrr bike (Min u deyka xwe qêrrqêrr kir. *Me Hana ji xew rakir. My mother and I shouted at [fought] each other and woke Hana up.*)
 (3) qîjqîj kirin, qîjqîjê bike (Biçîk îna bes qîjqîjê bikin. *She brought the child but they shouted [fought].*)
fighting (1) ceng
 (2) şerr
filbert berî (m) (Em berî dikîne bi nav pelêt agirî da şîrîn dibit. U em dixwîn. *We put filberts in fire pan to make them sweet; then we eat them.*)
fill (v) serif kirin, serif bike (Min telefuna dermanxanê kir da raçêta dermanê min serif kit. *I called the pharmacy for them to fill my prescription.*)
fill in (v) tijî ... kirin, tijî ... bike
fill out (v) dagirtin, dagire (Vê wereqê bu me dagire. *Fill out this paper for us.*)
fill up (v) tijî ... kirin, tijî ... bike (Ez dê çim penzînxanê da seyara xwe tijî penzîn bikim. *I'm going to go to the gas station to fill up my car with gas.*) (Min tijî av kir. *I filled it with water.*)
find (v) dîtin (ve), bibîne (ve) (Min qelemê xwe dît. *I found my pen.*)
fine (1) baş (Ez baş im.. *I'm fine.* [response to *Çawan î?*])
 (2) fit (Ez fit im. *I'm very well!* [slang; very casual])
finger til (f)
finger nail neynuk (f)
finish (v) (1) çê bîn, çê be (Fravîn çê bî? *Is lunch ready?*)
 (2) xilas bîn, xilas bibe (Medresa me xilas bî. *Our school(ing) finished.*) (Par ez ji medresa xwe xilas bîm. *I finished school last year.*)
 (3) xilas kirin, xilas bike (Min dera xwe xilas kir. *I finished my lesson.*)
 (4) tamam kirin, tamam bike (Me medresa xwe tamam kir. *We finished school.*)
 (5) dirist kirin, dirist bike (Hemî şulêt xwe min dirist kirin.)
 (6) danan, dane [for books only] (Şîrînê qamusa xwe dana. *Şîrîn finished her dictionary.*)
fire (1) agir (m) (Bi agirî yarîa ne ke. *Don't play in the fire.*)
 (2) hêrîq (m) (Hêrîq ber bî mala me. *Our house was on fire.*)
fire [a weapon] (v) teqandin, biteqîne (Leqmanî debance teqand. *Leqman shot the pistol.*)

fire escape pêstirk (f)
fire station (1) itfa'e (f)
 (2) hêrîqe (f)
fire truck (1) timbêlê hêrîqê
 (2) seyara hêrîqê
 (3) timbêlê itfa'ê
fireman merkê seyara hêrîqê
fireplace (stone) kuçik (m)
first (series) (1) ewilî (biçîke ewilî *the first child*)
 (2) serî (Serî bi dumahî bîne. *Bring the first ones last.*)
 (3) pêşîê (gelekê pêşîê dê bine paşîê *many who are first will be last*)
first of all (1) li berahê
 (2) li ewilî (Ar)
fish (1) masî (f)
 (2) hît (m) [Jonah's sized fish]
fish (v) (1) masî girtin, masîa bigire (Min masî girt. *I went fishing.*)
 (2) (*see also* catch (v))
fisherman masîgir (m)
five pênc (f)
fix (v) (1) çê bîn, çê be (Ez çê bîm. *I fixed it.*) (Îta te çê bî. *Your iron is fixed.*)
 (2) çêkirin, çêke (Îta min bu min çêke. *Fix my iron.*) (Min îta te çêkir. *I fixed your iron.*)
flag 'elem (f) ('elema Emrîke *American flag*) ('Elema Emrîke rakirin. *They lifted up the flag.*)
flashlight laît
flat rast
flat land deşt
flatter (v) melaq kirin, melaqî bike (Melaqî dîkit şulek ji te divêt. *She's flattering you because she wants something.*)
fleas kîrnî
flesh goşt (m)
flip flops ni'al (f)
float (v) ser avê ketin, ser avê bikeve (Min selka kurrê xwe ber da avê da. Selik ser av ket. *I put my son in a basket in the water. The basket floated.*)
flock (sheep, goats, cows) (1) garran (f) (Min garranek pezîê hey. *I have a flock of sheep.*)
 (2) pez (f)
 (3) kerwanek (f) [sheep only] (Min kerwanek pezîê hey. *I have a flock of sheep.*)
flood fêyezana (f)

floor (1) ‘edir (f)
 (2) ‘erd (f) (Ez ketim ser ‘erdê. *I fell down on the floor.*)
 (3) (*see also* story or level)

florist gulçêker

floss one’s teeth (v) didanêt xwe paqij ke bi taê didanî, didanêt xwe paqij kirin bi taê didanî

flour ar (m)

flour mill aş (m)

flower (1) gul
 (2) kulîlk (f) [bud]
 (3) bîşeng [the name of one kind of flower]

flower pot qehfik (f)

flowing mişêhî (xwîneka mişêhî *flowing blood*)

flu neşle (m) (Neşle li min e. *I have the flu.*) (Neşle ji min çû. *I don’t have the flu any longer.*)

fluids tiştta ruhî

flush the toilet (v) av ber dan, avê ber (bi)de (Avê ber de di edebê da. *Flush the toilet.*)

flute (1) bilîl (f)
 (2) zirna [Kurdish]

fly mêş (f)

fly (v) (1) firrîn, bifre (Ew teyrike firrîn ser darê. *That bird flew to the tree.*)
 (2) (*see also* go and (air)plane)
 (3) firr dan, firr bide [like a chicken]

foal of a donkey caş(ik) (m)

foam kef (f)

fog (1) xemam (f) (Ar)
 (2) mij (m)

foggy (1) xemam (Ar)
 (2) mij (Evroke dinya mij e; ez taze nabînim. *It’s foggy today; I can’t see very well.*)

fold (v) (1) çemandin, biçemîne
 (2) tewandin, bitewîne

follow (v) bi dîv ketin, bi dîv bikeve (Biçîk bi dîv babê xwe ketin. *The children followed their father.*)

follower şagird (şagirdêt ‘Îsaî *followers of Jesus*)

food (1) xwarin (f)
 (2) zad (m)
 (3) erzaq [groceries] (Tu çûî, te erzaq wergirt? *Did you go get the free food?*) (Min erzaq ne maî ye. Paşî ezê çim sîkê kirrim. *I don’t have any food left. I’ll go to the store later and buy some.*)

food processor mekîna deramet

food storage container (plastic) qodîka neylon

foolish bê ‘aqil

foot (1) pê (m) (binê pê *sole of the foot*)
 (2) pêngav [measurement]
 (3) (*see also*) on foot

foothill zîr (m)

footstool cihê pêa

for (1) bu (Ev kitêbe bu te ye. *This book is for you.*)
 (2) jiber
 (3) ser (ser dînarekê *for a denarius*)
 (4) [idiomatic] (her dû rojêt çûin *for the last two days*)

for a while bê hinekê (Evroke bê hinekê were def min. *Come over to my house for a while.*)

for now gavê [the present, the time being] (Dersa Kurdî vê gavê bes e. *I’ve had enough of the Kurdish lesson for now.*)

forbidden hêram (Goştê xenzîrî hêram e. *Pork is forbidden.*)

force (by force) (1) bi xurtî (Şîrînê bi xurtî xwarin da min. *Şîrîn forced me to eat.*)
 (2) bizurî (Ewî bi zurî pare ji mi standin. *He forced me to give him money.*)

force to leave (v) der êxistin, der bêxe (Ez ji malê der êxistin. *I was forced to leave my home.*)

forehead enî (f)

foreign ecinebî (Ar) (Ez ezmanê ecinebîa zanim. *I know a foreign language.*)

foreigner (1) ecinebî (Ar) (m/f)
 (2) xerîb (m/f) (Ez xerîb im li Holende. *I’m a foreigner in Holland.*)
 (3) bîanî (Kurd li Emrîke bîanî ne. *Kurds are foreigners in America.*)

foreman (1) ustað (Ar)
 (2) cêgir (m)

forest (1) xabe (f)
 (2) daristan (f) (Rabî çû daristanê. *After that he went to the forest.*)

forever her u her (Ez dê mînim li Kurdistanê her u her. *I will stay in Kurdistan forever.*)

forget (v) ji bîr kirin, ji bîr bike (Ji bîr ne ke! *Don’t forget!*) (Min ji bîr ne ke çî cara. *Don’t ever forget me.*)

forgive (v) (1) burandin, bibure (Li min bibure. *Forgive me. [said also after sneezing]*) (Te dihî xeletîa min burand. *Yesterday you forgave my mistake.*)
 (2) ‘efu kirin, ‘efu bike (Min ‘efu ke. *Forgive me.*)

fork çetal (f)

form a line [of people] (v) rêz girtin, rêz bigire (Rêzê bigire. *Form a line [to wait for something].*)

fort [army] meqere (f) (Meqerê peşmergê li mifireqa Maltaê. *The peshmerge fort is in the region of Malta [and looks out for it].*)

forty çil (f)

found (v) deynan dan, deynanê bide (Emrîke li sala 1776 hate deynan dinê. *In 1776 America was founded.*)

foundation binyat (Ewî çi binyat nîne. *He has no foundation. [He doesn't know his parents; life is shakey.]*) (Binyatê xanîê me gelek qayim e. *Our foundation is very strong.*)

fountain kanî (f)

four çar (f)

fourteen çarde (f)

fourth (series) çarê (biçîkê çarê *fourth child*)

fox rîvî (m)

France Frensa (f)

frantically and quickly bi lez u bez

freckle nîşan (f)

free (1) belaş [no money] (Gul belaş bîn. *The flowers were free.*)
(2) serbest [freedom to be independent] (Kurdistan serbest e. *Kurdistan is independent.*)

freezer (1) micamîde (f) (Ar)
(2) firêzer (f)

freezing cemidî (Evroke cew çawan e? Cemidî ye. *What's the temperature like today? It's freezing.*)

French (language, people) Frensî (f)

fresh [e.g., seafood] nî hatî

Friday (1) îmî (f)
(2) cim'e (Ar) (f)
(3) xwitbe

fried patties rihik (f)

friend (1) heval (Ez u tu hevalêt êk îm. *You and I are friends.*)
(hevalê berîkê *fair-weather friend [idiomatic]*) (hevalê dilvêt teng *all-weather / faithful friend [idiomatic]*)
(2) destbra (m/f)

friend (associate) têkil (m/f) (Em têkilêt êk îm. *We're friends; we know each other well.*)

fright tirs (f)

frightened (v) (*see be frightened*)

frog beq (f)

from (1) ji (Ew ji gundî hat. *He came from the village.*)
(2) di ... ra (Ez di wêrê ra çûm. *I went from there.*)

(3) di ... da (Ez dirrecifim di taê da. *I've been shivering from fever.*)
(4) ji def (Eve ji def wî ye. *This is from him.*)

from each other jêk (Ez u mala xesîa xwe em jêk cida ne. *My mother-in-law's family and I are (living) separate from each other.*)

frozen qerisî

frozen [e.g., seafood] cemidî

fruit (1) fêqî (m) (Fêqî bîne. *Bring some fruit.*)
(2) ber (m) (Dara pîç dê berekê pîç dit. *A good tree bears good fruit.*)

fruit stew (prunes, raisins, figs, and walnuts) xweşav (Min xweşav yê çêkirî. *I made fruit stew.*)

fruitful feyde (Şulê min feyde yê têda hey bu Kurda. *My work is fruitful among the Kurds.*)

frustrated hêyrî

fry (v) (1) nav duhinî da qelandin, nav duhinî da biqelîne (Mirîşkê nav duhinî da diqelînit. *She's frying the chicken.*)
(2) qelandin nav duhinî da, biqelîne nav duhinî da (Hêkê biqelîne nav duhinî da. *Fry the eggs.*)

fulfill (v) tamam kirin, tamam bike

fulfillment tamamkirin (f)

full (1) tijî (Defter tijî nivîsandine. *The book is full of writing.*) (Ev sitle tijî av e. *The bucket is full of water.*)
(2) pir (demê pir bî ... *when it was full ...*)
(3) têr [idiomatic] (Ez têr im. *I'm full / satisfied. / I'm not hungry because I've eaten.*) [Don't say "Ez tijî me." because that means "I'm full of sex."]
(4) (*see also busy*)

funny keyf (Ew keyf e. *He's funny.*)

fur pîrt (m) (Pirrça xwe bibirre. *Shear your hair.*) (Min pîrtê pezê xwe birrî. *I sheared my sheep's wool.*)

furnace tenîr (f) (di tenîrêt agirî da *in the fiery furnace*)

furniture eθaθê malê

furniture store [idiomatic] (ma'rez ya qenepa firoşin *a store that sells couches*)

fuse box mîzanîa kehrebê

[future tense marker] dê (Ez dê çim. *I will go.*)

g

Gabriel Cibraîl

gain (v) feydek jê kirin, feydek jê bike (Min \$100 hebîn. Min kirin şulî ra. Min feydek jê kir. *I had \$100. I invested it and gained more money.*)

Galilee Celîl
gallbladder zirrav (f) (Dikturî zirrava min rakir. *The doctor removed my gallbladder.*)
gallon gelen
game yarî (f)
garage gerac (f) (Bê gerac e. *It doesn't have a garage.*)
garbage (1) zibil (m) (Ar)
(2) gilêş
garbage collector zebal (m) (Zebal zibilî radikit. *The garbage collector collects the trash.*)
garbage disposal sulîn (f)
garbanzo beans nuk (f)
garden (1) hêdîqe (f)
(2) baġ (m)
(3) rez (f) [huge garden like a farm field of potatoes]
gardener cutîar
gargle (v) xelxere kirin, xelxere bike
garlic sîr (f)
gas (1) xas [for stoves, cigarette lighters] (f)
(2) penzîn [for vehicles]
gas meter mîzanîa xazê
gas station penzînxane (f)
gas station attendant xudanê penzînxanê
gather around (something or someone) (v) xwe nêzikî ... kirin, xwe nêzikî ... bike (Em xwe nêzikî pîanuê dikîn. *We're gathered around the piano.*)
gather together (v) (1) lê kum bîn, lê kum bibe (Biçîk hêmî li elwana kum bîn. *The kids gathered together all the crayons.*)
(2) xirve kirin, xirve bike (Çend malê hey xirve kirin. *He got together all that he has.*)
generator muwelîde (f)
generous (1) merd
(2) merdane
(3) çav vekirî
generous (v) (see be generous)
Genesis Xeliqandin
gentle (1) zirav (Dengê wê zirav e. *Her voice is gentle.*)
(2) mihterem (Ar) (Ew mihterem e. *She's gentle.*)
(3) tabî'et xweş (Tabî'etê Nazdarê xweş e. *Nazdar's nature is nice. / She's a gentle person.*)
geography cixrafî (f)
German (language) Almanî (f)

German (person) Alman
Germany Almanya
get (v) bi dest ... ketin, bi dest ... bikeve (da jîana her u her bi dest min bikevît *in order for me to get eternal life*) (Ez çûm nik delalî da xanîek bi dest min bikevit. *I went to a realtor to get a house.*)
get [to a destination] (v) (1) kêşan, bikêşe (Ez sê se'eta kêşa hîeta çûme Dohukê. *It took me three hours to get to Dohuk.*)
(2) geheştin, bigehe (Em geheştîn. *We got there / arrived.*) (Em drengî geheştîne pasê. *We got to the bus too late.*)
get a job (v) bi xwe şulek dîtin, bi xwe şulek bibîne
get bed rest (v) istîrahetê xwe kirin, istîrahetê xwe bike
get better (health) (v) (1) çê bîn, çê be (Ew hêş ne çê bî ye. *She isn't better yet.*)
(2) qanc bîn, qanc bibe (Ew ne qanc bî ye? *Isn't she better yet?*)
(3) [idiomatic] (Silametî ye! *Get well soon!*)
get cold (v) tezîn?!, biteze (Min gusik bire ser banî da bitezit. *I brought a jug [of water] up on the roof so that it would get cold.*)
get dressed (v) ber xwe kirin, bike ber xwe (Biluzî bike ber xwe. *Put on the sweater.*) (Bike ber xwe. *Dress yourself.*)
get hurt (v) (see have pain)
get in line (v) xwe rêz kirin, xwe rêz (bi)ke (Xwe rêz kin. *Get in line.*)
get married (v) (1) jin înan, jinê bîne [men] (Ew dê bi xwe jinê înit. *He will get married / He will bring himself a wife.*)
(2) şî kirin, şî bike [women] (Ew dê şî kit. *She'll get married.*)
get off (v) jê der ketin, jê der bikeve
get on (v) çun nav da, biçe (herre) nav da
get pregnant (women) (v) (1) bi tişt ketin, bi tişt bikeve (Tu bi tişt ketî. *You got pregnant.*)
(2) bi hîlekê ketin, bi hîlekê bikeve
get ready (v) (1) çê bîn, çê be (Fravîn çê bî? *Is lunch ready?*)
(2) amade kirin, amade bike (Xwe amade bike da em 1:00 biçîn sîkê. *Get yourself ready so that we can go to the market at 1:00.*)
get tired (v) westîan, biweste (U demê ew bi rê ve westîaî ... *And when he was tired from traveling ...*)
get together (v) (see gather together)
get up (v) (1) rabîn, rabe (Hana, dê rabe! *Hana, get up!*)
(2) ji xew rabîn, ji xew rabe [after sleeping]
(3) [idiomatic] (Hilû! *Get up! Move!*)
(4) (see also wake up)
gift (1) dîarî (f)
(2) hedîe (f) (Ar)
(3) xelat (m)

giraffe zirafe (f)
girl (1) kiç (f)
 (2) kiçik (f)
give (v) (1) dan, bide [said if the desired object is near by] (Ka piçek avê bide min. *Give me some water [please].*)
 (2) înan, bîne [said if the desired object is at a distance] (Dihî Nizarî bu me temate înan. *Yesterday Nizar gave me some tomatoes [which he bought at the market].*)
 (3) (see also bring)
give birth (v) biçîk bîn, biçîkî bibe (Ew biçîk bî. *She gave birth.*)
give up (v) hêlan, bihêle (Wextê ez çûm Kurdistanê, min hindek ‘edetêt Emrîka hêlan. *When I went to Kurdistan, I gave up some of my American culture.*)
glass (1) cam (f) [window, table top, sliding patio door, windshield]
 (2) perdaş (m) [for drinking]
glass cleaner (1) ava cam paqijkirnê
 (2) ava şîşe paqijkirnê
glasses (for eyes) berçavik (pl) (Ez nabînim bê berçavik. *I can’t see without glasses.*)
globe tepka ‘edrê
glorify (v) pîroz kirin, pîroz bike (Xwedê, ez navê te yê pîroz kim. *God, I glorify your name.*)
glove (1) dezgurk (f)
 (2) lepik (f) (lepikêt neylun *rubber gloves*)
glove compartment sinduq (f) (Bike di sinduqê da. *Put it in the glove compartment.*)
glue simiḫ (f)
glue (v) simiḫ kirin, simiḫ bike
gluttonous ‘îc (Ew ‘îc e. *He’s gluttonous.*)
gnash teeth çirçira didana (Ahmed gelek çirçira didanê wî. *Ahmed gnashes his teeth a lot.*)
go (v) (1) çûn, biçe (herre) (Jinik çûn. *The women went [somewhere].*)
 (2) qesta ... kirin, qesta ... bike [to someone or some specific place] (Jinka qesta medresê kirin. *The women went to the school.*) (Ewan qesta hêcê kirin. *They went on the pilgrimage.*)
 (3) [idiomatic] (Xwedê li gel we bit! *God go with you [said to someone when they leave].*)
go back (v) (1) zivirrîn, bizivirre (Ez dê zivirrim. *I will come back.*)
 (2) vegeerîn, vegere (Ez vegeerîm Kurdistanê. *I went back to Kurdistan.*)

go near (someone or something) (v) xwe nêzîkî ... kirin, xwe nêzîkî ... bike (Xwe nêzîkî agirî ne ke. *Don’t go near the fire.*)
go out (leave) (v) (1) derketin, derkeve (Ez evro se’et êk ji mal derketim. *I went out / left the house at 1:00 today.*)
 (2) derkeftin, derkeve
 (3) dan rê, bide rê [for a long journey] (Wan dihî siharî dan rê. *They left yesterday morning.*) (Dihî da rê. *He left yesterday.*)
go shopping (v) çûn sîkê, biçe (herre) sîkê
go through (v) burîn, bibure (U divîa ew dinav devera Samîre ra biburît. *He wanted to go through Samaria.*)
go to the bathroom (v) (1) mîz (f) [idiomatic; literally urine] (Mîza min têt. *I have to go to the bathroom.*)
 (2) tengav [idiomatic; literally sick] (Ez tengav im. *I have to go to the bathroom.*)
 (3) mîz kirin, mîz bike (Te mîz kir? *Did you go to the bathroom / urinate?*)
go together (match) [clothes, furnishings] jêk hatin, jêk bê (were) (Jêk naên. *[The clothes] don’t go together.*) (Jêk tèn. *(They) go together.*)
go up (v) (1) çûn selal, biçe (herre) selal (Herre selal da biçîn binvîn. *Go up [there] so that we can go to sleep.*)
 (2) bi hewe ketin, bi hewe bikeve (Biçîk bi hewe ketin [ser banî]. *The children went up [onto the roof].*)
goat bizin (m)
goatee seksuk
God willing Enşallah (Ar)
God (1) Xwedê (m) (Xwedê ji te razî bit! *May God be satisfied with you [a common blessing].*) (Ez bu Xwedê dikim. *I do it for God [not for money].*)
 (2) Xwidê (m) [This is the technically correct spelling and pronunciation.]
 (3) Reb (m) (Ar)
 (4) Allah (m) (Ar)
gold (1) zêrr (m) (Min zêrr kirin ber xwe bu dawetê. *I wore my gold jewelry for the wedding.*) (Wextê min şî kir, bu min zêrr gelek înan. *When I got married [my husband] brought me a lot of gold.*)
 (2) qerrdunekê dumetir [gold chains given a bride when she accepts a proposal of marriage]
 (3) taxmek gerdenîa zêrra [gold jewelry given a bride when she accepts a proposal of marriage]
good (1) baş (Çawan î? Ez baş im. *How are you? I’m fine.*) (on the good and bad *li ser baş u xiraba*) (Baş e. *It’s good / OK.*)
 (2) qenc (Te qenc kir! *You did a good job!*) (Mîruevêkî qenc e. *He’s a good person.*)

(3) çak [Sorani] (Şulê min çak bî. *I did good work.*) (Çakîê bike. *Do good things.*)

(4) xatîn [describes a person; opposite of *har*] (Tu xatîn î. *You're a very good person.*)

Good afternoon. Êvarî bi xêr. [said from 3 - 5 p.m.]

good deeds (1) qencî (f) (Em çi car qencîa Şirînê ji bîr nakîn. *We'll never forget Şirîn's helpfulness / good deeds.*)

(2) başî (f) (Başîê bike. *Do good things.*)

(2) qencî (f)

(3) çakî (f) (Çakîê bike. *Do good things.*)

Good evening. Çawan î.

Good morning. Siharî bi xêr. [said until 11 a.m.]

good news mizgînî (f) (mizgînîa xweş *good news*) (mizgînîa ne xweş *bad news*) (Min mizgînî da babê xwe. *I told my father the good news.*) (Mizgînîa mil te! Xoşka te şî kir! *Good news for you! Your sister got married.*)

Good night. Şeva te xweş.

Good-bye. (1) Bi xatra te! [said by the one leaving the house or by the one who ends the telephone conversation]

(2) Bi xêr biçî! [said by (a) the one staying at home, (b) both if you're both leaving, or (c) by the one who responds to *bi xatra te* on the telephone]

goodness çakî (Çakî u diluvanî li drêjîa jîana min dibine behira min. *Goodness and love will follow me all the days of my life.*)

goose qaz (f)

gouge (something) out (v) înan derê, bine derê (Evro dikturî didanê min îna derê. *Today the doctor pulled out my tooth.*)

govern (v) hikmî ... kirin, hikmî ... bike (G.W. Bush sala têt dê hikmî li Emrîke kit. *G.W. Bush will govern America next year.*)

governate mihafeûde (f) (Ar)

government hikmet (f) (Çi hikmet li Holende heye? *What kind of government does Holland have?*)

governor (1) mihafiz (m/f) [of a province]

(2) medîr nahîe (m) [of a big village]

(3) muxtar (m) [of a small village]

(4) qeîmeqam (m) [of a small city]

grab (v) girtin, bigire (Vê kitêbê bigire. *Grab this book.*)

grade (in school) sef (f) (sefa sîê *third grade*) (sefa dûê kulfîê *sophomore year in college*)

graduate (v) şihade standin, şihadê bistîne

grain (1) dexil (m) (Dexilê me ev sala ne baş bî. *Our grain was bad this year.*)

(2) girar (f)

grammar qewa'd (f) (Qewa'da ezmanê Kurdî ne zehmet e. *Kurdish grammar isn't difficult.*)

grandchild nevî (m/f)

grandfather bapîr (m)

grandmother pîr (f)

grape tirî (m)

grapefruit sindî (f)

grass (1) gê (m) (2) înc (m) [livestock food]

grasshopper kulî (m/f)

grate (v) rendeş kirin, rendeş bike (Ezê gêzera rendeş kim. *I'm grating carrots.*)

grater rendeş

grave (1) qebir (m) (Ar) (Her berek cihê xwe yê bi qedirê. *Every stone has its own place until it goes into the grave. "Every person wants to stay in his home sweet home until he dies."*)

(2) zîaret (m) (Zîaretê xesîa min yê li Mîsil e. *My mother-in-law's grave is in Mosul.*)

gray risasî

grease (1) rûn (m)

(2) rûhin (m)

(3) zeyt (f) (Ar)

grease (v) (1) rûhin lê dan, rûhinê lê bide (Rûhinê gelekê li binê qazanê bide. *Grease the bottom of the pan well.*)

(2) zeyt lê dan, zeytê lê bide

great grandchild nevî çîçîrk

great grandfather (1) bapîrê deyk [maternal]

(2) bapîrê bab [paternal]

great grandmother (1) pîra deyk [maternal]

(2) pîra bab [paternal]

greater meztir

greatness mezinatî (f)

Greece Yunan (f)

greedy tema' (Hindek mirov gelek tema' in. *Some people are really greedy.*)

Greek (people, language) Yunanî (m/f)

green (color) kesik (m)

green (not ripe) (1) çênebî

(2) kesik

(3) ne geheştî

green bean lubik

green onion pîvaz terik

greet (v) silav kirin, silav bike (Silava li biçîkêt xwe bike. *Greet your children [for me].*)

greeting silav (f)

grieve (v) bi tazî bîn, bi tazî bibe (Ez bi tazî me. *I'm mourning.*)

grill (v) biraştin, birêje

grind (v) (1) hîr kirin, hîr bike
(2) hiraî kirin, hiraî bike (Em darçînê hiraî dikirîn. *We ground the cinnamon.*)

groceries erzaq [groceries] (Tu çûî, te erzaq wergirt? *Did you go get the free food?*) (Min erzaq ne maî ye. Paştî ezê çim sîkê kirrim. *I don't have any food left. I'll go to the store later and buy some.*)

groom zava (m)

ground (1) 'edir
(2) 'erd (f) (Ez ketim ser 'erdê. *I fell down on the ground.*) (Cutîar 'erdê xwe dikêlit. *The farmer plows his land.*)

grow (plants) (v) serkeftin, serkeve (Ew zî bi serkeft. *It grew quickly.*)

grow out (v) drêj kirin, drêj bike (Pirrça xwe drêj bike. *Grow your hair out [long].*)

grow up (v) (1) mezin bîn, mezin bibe [idiomatic] (Wextê tu mezin bî ... *When you grow up ...*) (Ez li Texas mezin bîm. *I grew up in Texas.*)
(2) serkeftin, serkeve [plants] (Ew zî bi serkeft. *It grew up quickly.*)
(3) drêj bîn, drêj bibe [people] (Cuan zî drej bî. *Cuan grew up fast.*)

grudge (1) kerrib (m) (Tu çend bi kerrib u kîn î! *You're so full of grudges!*)
(2) kîn
(3) (*see also* hold a grudge)

gruff burr

grumble (v) qese gotin, qese bêje (Rêzanê qese gotin wextê Suzan çûî nik hevala xwe. *Rêzan grumbled when Suzan went to her friend's house.*) (Demê ewan dînar wergirtî qese gûti ne xudanê xanî. *When they received the denarius, they grumbled against the landowner.*)

grumpy (1) 'abûs (Ar)
(2) beşemî

guard (1) hêres (m) (Ar)
(2) nubedar (Bilind nubedar e li medresa Hanaê. *Bilind is a guard at Hana's school.*)

guest mêhvan (m/f)

guide rêber (m/f)

gulf xelîc (Şerr li nav beyna Kuwêtê u 'Îraqê ji ber Xelîc 'Erebî bî. *There was fighting between Kuwait and Iraq because of the Arabic (Persian) Gulf.*)

gum (chewing) 'elik (m) (Te 'elik divêt? *Do you want some gum?*)

gums (mouth) pidî (pl)

gym (health club) nadîe

gypsy qereç

h

hail gijluk (f) (Gijluk hate xwarê. *Hail came down.*)

hail (v) (1) gijluk hatin, gijluk bê (were) (Gijluk hat. *It hailed.*)
(2) barîn, bibare (Evroke gijluk dibarît. *It's hailing today.*)

hail storm gijluk

hair (1) pirrç (f) [general] (Pirrça wê drêj e. *Her hair is long.*) (Ew pirrça diqosînit. *She cuts hair.*) (pirrça şêrî *mane [of a lion]*)
(2) mî [when talking about just one or two hairs] (Mîek dî hirve were. *Come a hair closer.*)
(3) bisk [long hair in front of a woman's ear]

hair band (elastic) qirrased (f)

hair barrette sinceq (f)

hair dresser (Ew pirrça diqosînit. *She cuts hair.*)

hair gel cel

hair spray sipreya pirrçê

half nîv (m)

half brother bira (m)

half dead deravê mirinê

half empty/full nîv nîv

half sister xoşk (f)

hallway membr

hammer çekîç (m)

hamper [for dirty clothes] selka cilkêt pîs

hand (1) dest (m) (Ew destê wî yê rastê bî. *He was his right hand man [and did everything for him].*) (Heta nîva destî reş ne bît, tama devî xweş nabît. *Until the middle of the hand isn't black, the taste in the mouth won't be delicious. "If people don't have work to do and don't have any money in their hands, it's no good."*)
(2) bi dest (Min bi destê xwe çêkir. *I made it by hand.*)
(3) rex [idiomatic] (bes ji rexe dî ve *but on the other hand*)

hand bag çente (m) (çentê destî *hand bag*)

hand out (v) belave kirin, belave bike

handful destik (m/f) (Min destike gula bu te înadî. *I brought you a handful of flowers.*)

handle destik (m) (destikê derrgehî *the door handle*)

handsome (men) law

hang up (v) (1) telefon girtin, telefonê bigire
(2) vekirin bi elaqê, veke bi elaqê

hanger elaqe (f)

happen (v) (1) çî lê hatin, çî lê bê (were) (Çî lê hat çinko ... *This happened because ...*) (Şula te çî lê hat? *What happened at [your]*

work?) (Çi li te hat? *What happened to you?*)
 (2) çê bîn, çê be (Wextê 11.9 ew teqîne çê bî li New York. *The explosion happened Sept. 11 in New York.*)
 (3) qewmîn, biqewme (Çi qewmî ye? Şer e. *What happened? It's a fight!*)
happiness keyf (f) (Keyfa wî hat. *His happiness came. / He's happy.*)
happy (1) bi keyf
 (2) (*see also* happiness)
Happy birthday! 'Îd mîlata te pîroz bit!
hard (1) zehîmet [difficult] (Dersa me zehîmet bî. *Our lesson was hard.*)
 (Zehîmet e bu deyka min bi timbêlê biçit Ohio. *It's hard for my mother to drive to Ohio.*)
 (2) req [opposite of soft] (Çend kesmêt te req in! *Your cookies are too hard!*)
hard knocks [idiomatic] kumalgeh (f) [idiomatic] (Ew çû ye kumalgehê ye. *He graduated from community school, i.e., from the school of hard knocks / life / experience.*)
hard of hearing [idiomatic] (Guhêt wî giran e. *He's hard of hearing.*)
hard to get along with (e.g., fights a lot) har (Bîka wan çî har e! *Their daughter-in-law is hard to get along with!*)
harvest (1) çinîn (f) (çinîna gula *the flower harvest*)
 (2) dirîn (f) (dirîna genimî *the wheat harvest*) (wextê dirînê *the time of the harvest*)
 (3) durîn (f)
harvest (v) (1) dirîn, bidrî [hay, grain] (Bidrî genimî *Harvest the wheat!*) (Kê genim dirî? *Who harvested the wheat?*)
 (2) çinîn, biçine [vegetables, fruit] (Min sêv çinîn. *I harvested the apples.*)
 (3) (*see also* be harvested)
harvester palê durînê
has to (*see must*)
hat (1) şefqe (m) [hat with a bill: baseball cap, straw hat]
 (2) kulav (m) [Kurdish man's head wrap; stocking cap]
hate (someone) (v) (1) kerrbê ... ji ... ve bîn, kerrbê ... ji ... ve bibe (Kerrbê min jê ve bit. *I hate you.*)
 (2) kerrbêt xwi ji ... ve kirin, kerrbêt xwi ji ... ve ke (he will hate the one *dê kerrib ji êk ji wan ve bît*)
hatred kerib (m)
have (v) (1) hebîn, hebe (Te qelem heye? *Do you have a pen?*) (Min dû qelemêt heyn. *I have two pens.*) (Min sê pişikêt heyn. *I have three cats.*)
 (2) serda çûn, serda biçe (herre) [an abundance of something] (Sitla min ya avê serda çû. *There is a lot of water in my bucket.*) (Goştê min serda çû. *I have a lot of meat.*) (Ew dê serda çît. *He will have*

an abundance.)
 (3) [idiomatic] kêşan, bikêşe (Sebirê xwe bikêşe fieta ew bê. *Have patience until he comes.*)
have a baby (v) biçîk bîn, biçîkî bibe (Ew biçîk bî. *She had a baby.*)
have a discussion (v) dan u standin kirin, dan u standin bike (Min dan u standin li kir li gel mi'elima Hanaê. *I had a discussion with Hana's teacher.*)
have an accident (v) (1) de'mîn, bide'me (Ar) (Heyva neh seyara min de'mî. *My car was in an accident in September.*)
 (2) lêk dan, lêk bide (Timbêla min lêk da li gel timbêlek di. *My car had an accident with another car.*)
have an operation (v) (*see have surgery*)
have pain (v) êşan, biêşe (Dihî zikê min êşa. *My stomach hurt yesterday.*) (Ez ketim, ez êşam. *I fell [down] and got hurt.*) (Serê min diêşit. *My head hurts. / I have a headache.*)
have sex (v) [idiomatic] (Jiberî bêt def te lastîkî kit ber xwe. *Before he goes to you to have sex, put on a condom.*)
have surgery (v) 'emelîat kirin, 'emelîat bike (Lazim e ez 'emelîat bikim. *I have to have surgery.*) (Wê 'emelîat kir. Zikê w vekirin. Mal biçîkê wê înan der. *She had surgery. She had a hysterectomy.*)
have time (v) (1) geheştin, bigehe
 (2) [idiomatic] (Te wexit heye? *Do you have time?* Wextê min kê m e. *I don't have time.*) (wextê te hebit *when you have time*)
have to (*see must*)
hay ka (f)
hazel zeytunî (m)
hazelnut berî (Em berî dikîne bi nav pelêt agirî da şîrîn dibit. U em dixwîn. *We put hazelnuts in a fire pan to make them sweet; then we eat them.*)
he (1) ew [direct] (Ew ket. *He fell.*)
 (2) wî [oblique] (Wî înan. *He brought [them].*)
head ser (m) (Serê wî li 'erdê ket. *His head hit the floor.*)
head board serê textî
head first (1) serserik (Min xwe serserikî havêt di avê da. *I jumped into the water head first. / I dove into the water.*)
 (2) ser u ser
headache (*see have pain*)
headmaster (1) midîre (m)
 (2) midîra (f)
health (1) sefiyet (f) (Señeta ta çawan e? *How are you feeling?*)
 (2) [idiomatic] (Tu dihî biçit hesaî? *How did you feel yesterday?*)

(Tu biçit hiesî? *What's wrong? How do you feel?*)
 (3) (*see also* better)

health club nadîe

healthy (1) sax (Ez ne sax im. *I don't feel well [healthy].*)
 (2) xweş

hear (v) (1) guh lê bîn, guh lê bibe (Min guh li te ne bî. *I didn't hear you.*) (Hewe ya guh lê bûi ku ya hatî ye gûtin ... *You have heard that it was said ...*)
 (2) bihîstin, bibihîze (Te bihîst? *Did you hear?*)

hearing aid sema'e (Vêt sema'a bêxin guhî. *He needs a hearing aid.*)

heart (1) dil (m) [body organ] (Nesaxîa dilî hebî. *He had heart disease.*)
 (2) kupe [playing card]

heart and soul derûn (m)

heart disease nesaxîa dilê (Wê nesaxîa dilê da hey. *She has heart disease.*)

heat (1) gerim (f) (weku hişikîa germa havînê *like the heat of summer*)
 (2) (*see also* heater)

heater (1) hîter (f) [electric]
 (2) zupe (f) [gas, kerosene] (Zupê tamirîne. *Turn off the heater.*) (Zupê hilke; dinya sarr e. *Turn on the heater; it's cold.*)
 (3) sope (f) [gas, kerosene]
 (4) zope (f) [gas, kerosene]

heating pad cewdik

heaven 'esman (m) ('edir u 'esman *heavens and earth*)

heavy giran (Barê min giran e. *My bundle is heavy.*)

heavy (overweight) qelew

hedge as

heehaw (v) [to make the sound of a donkey] zirran, bizirre (Suzan, ka wek kerî bizirre. *Suzan, make the donkey sound.*) (Ew wek kerî dizirrit. *He sounds like a donkey [because he's complaining and griping so much]. [very informal]*)

heel (of the foot) pehîna pê

height bilindahî (f)

helicopter hêlikopter (f)

hell cehnem (Mirovêt xirab diçin cehnemê. *Evil people go to hell.*)

Hello. (1) Çawan î!
 (2) Selam u 'elêykum! (Ar)
 (3) Merrîeba!
 (4) Elu? [said when answering the telephone]

help (v) (1) harî (karîa) ... kirin, harî (karîa) ... bike (Min divêt tu harî (karîa) min bikî. *I want you to help me.*) (Te evroke gelek harî (karîa) mi kir. *Today you helped me a lot.*) (Harî min bike! *Help me!*)
 (2) (Li hana min were! *Help me!*) (Ez li hana te hatim. *I helped you.*)
 (3) (Ez mihtac im! *Help me!*) (Ar)

helper harîkar (Min harîkar nîne. *I don't have a helper.*)

hen mirîşk (f)

henna (paint-like substance put on skin or hair) xena (f) (Min heftîa dî xena li pirra xwe da. *Last month I put henna in my hair.*)

her wê [oblique] (kitêba wê *her book*)

herd garran (f)

here (1) vêrê (Min nan deyna ser vêrê. *I put the bread down here.*) (Ez mam li vêrê. *I stayed here.*)
 (2) [idiomatic] (Nazdar, ka tu? ... Eve ez (im). *Nazdar, where are you? ... I'm here.*)

Herod Hîrudês

hers wê [oblique] (Ya wê ye. *That's hers.*)

hexagon şeş kujî (f)

Hi! (1) Çawan î!
 (2) Selam u 'elêykum!
 (3) Merrîeba!

hiccups îsik (Wî îsik heye? *Does he have the hiccups?*)

hide (v) veşartin, veşêre (Hanaê xwe veşart li min li nav sîkê. *Hana hid (herself) from me in the store.*) (Min parêt xwe veşartin di qensurê da. *I hid my money in the cabinet.*)

hiding place (1) cihekî emîn
 (2) cihekî veşartî
 (3) [idiomatic] perde (f) (Tu perde î bu min. *You are my hiding place / curtain.*)

high drêj (Ev dare gelek drêj e. *This tree is really high [tall].*)

high blood pressure zext (Zext yê dixwînê da hey. *She has high blood pressure.*)

high school mekteba e' dadî

highlights (in hair) mêş (f) (Pirra min mêş kirî ye. *My hair has [bleached] highlights.*)

highway xeteserî'

hill zîr (m)

him (1) ew [direct] (Min ew dît. *I saw him.*)
 (2) wî [oblique] (Ez dê wî înim. *I'll bring him.*)

hip kurmatîx (f)

hire (v) (1) şul bi destê ... ketin, şul bu destê ... bikeve (Çi şul bi destê min ne ket. *I wasn't hired.*)
 (2) dan şulî, bide şulî (Kesekê ez ne dam şulî. *No one gave me any work.*)
 (3) bi kirê girtin, bi kirê bigire (Kesekê em bi kirê ne girtin. *No one has hired us.*)

his wî [oblique] (kitêba wî *his book*)

history (1) mêju (mêjua Kurda *the history of the Kurds*)
 (2) tarîx (f) (Ar)
 (3) kelepur (m) (“Mam u Zîn” çîrokekî kevin e ji kelepurê Kurdî. “*Mam u Zîn*” is an ancient romantic Kurdish legend in Kurdish history.)

hobby hîweyet (f) (Hîweyeta min ez zadî çêkim. *My hobby is making food.*)

hobby (v) (see do one’s hobby)

hockey kaş u kanê

hold (v) girtin, bigire (Hana ne vêt ez destê wê bigirim. *Hana doesn't want me to hold her hand.*)

hold a grudge (v) (1) kerrîbê xwe dan, kerrîbê xwe bide (Kerrîbê xwe ne de kesê. *Don't hold a grudge against anyone.*) (Min kerrîbê xwe da te. *I held a grudge against you.*)
 (2) kîn girtin, kîn bigire

hole (1) kunik (f)
 (2) (see also pot hole)

Holende Holland (li Holende *in Holland*)

holiday (1) ‘îd (f) (Ar) (‘Îda te pîroz bit! *Happy holiday!*) (‘Îd mîlada te pîroz bit! *Happy birthday!*) (‘îda rabûna ‘Îsaî Easter)
 (2) cejin (f) (Bîst u pênc ‘etle çî ye? ‘Îda min e. *Which holiday is the 25th? It's my holiday.*) (cejina Newrozê *the holiday of Newroz [Kurdish independence day]*)
 (3) ‘îda Remezanê / ‘îda fitir [3 days long, immediately after Ramadan]
 (4) ‘îda hîcîa / ‘îda eθha [4 days long 3-4 months after Ramadan which commemorates Abraham’s sacrifice of his son; coincides with the pilgrimage]

holy (1) pîroz (Xwedê pîroz e. *God is holy.*)
 (2) pîruz (Incîl pîruz e. *The Bible is sacred.*)
 (3) (see also holiday)

homesick (1) xerîb (Ez ji Kurdistanê xerîb bîm. *I miss Kurdistan / I'm homesick for Kurdistan.*)
 (2) tengav

homework wacip (Te wacip da min bu Inglîzî? *Did you give me English homework?*)

honey hîngivîn (m)

honeydew melon gindur (m)

honor (v) (1) qedir (m) (Qedirê wê bigire. *Honor her.*)
 (2) rêz girtin, rêz bigire (Rêza dayk u babê xwi bigire. *Honor your father and mother.*)
 (3) staîşa ... kirin, staîşa ... bike (Staîşa wan bike. *Honor them.*)

hoof kabik (f)

hop (v) (1) xwe hilavêtin, xwe bihilavêje (Kêvrîşk xwe dihilavêt / dihilavêjit. *The rabbit hops.*)
 (2) firr dan, firr de [like a chicken]

hope mereq (f) (Mereqa min e: ez Inglîzî bizanim. *My hope is this: that I know English.*)

hope (v) (1) li hîvîê bîn, li hîvîê bibe (Ezê li hîvîê me ez biçim Kurdistanê. *I'm hoping to go to Kurdistan.*)
 (2) hîvî kirin, hîvîê bike (Ez hîvîê dikim biçim Kurdistanê. *I'm hoping to go to Kurdistan.*)

hopeful bi hîvî

hopeless bê hîvî

horn (animal’s) şax (m)

horse hesp (m) (Ez sîar bîm [li hespî]. *I rode [the horse].*)

hospital (1) xeste (f)
 (2) xestexane (f)

hot (1) gerim (f) [temperature, weather] (Min gerim e! *I'm hot!* [*The temperature is hot to me.*]) (Gerim e. *It's hot.*)
 (2) kel [boiling] (Ev ave kel e. *That water is hot.*)
 (3) tîj [spicy]
 (4) dijar [spicy]

hot chocolate kekew (f)

hot springs germav (f)

hotel (1) findeq (f) (Ar)
 (2) îtêl (f)

hour se’et (f) (Se’et çend e? *What time is it?*) (Bi teyarê çend se’et in? *How many hours by plane?*)

house (1) mal (f) [home]
 (2) xanî (m) [the building]

house dress (Kurdish woman’s) dijdaje (m)

house painter sebaş (m)

house slipper ni’al (m)

househelp xudam

housekeeper xudam

housewife (1) jina malê
 (2) rebetbêyt (Ar) (f)

how (1) çawa (Tu çawa çêdikî? *How do you make it?*)
 (2) çawan (Tu çawan î? *How are you?*)

how far çend dîr (Medrese çend dîr e? *How far is the school?*)

how long çend dîr (Rêk çend dîr e? *How long is the journey?*) (Rêk çend se'et in heta tu bigehî Texas? *How long does it take you to get to Texas?*)

how many çend (Te çend bazînk hene? *How many bracelets do you have?*)

how much çend (Ev çente bi çendê ye? *How much does this bag cost?*) (Hêqê te çend e? *How much is the [your] cost / fare / fee?*)

how often çend ca (Salê çend ca tu diçî dixurî? *How often in a year do you go to the doctor?*)

howl orênî (f) (orênîa gurga *the wolf's howl*)

hug (v) xwe havêtin, xwe pavê (Min deyka xwe dît, min xwe havêtê. *I saw my mom and hugged her.*) (Were, Roj. Xwe pavê min. *Come here, Roj. Give me a hug.*) (Wê xwe havêta min. *She hugged me.*)

huge (people, animals) zexim

human mirov (m/f)

humble (1) xwe mezin nakit
 (2) derun biçîk

humid (1) terr
 (2) rut u bet

hump (of a camel) dîng (m)

hungry (1) bîrsî (Ez bîrsî me. *I'm hungry.*) (Li Efrîqê alem bîrsî ne. *Everyone in Africa is hungry.*)
 (2) têr [idiomatic] (Ez têr im. *I'm not hungry. / I'm full.* Min têr xwar. *I ate until I was no longer hungry.*)

hunter nêçîrvan (m)

hunting nêçîr (f) (Ez çûm nêçîrê. *I went hunting.*)

hurricane (1) baî u babelîsk (Wextê baî u babelîsk hatî, mala me pîç kir. *My house was damaged by the hurricane.*)
 (2) baî u baruv (Şevê dî baî u baruv qîame dibî. *Last night we had a hurricane.*)

hurry (in a hurry) bi lez (Ew bi lez e. *He's in a hurry.*)

hurry up (v) lezê kirin, lezê bike (Lezê bike da biçîn sîkê. *Hurry up so we can go to the store.*)

hurt êşandin (f) (*see also pain*)

hurt (v) êşandin, biêşîne (Kê tu êşandî? *Who hurt you?*) (Hîkmetê biraê min girtin, êşandin. *The government arrested my brother and hurt him.*)

husband (1) mêr (m) (mêrê min *my husband*) (jin u mêr *husband and wife*)
 (2) zelum (m) [villagers say this]

hydrogen peroxide oksicin

hypocritical dirrî (Ew çi dirrî ye. *She's very hypocritical / two-faced.*)
 (Ew dirrî ye. *He's a hypocrite.*)

hysterectomy (Mal biçîkê wê înan der. *She had a hysterectomy.*)

i

I (1) ez [direct] (Ez hatim. *I came.*) (Ez dê çim. *I'll go.*)
 (2) min [oblique] (Min tu dîtî. *I saw you.*) (biraê min *my brother*)

i.d. card (1) cînsîe (f)
 (2) hewîe [social security card, drivers license, health/car insurance card, etc.]

I'm sorry. (1) Qosîrîa min 'efî ke.
 (2) El 'efu.

ice (1) befîr (f) [cubes or crushed] (Piçek befîrê bîne. *Bring (me) some ice [cubes].*) (Bu min gelek befîrê bike tê da. *Put a lot of ice in it for me.*)
 (2) qarîsûk [on the streets] (Şarî' qarîsukê girtî. *There's ice on the street.*)
 (3) cemed [on the streets]

ice cream dondîrme (Ar) (f) (Biçîkê min hîes ji dondîrmê dîkin. *My kids like ice cream.*)

icicle zengîluk (m) (Zengîlukê befîrê mala me girti bî / çê bî. *Our house got icicles.*)

icy (1) qarîsûk (Evro dinya qarîsûk e. *It's icy today.*)
 (2) befîr (Şarî' befîr e. *The street is icy.*)
 (3) qarîsî (Ava tankî yê qarîsî. *The water tank is icy.*)
 (4) cemidî

idea (1) hizîr (Hizîrek hate bîra min. *I got an idea.*) (Min çi hizîr nînin. *I don't have any ideas.*)
 (2) tefkîr (f) (Ar)

idol senem (Hîndî 'îbadeta senema dîkin. *Indians worship idols.*)

if (1) heker (Heker ez çûm ... *If I went ...*)
 (2) wekî (Wekî em biçîn Kurdistanê ... *If we go to Kurdistan ...*)

ignorant nezan (Ey nezan! *You ignoramous!*) (Ew mirov nezan e. Çi tiştî nîzanî. *That person is ignorant; he doesn't know anything.*)

ill (fatally so) people (1) nesaxîa (Êşa nesaxîa kete di nav milletê. *The pain of the fatally ill was felt by the people.*)

(2) ta'în
 (3) kulêre

illegal (alien) qeçax̄ (Heker tu qeçax̄ (î), tu ne şêî şul bikî. *If you are an illegal alien, you can't work.*) (Xoşka te bi qeçax̄î hat? *Did you sister come illegally?*)

illegal drugs muxedir (m)

illiterate umî

illness nesaxî (f) (nesaxîa dilê *heart disease* - Wê nesaxîa dilê da hey. *She has heart disease.*) (nesaxîa şekirê *diabetes*)

image (1) wêne (bi wênê Xwedê *in the image of God*)
 (2) şibihîn (f) (bi şibihîna Xwedê *in the image of God*)
 (3) tejbe (Ar) (Bîk tejbê mirova ne. *Dolls are made like (in the image of) people.*)

Immanuel 'Emanuêl

immediately (1) her cêh da (Her cêh da ez çûm. *I left immediately.*)
 (2) êk ser (Heker tu geheştî malê, êk ser telefuna min bike. *When you get home, call me immediately.*)

immigrate (v) miñacir bîn, miñacir bibe

immodest (1) bê sitar (Ooo tu çi bê sitar yê rîniştî. *Oh, you sat in an immodest way.*)
 (2) (*see also* naked)

immunity mena'e (Ar) (Wê mena'e yê hey ew dermanî bixwit. *She has an immunity [to the germs] so she doesn't have to take the medicine.*)

impatient bêhin teng

impediment (speech) fis (Ezmanê wî fis e. *He has a speech impediment.*)

impolite ne edeb

important (1) mohîm (Ev derse gelek mohîm e. *This lesson is really important.*)
 (2) mezin (zelamekî mezin *an important man*)
 (3) (*see also* be important)

important (v) (*see* be important)

impossible (1) ebed na çê bit (Ev şule ebed na çê bit. *This thing will never happen / It's impossible.*)
 (2) qedna bît (Eve qedna bît li def miruva. *This is impossible for / with man.*)

impossible to live with (fights a lot) har (Bîka wan çi har e! *Their daughter-in-law is hard to get along with!*)

in (1) di ... da (Av di glasî da heye? *Is there water in the glass?*) (Ez hatim di seyarê da. *I came in the car.*) (Betenî di textû da ye? *Is the blanket in the bed?*)

(2) (di) nav ... da / ra (Mala zavaî sê çar bixçika yêt reng u reng dê kinit nav da. *The groom's family will put three or four sets of colorful clothes in it [the cloth].*) (Qelemê di nav kitêbê da ye. *The pen is in the book.*)

(3) (li) ber (Ez li ber sihê rîniştim. *I sat in the shade.*)

(4) li nav ... da / ra (Ez bi rê ve çûm li nav befirê da. *I walked in the snow.*) (Gul yê li nav hêdîqê da. *The flowers in the garden.*)

(5) di ... ve (Kî li mezêlê ye? Kiçê tê ve ye. *Who's in the room? The girl's in there.*)

(6) li (Ewa li metbexê ye. *She's in the kitchen.*) (Ezê li hêmamê me. Ezê paqij dikim. *I'm in the shower room; I'm cleaning it.*)

(7) di nav (Kakil di nav tovî da. *The seed is in the husk.*)

(8) bi ... ve (Kilîlê bi derrgehî ve. *The key is in the door.*)

(9) bi ... ra (Kilîlê bi derrgehî ra ye. *The key is in the door.*)

(10) da (Min kitêb kir çantê xwe da. *I put the book in my bag.*)

(11) tê da (Befir selacê da? E, yê tê da. *Is the ice in the fridge? Yes, it's in it.*) (Bike tê da. *Put it in [the bag].*) (Te şekir kirî ye tê da? *Did you put sugar in it [the tea]?*) (Te sîr kirî ne tê da? *Did you put garlic in it [the dolma]?*)

in a hurry bi lez (Ew bi lez e. *He's in a hurry.*)

in between (1) navbeyna (Ez navbeyna Amy u te me. *I'm between you and Amy.*)
 (2) navbeyna ... da (Were navbeyna me da rîne. *Come sit between us.*)

in front of (1) berê
 (2) (li) ber (Ew nivist li ber hîtera min. *She slept in front of my heater.*) (Xwarina li ber te bixwe. *Eat the food in front of you.*)
 (3) ji ber (Herre ji ber sîtafka min. *Go in front of my shadow.*)
 (4) li pêşîa (Ew li pêşîa hevalê xwe rînişt. Ew li pêşîa min diçû. *He walked in front of me.*) (Kî li pêşîa min e? *Who is in front of me?*)
 (5) li pêş ... ve (Mala me li pêş mala we ve ye. *Our house is in front of your house.*)

in order to (1) da (Ez çûm medresê da ez Kurdî bi'elimim. *I went to school in order to learn Kurdish.*)
 (2) da ku (Ez hatim mala te da ku ez dersê nîşa te bidim. *I came to your house in order to give you a lesson.*)

in other words ye'nî (Ye'nî ez bu te çi bêjim? *In other words, what shall I tell you?*)

in the name of God who is great and merciful [said to begin something like a lesson or formal discussion] bi navê Xwedê mezin u mehreban

in the way (under foot) [idiomatic] (Biçîk li ber pêt min e. *The child is under foot / in the way.*) (Herre ji ber pêt min. *Go away! You're in the way / under foot.*)

incense (1) bixwîr (m) (Min bixwîr hilkir. *I lit the incense.*) (Bêhina bixwîrê gelek xweş e. *The smell of incense is very nice.*)
(2) bihinêt buxîrê

inch înc (f) (Ev qeleme çend înc e? *How many inches long is this pen?*)

income pare (f) (Pareêt we di heyvê da çend e? *How much income do you have every month?*)

incomplete (1) ne xilas (Qamusê min ne xilas bî. *My dictionary was incomplete.*)
(2) ne temam

increase (v) (1) pitir kirin, pitir bike
(2) zêde kirin, zêde (bi)ke (Pareêt min bu min zêde (bi)ke. *Give me a raise.*)
(3) zêdetir bîn, zêdetir bibe [in number]

incubator (for infants) cîhazê biçîk

indebted to deyndar (Ez deyndar im. Ez deyndara Nazdarê me. *I'm in debted; I'm indebted to Nazdar.*)

independent (Bi xwe harî karîa xwe bi tinê dikit. *He does [the work] by himself.*)

India Hind (f)

inexpensive erzan

inexperienced nezan

infected kul (Singê wê kul e. *She has pneumonia. = Her chest is infected.*)

infection (1) kulatî (Heker tu paqij nakî dê kulatî êt ve. *If you don't wash it, it will get an infection again.*) (Kulatîekê li destê min e. *My hand has an infection.*)
(2) edab (Kulka çîçkê min edab jê têt. *My breast lump is oozing pus (infection).*)

inflamed kul (Singê wê kul e. *She has pneumonia. = Her chest is infected.*)

inform (v) agedar bîn, agedar bibe (Tu agedar bûî? Sibe em dê çîn seyranê. *Did you inform [them]? We're going to go on a picnic tomorrow.*)

information pêzanîn (Eve pêzanîn sîka Roz. *This is the information from the Ross store.*) (Eve pêzanînê dixturî ne. *This is the information from the doctor.*)

ingredients meqadîr (Ar) (Çi ye meqadîr kêke? *What are the ingredients in cake?*)

inhale (v) (1) bêhina xwe kêşan, bêhina xwe bikêşe
(2) nefesa xwe kêşan, nefesa xwe bikêşe (Ar) (Min nefesa xwe kêşa. *I inhaled.*)

inherit (v) (1) geheştin, bigehene (Tiştê wê dê gehene min. *I will inherit her things. / Her things will come to me.*) (Mîratê wî geheşte min. *I inherited his things. / His things came to me.*)
(2) bi dest xwi ve înan, bi dest xwi ve bîne
(3) ber ... ketin, ber ... bikeve (Ji malê ev komedîne ber min ket. *I inherited this dresser from the house.*)

inheritance mîrat (m) [things which belonged to people who have died; the things are given to the poor or to relatives] (behira min ji mîratî *my share of the inheritance*) (Ev tişte mîratê mala pismamê min e. *These things belonged to my cousin's family.*) (Bapîrê min wextê mirî, mîratê xwe ser me lêk vekir. *When my grandfather died, his things were given to us.*) (\$4000 ji mîratê bapîrê min geheştin min. *\$4000 was given to me as an inheritance from my grandfather.*)

initial (1) pîta ewilî
(2) leqep (m)

injection (1) derzî (f) (Sisterê bu min derzî dana. *The nurse gave me an injection.*)
(2) şirênge (f) (Ar)

ink hîbir

innkeeper xudanê xanê

insect (1) edî
(2) heşerat

inside (1) di jur ve (Ew ma di jur ve. *He stayed inside.*)
(2) jur ve (Herre jur ve. *Go inside.*)

inside (1) ji nav da (Ji nav da diêşit. *It hurts inside.*) (Ji nav da min sehkirê. *I looked inside [the house].*)
(2) derûn (m)

inside (of clothes, things) beten

inside out (clothes) vajî

insist (v) welê kirin, welê bike

inspect(v) ceribandin, ceribîne (Ceribîne da tu bizanî şul dikit an şul nakit. *Inspect it to know if it works or not.*)

inspiration wehî (Ar) (Bu wî wehî hat ji def Allahî. *Inspiration came to him from God.*)

instead of pê ji ... ve (Ez pê ji wî ve hatim. *I came instead of him.*)

insult (v) (1) qedirê ... ne girtin, qedirê ... ne gire (Min qedirê wê ne girt. *I insulted her.*)
(2) îhana ... kirin, îhana ... bike (Min îhana wê kir. *I insulted her.*)

(3) xeber gotin, xebera bêje (Xeber têt kirêt gotine min. *He insulted me.*)
insurance (health, car) te'mîn
intelligent têgeheştî (Ev dixture gelek têgeheştî ye. *This doctor is very intelligent.*)
interest (1) feyde (m) (Ez gel wê çûm sîkê çinko feydê min tê da bî. Min bi xwe kirasek kirî. *I went to the market with her because I was interested in doing that. I bought a dress for myself.*)
(2) feyde (f) (Banq feydê dideynit ser parêt min. *The bank gives me interest on my money.*)
interesting (unknown, unseen things or situations) xerîb (Ev kitêbe gelek xerîb e. *This book is very interesting.*) (Deynesor xerîb e bu min; min ne dîfî ye. *Dinosaur is unknown to me; I've never seen one.*)
interior derûn (m)
international (1) xerîb (m/f) (Ez çûm Hindê; ez xerîb im. *I went to India. I'm an international [foreigner].*)
(2) bîanî (m/f) (Kurd li Emrîke bîanî ne. *Kurds are internationals [foreigners] in America.*)
(3) ixtîsas (m/f) (Ar)
internist (doctor) dixturê batinî (m)
interpreter terciman (m/f)
interrogate (v) (1) pişîara ... kirin, pişîara ... bike
(2) lê pirsîn, lê bipirse
interrupt (v) têk birin, têk bibe (Axiftina me têk ne be. *Don't interrupt our conversation.*)
interview (v) lê pirsîn, lê bipirse
intestinal parasites hinav êsî
intestines rîvî(k) (pl)
into di ... da (di avê da *into the water*)
into everything [children] har
nobody kes (Kes pirsîara min nakit. *Nobody asks me.*) (Kes ne li mal e. *Nobody is home.*)

noise (v) (*see* make noise)

nomad (shepherd) koçer (m)

none nîne (sng); nînin (pl) (Min nînin. *I have none.*)

noodles (1) ma'kerunî (f)
(2) rijid (pl) (Piçek duhinî bike binê qazanê da u rijdêt xwe biqelîne. *Put some shortening in the pan and fry the tiny noodles.*)

noon (1) nîro
(2) nîvroj

normal tebî'î

north (1) juro (m)
(2) şîmal (Ar) (m)

nose difin (f) (Difna min têt xwarê. *I have a runny nose.*) (Difna wê xwîn jê têt. *Her nose is bleeding.*)

nosey mereqdar

note name

note pad defter (f)

notebook defter (f)

nothing (1) çi ne (Te çi kirrî? Çi ne. *What did you buy? Nothing.*)
(2) çi tişt ne (Çi tişt ne bî. *There was nothing [I wanted to buy].*)
(3) hîç (Ar)
(4) [idiomatic] (Eve lêlê u lulu te ne dîtî ne. *If you think this is good / hard, you ain't seen nothin' yet.*)

noun (1) nav (m)
(2) new (m)

novel çîrok (f)

November (1) Çirîa duê (f)
(2) heyva yazde (f)

now (1) nuke
(2) niho
(3) niha
(4) gav (m) (Dersa Kurdî vê gavê bes e. *I've had enough of the Kurdish lesson for now.*)

number (1) reqem (m) (reqemê derrgeh (*apartment*) *door number*) (reqemê êkê / dûê *number one / two*) (Reqemê telefuna te çend e? *What's your telephone number?*)
(2) jimare (f) (jimara êk *number one*) (jimara mal *house number*) (jimara avahî *apartment building number*) (jimara derrgeh *apartment door number*)
(3) hijmartin (f) (Hijmartinê bu min bêje. *Say the number for me.*)
(4) tîp (f) (tîpa êkê / dûê *number one / two*)
(5) çendek [a number of]
(6) hindek [a number of] (Min hindek xîar kirrîn. *I bought a number of cucumbers.*)

nun reben (m/f)

nurse (1) sister (f) [female]
(2) mizemid (m) [male]

nursing home mala pîra

nuts fisteq (f) (Herre fisteqa bîne. *Go bring some nuts.*)

O

oath (1) sînd (f)
(2) suzat??

obedience (to God) ta'et (f) (Ne kirîna ta'eta Xwedê gunneh e. *Disobedience to God is sin.*)

obedient (1) 'aqil
(2) [idiomatic] (Ez pîa wî dikim. *I'm obedient to him.*)
(3) mutî' (Ar)

obey (v) pîa ... kirin, pîa ... bike (Roj pîa min ne kir. *Roj didn't obey me.*)

OB-gyn (women's doctor) dixturê jinka (m)

obligated to deyndar (Ez deyndara te me; te dersa Kurdî dan min. *I'm obligated to you; you gave me Kurdish lessons.*)

obliged to mecbur (Mecbur e. *It has to be done.*)

occasion (1) minasebe (f) (Ji ber minaseba Cejina Newrozê, emê çîne seyranê. *Because of the occasion of Newroz, we will go on a picnic.*)
(2) rêkeftin (f) (Ji ber rêkeftina Cejina Newrozê, emê çîne seyranê. *Because of the occasion of Newroz, we will go on a picnic.*)

ocean behîr (f)

October (1) Çirîa êkê
(2) heyva deh (f)

odor bêhin (f) (Bêhin ne xweş e ji te têt. *Your body odor is bad.*)

of course (1) helbet (Helbet ez u tu dê çîne mala Çîmenê çinko dê çîne Kurdistanê. *Of course you and I will go to Çîmen's house, because they are going to visit Kurdistan.*)
(2) teb'an (Ar)
(3) ekîd (Ar)

offer (v) pêşkêş kirin, pêşkêş bike (Me Şîrîn pêşkêş kir. *We offered Şîrîn [to Abdulxênî for marriage].*)

office (1) nivîsingeh (f) (Ez çûm nivîsingeha Gare. Min hindek şulêt xwe çêkirin. *I went to the Gare office and did some work.*)
(2) da'îre (Ar) (midîrê da'îrê *office manager*) (da'îra mehkemê *courthouse*)

officer (1) serbaz (m) [soldier]
(2) zêrevan (m) [supervisor]

official karbedest (Karbedestî xanîa min bu min bi rêk îna. *The official got my house in line for me.*)

offspring ber (m)
Oh, my goodness! Maşalla!
oil (1) rûn (m)
(2) zeyt (f) (Ar)
oil (v) rûn kirin, rûn bike (Min sênîa xwe rûn kir u min kesmêt xwe kirin tê da. *I oiled my pan and put kesme on it.*)
oil lamp çira (f)
OK (1) bila (Bila ezê li gel te êm. *OK, I'll come with you.*)
(2) tebî'î (Tebî'î tu bêl mala me. *It's OK for you to come to our house.*)
(3) ye'nî ["it's OK, but I don't really like it"]
okra bamî (f)
old (1) mezin [people] (Deyka min mezin e. *My mother is elderly.*)
(2) pîr [people]
(3) êxtîar [very old people]
(4) gelek di nav sala da [people] (Her dû gelek di nav sala da çû bîn. *They were both well along in years.*)
(5) kevin [things] (Ev xanîe kevin e. *This house is old.*)
(6) (*see also age*)
old age mezinatî (f) (Çend mezinatî ne xweş e! *Old age is awful!*)
older meztir (Xoşka min meztir e ji min. *My sister is older than me.*)
oldest child nexirî
olive zeytun (f)
olive oil zeyt (f)
on (1) li (Xanîe min li ruginî ye. *My house is on the corner.*)
(2) (li) ser (Kêrik li ser mîzê ye. *The knife is on the table.*)
(3) bi ... ve (Se'etê bi dîwarî ve ye. *The clock is on the wall.*)
(4) [idiomatic] (bes ji rexeke dî ve *on the other hand*)
(5) [idiomatic] (Ka Fatima? Bi rê ve. *Where's Fatima? She's on the way.*)
on foot pîa (Ez pîa çûme malê. *I went home by foot.*)
on sale (*see marked down*)
once (1) carekê (rojê carekê *once a day*)
(2) neqilekê (heftîe neqlekê *once a week*)
one nîne (sng) (Min nîne. *I don't have one.*)
one êk (f) (êk êk *one after the other*) (Biçîk êk êk çûn medresê. *The kids went to school one after the other*) (êk ji wan *one of them*)
one billion hizar milyon
one hundred sed (f)
one million milyon (f)
one thousand hizar (f)
one-eighth êk ji heştê
one-fourth çarêk

one-half nîv (m)
one-quarter çarêkek
one-third sê behir
one-way (ticket) êk rê
onion pîvaz (f) (pîvaz terik *green onions*) (Me dolma u pîvazî çêkirîn. *We made dolma and onions.*)
only bes (Bes evro ez dişem bêm nik te. *Only today can I come to your house.*) (Em hemî çûn seyranê bes mala Adarê ne hatin. *We all went on the picnic; only Adar's family didn't come.*) (Ez dişem bes piçîskeke rînim. *I can only stay/sit for a short time.*)
opal mirarî (f) (?)
open (v) vekirin, veke (Pencerê veke. *Open the window.*)
opened (v) (*see be opened*)
operation (*see have an operation*)
operator xudanê telefonê
opinion reî (f) (Min reîa xwe bedil kir. *I changed my mind.*)
opposite from (1) meqabile (Ez u tu meqabile êk in. *You and I are opposite from each other.*)
(2) meqabilî (Mala me meqabilî avê ye. *Our house is across from the water.*)
(3) feriq (Ez ji Nîazê feriq im. Ez ze'îf im; ew qelew e. *I'm opposite from Nîaz. I'm thin; she's fat.*)
(4) jêk dîar (Şirîn u Şermîn jêk dîar in. *Şirîn and Şermîn are opposite from each other [in appearance].*)
opposite of (1) 'ekis (f) (Şil 'eksa ziha ye. *Wet is the opposite of dry.*) (Ew 'eksa êk in. *They're opposites of each other.*)
(2) feriq (Bilind feriq e ji kort. *Tall is the opposite of short.*)
or (1) an (An ez u tu dê çîn; an tu bi tinê herre. *Either you and I go [together] or you go by yourself.*)
(2) anjî (Anjî ezê li gel te êm. *Or I will come with you.*)
(3) yan (*see an above*)
orange (1) pirteqalî (m) [color] (Kumlekê min pirteqalî ye. *My shirt is orange.*)
(2) pirteqal (f) [fruit]
(3) mişin [soft drink]
orchard (1) çem (m)
(2) rez (m)
order (1) emir (m)
(2) ferman (f) [command]
order (v) (1) ferman dan, ferman bide (Xudanê wî ferman da wî bifruşin. *His master ordered that he be sold.*)
(2) xwastin, bixwaze (Minê xwastî bu min textî li gel çêkin. *I*

ordered it [sofa] with a bed in it.) (Ez dê xwazim ji wan bu min textî li gel çêkin. I will order it [the sofa] to be made with a bed in it.)
 (3) daxwez kirin, daxwez bike

organize (v) lêk dan, lêk bide (Mêza xwe lêk bide. *Organize your desk.*)
organized lêkdaî (Mala Adarê lêkdaî ye. *Adar's house is organized.*)
other dî (Çenta dî bine. *Bring the other purse.*)
ought to (1) lazim (Lazim e tu Inglîzî bi'elimî. *You must learn English.*)
 (2) mecbûr (Ez mecbûr im. *Yes, I must.*)
ounce ewns
our me [oblique] (kitêbêt me *our books*)
out of the country xaric (Ar) (Xaric ji der ve Emrîka ye. *Xaric is "outside" of America.*) (Çîmen çû xaric. *Çîmen went out of the country.*)
outlet (1) pilak (f)
 (2) pleg
outside (1) ji der ve (Herre ji der ve. *Go outside.*)
 (2) kulanê (Hana pê xas çû kulanê. *Hana went outside barefoot.*)
outside (of clothes, things) serve
oval şiklê hêkê
ovary mebîrθ (Ar)
oven (1) firne (f) (Min mirîşka xwe di firnê da çêkir. *I baked chicken in the oven.*)
 (2) tenîr (f) (di tenîrêt agirî da *in the fiery furnace*)
oven (wood-burning oven for bread, kilêçe, etc.) tenîr (f) (di tenîrêt agirî da *in the oven*)
over (1) li hindav (Teyare li hindav avê bî. *The plane was over the water.*)
 (2) (li) ser (Teyar firrî li ser bajêrî. *The plane flew over the city.*)
overalls penterrunê esqî
overcome (v) (1) serketin înan, serketin bîne (Min serketin li ser cîhanê îna. *I have overcome the world.*)
 (2) têk birin, têk bibe
overflow (v) bi serda riştinn, bi serda birrêje (Perdaxa min bi serda rişt. *My cup overflowed.*)
overhead projector sîname
overseas xaric (Ar) (Ez çûm xaric. *I went overseas.*)
owl qirr (f)
owner xudan (m/f) (Ew xudanê seyarê ye. *He is the owner of the car.*)
 (xudanê teksî *taxi owner/driver*)
oyster sedef

p

pack (v) tişt kirin di pakêta da, tişt bike di pakêta da
package (1) 'elbik [small]
 (2) sinduq
 (3) kartun
pad (feminine sanitary) santî
pagan (1) peykerperês (Ew li dev te bit weku peykerperês u bacgir bit. *Treat him as you would a pagan or a tax collector.*)
 (2) kafir
 (3) netewe
page perr (m) (Perrê bîst u dûê veke. *Open to page 22.*) (Bizivirrîne perrê sîê. *Turn back to page 3.*) (Min navê xwe dîmahîka perrî nivîsî. *I wrote my name on the last page.*)
pain (1) êş (f) [physical] (Êşa zirav *tuberculosis*) (Êşa nesaxîa kete di nav milletê. *The pain of the sick was felt by the people.*)
 (2) xem (f) [emotional] (Xema Silavê gelek e çinko xoşka wê yê mirî. *Silav's pain is great because of her sister's death.*)
 (3) (*see also* hurt)
paint sibiş (f)
paint (v) (1) sibiş kirin, sibiş ke (Ar) (Min metbexa xwe sibiş kir. *I painted my kitchen.*)
 (2) buyax kirin, buyax ke
painter sebaş
painting (picture) rismê destî
pair (1) cut
 (2) kit (f) [actually means one of the pair] (Ka kita ni'ala min? *Where is my one matching slipper?*)
pajamas (men's) bîcame (m)
palm of hand kefa destî
palm reader falçî
pan qazan (f)
pancreas penkrîes (f)
panties derpê (m)
pants (1) penterrun (m)
 (2) (*see also* şelwal and şel u şepik)
pantyhose gura bi derpê
paper (1) wereqe (f) (Bu min wereqe hat. *I got the paper.*)
 (2) perr
 (3) kahez (f) (Ka kahezê bide min. *Give me the paper.*) (Ev kîske kahez e. *This bag is paper.*) (Kîskê kahez bide min. *Give me the paper bag.*)
 (4) ewraqe [in reams]

paper products kažezê paqijkirnê
paper towel (1) kilînîks (m)
 (2) kilînîs (m) (kilînîsê metbexê *paper towel*)
parable (1) gûtin (f)
 (2) numune (f)
 (3) meseluk (f)
 (4) serhatî (f)
 (5) meθel (Ar)
 (6) xûn (f)
 TR0
paradise cinet (f) (Enşallah tu biçî cinetê. *God willing you will go to paradise.*)
parallel beran berî êk (Xatê beran berî êk in. *The lines are parallel.*)
pardon (v) (1) burandin, bibure (Li min bibure. *Pardon me. [said also after sneezing]*)
 (2) ‘efu kirin, ‘efu bike (Min ‘efu ke. *Pardon [forgive] me.*)
parents deybab (m) (Deybabê Adarê sax in. *Adar’s parents are alive.*)
park (1) çul (f) (Em biçîn çulê. *Let’s go to the park.*)
 (2) cihê seyranê
parking garage gerac (f)
parking space cihê timbêlê
parsley kerefîs (f)
part (1) behir (f) (Eve behira te ye. *This is your part.*) (behirek ji vê kêkê *a part of this cake*)
 (2) qet (f)
 (3) parçe (f)
 (4) rastik (f) [in hair]
partridge kew (f)
party hefle (f) (Ez dê heflekê bu Amy çêkim. *I will throw a party for Amy.*)
pass by (v) (1) burîn, bibure (Ez burîm. Min tu ne dîtî. *I passed by; I didn’t see you.*) (Pas burî u me ne dît. *The bus went by and I didn’t see it.*) (Ez burîm. *I passed it [the house I was looking for].*)
 (2) [idiomatic] (çû rexê dîê rêkê *passed by on the other side*)
pass out (hand out) (v) belave kirin, belave bike
passenger nefer (m/f) (Neferê min gelek in. *I have a lot of passengers.*)
Passover (1) Cejina Derbazbunê
 (2) Nanê Şikeva
passport (1) peseport (f) (Peseporta Hanaê Emrîkî ye. *Hana’s passport is American.*) (Wextê peseporta min xilas bî. *My passport is expired.*)
 (2) cewisifir (Ar)

paste me’cîn (f)
pastor (*see* priest)
pasture (1) zevî (f)
 (2) çul (f)
 (3) çerwan (Min li çerwanê kesik tewil didet. *He makes me lie down in green pastures.*)
pasture çul (m) (Em çûne çulekî gelek xweş. *We went to a nice pasture.*)
path rêk (f) (Rêka me gelek teng e. *Our path is really narrow.*) (di rêka da *along the path*) (berê min didet rêkê rastîê *before me are paths of righteousness*)
patience sabirî (m) (Sabirî nîşa me dit. *I learn patience.*) (Sebirê xwe bikêşe hefta ew bêt. *Have patience until he comes.*)
patient bêhin fireh (Şirîn bêhin fireh e. *Şirîn is patient.*)
patient (v) (*see* be patient)
paw pê (m)
pay kirî (Kirîa xwe wergire. *Take your pay.*)
pay for (v) bi kar hatin, bi kar bê (were) (Lazim e mirin bu gunnehê bi kar bêt. *Sin must be paid for by death.*)
PDK (Kurdish political party) demokratî (Yêketî u demokratî pêk hatin. *PUK and PDK came together / made an agreement.*)
peace (1) aştî (f) (Aştî dê bu we hêlim. *I will leave you with peace.*) (Aştî kete Kurdistanê. *Peace came to Kurdistan [because now there’s no more fighting].*) (Min aştî çêkir navbeyna her dû hevala da. *I made peace between the two friends.*)
 (2) tenahî (f)
peaceful rehetî (Nuke Kurdistan rehetî ye. *Now Kurdistan is peaceful.*)
peach xux (f)
peacock tewuz (Min evro teyrek tewuz dît; perrêt wî şîn bîn. *I saw a peacock today; his feathers were blue.*)
peanut butter tehîna fisteq ebîda
peanuts fisteq ebîd
pear hirmîk (f) (Hirmîkê ji darê bike. *Pick the pear [off the tree].*)
pearl lulu(f)
peas (green) fasolî yêt ter
peasant (in feudal societies) (1) pale (m) (Pale bu axaî şul dikin. *Peasants work for the agha.*)
 (2) felañ (m) (Ar)
pediatrician dixturê biçîka (m)

peel (1) kelpik (m) (kelpikê muzê *banana peel*)
 (2) tîvil (m)

peel (fruit, eggs, vegetables) (v) spî kirin, spî ke

peeler kerka spîkîrnê

pelvis hestîê heçî

pen (1) qelem (m) (qelemê hîbire *ink pen*) (Qelemî bu min bîne. *Bring me the pen.*)
 (2) kuxik (f) (kuxkê peza *sheep pen*)

pencil qelem (m) (qelemê risase *lead pencil*)

pencil sharpener qet'e (*sharpener*) (qet'a qelemî *pencil sharpener*)

penny (1) sent (f) [American money]
 (2) filis (f) [Iraqi money]

people (1) millet (f)
 (2) xelk (m) (Xelkê Zaxo baş bîn. *The people of Zaxo were good.*) (Tu xelkê kêrê? *Where [which people] are you from?*)
 (3) ehl (m)

pepper (1) bîber (f) (bîbera sorr *red / chili pepper*)
 (2) filfil(ik) (m) (filfilê sorr *red pepper*) (filfilêt reş *black pepper*)

peppermint pîng (m) (Mîn pîng kir di nav kotilkê xwe da. *I put peppermint in the kotilk.*)

Pepsi bipsî (f)

percent (ji) sedê (95 (ji) sedê 95%)

perception pêhesa(n) (f) (Jiber hindê ewêt pêhesan rîz bîn u şerim bîn. *Therefore they felt naked and shameful.*)

perch (v) lîsîn, bilîse (Teyr lîsîn ser hêlîna xwe. *The bird perched on his nest.*)

perfect (1) dirist [situations, things]
 (2) ecêb [very nice]
 (3) temam [situations, things]
 (4) bê kêmasî [things]

perfect (v) dirist kirin, dirist bike

perfectionistic bi ser u ber [organized, clean, put together] (Dixtur bi ser u ber e. *The doctor is perfectionistic.*)

perfume (1) ava gula (Çî bêhinek xweş e ava gula ye. *Perfume has a great scent.*)
 (2) lewente

period (1) serdem (f) [time] (dumahîa serdema cîhanê *the end of the age of the world*) (Dumahîka serdema Sedamî, çû di Kuwêtê da. Bu wî bî ne xweşî. *At the end of Saddam's time in office, he went to Kuwait. It was very bad for him.*)
 (2) 'ade (Ar) [menstruation] ('Ade min heye. *I have my period.*) (Dîmahîkê 'adê dest pê bike bixwe. *Begin to take [the birth control pills] when your period is finished.*)

(3) bê nivêj [menstruation; idiomatic] (Ez bê nivêj im. *I have my period. (I am without prayers.)*)

permissible hêlal (Goştê mirîşkê hêlal e. *Chicken meat is permissible [to eat].*)

permission (1) destîr (m) (Destîrî bide min; ez dê çim. *Give me permission; I'm leaving.*)
 (2) destur (m)
 (3) roxset (f) (Roxsetê bide min; ezê telefonê kim. *Give me permission; I'm phoning / I'd like to telephone [someone], please.*)

persecute (v) tepeser kirin, tepeser bike (Sadamî Kurd tepeser kirin. *Saddam persecuted the Kurds.*)

persecuted (tepeser *one persecuted*)

persecution tepeserî (f) (Tepeserîa Kurda gelek bîn. *The persecution of the Kurds was great.*)

person (1) miruv (m/f)
 (2) mirov (m/f) (Ev mirove baş e. *This person is nice.*)

perspective reî (f) (Min reîa xwe bedil kir. *I changed my mind.*)

pet ne kîvî (Pişikê min ne kîvî ne. *My cats aren't wild.*)

pet (vt) destê xwe pê da înan, destê xwe pê da bîne (Destê xwe bi pişikê da bîne. *Pet the cat.*)

pet food xwarina hêywana

Peter Petrus

petite hîr (Senar hîr e! Kulilk jî gelek hîr e. *Senar is very small. Kulilk is also very petite.*)

Phaniel Fenuêl

Pharisee Ferisî (m)

pharmacy (1) seydelî (f) (Ar) (Emê çin seydelîê. *We're going to the pharmacy.*)
 (2) dermanxane

Pharoah Fir'ewn (Ar)

phone book delîlê telefon

photocopy (v) tebe' kirin, tebe' k(bi)ke [photocopy] (Van tebe' ke. *Print these.*)

photograph risim (m) (Bila ez risimê te bistînim? *May I take your picture/photo?*)

photographer misawir

physics fîzîa (f)

piano pîanu (f) (Pîanu lê bide. *Play the piano.*) (Deyka min pîanuê lê dit. *My mother plays the piano.*)

pick (v) (1) çinîn, biçîne [vegetables, fruit] (Min sêv çinîn. *I picked the apples.*)
 (2) jî darê kirin, jî darê bike (Hirmîkê jî darê bike. *Pick the pear [off the tree].*)

pick up (v) (1) rakirin, rake (Qelemî rake. *Pick up the pen.*) ([Telefonê] rake. *Pick up [answer] the phone.*) (Kesê telefon ne rakir. *No one picked up [answered] the phone.*)
 (2) lêk dan, lêk bide [organize] (Mala xwe lêk de. *Pick up your house.*)
 (3) birin, bibe [transport] (Zehmet ne bit tu dê şêî min gel xwe bibî? *May I go with you (in your car), please? / Can you pick me up?*)
 (4) gehandin, bigehîne [transport] (Tu dê şêî min bigehîni? *Can you pick me up (in your car)?*)

pickle (1) tîrrî (f) [yellow pickles]
 (2) mexecele (f) [red pickles: radishes, cabbage, beets]

picnic (1) seyran (f)

picture (1) risim (m) (Bila ez risimê te bistîni? *May I take your picture/photo?*)
 (2) şikil (m) (Bila ez şikilê te bikêşim? *May I take your picture?*)

piece (1) parçe (f) (Kurdistan parçe parçe kirin nav çar welata da. *Kurdistan is divided between four countries.*)
 (2) qet (f) (Eve qeta te ye. *This is your piece.*) (qetek ji vê kêkê *a piece of this cake*)
 (3) falik (f) [small] (Eve falika te ya kêkê. *Kêka xwe bike falik falik. This is your piece of cake. Divide it into small pieces.*)

pig (1) beraz (m) (Goştê berazî hêram e. *Pork [pig meat] is taboo.*)
 (2) xenzîr (m) (Ar)

pilgrim (Muslim who has gone to Mecca) hêcî (m/f) (Ar)

pilgrimage hêc (f) (Ar) (Ev sale ez dê çime hêcê. *I'm going on the pilgrimage this year.*)

pill hâbik (m) (Min hâbika ser êşê xwar. *I took a pill for my headache.*)

pillow (1) balîfk (f) [bed pillow] (Balîfka wê ne xweş e. *Her pillow is uncomfortable.*)
 (2) kuş [couch pillow]

pillow case rîê balîfkê (m) (Rîêt balîfkê xwe bişo. *Wash your pillowcases.*)

pimple perzik (Perzik li ser u çavêt min tên. *I have pimples on my face.*)

pin (1) dembusk (f) (Min dembusk êxiste kirasê xwe. *I put a pin in my dress [to hold it together].*)
 (2) sinceq (f) [for a scarf] (Min sinceq êxist dersuka xwe. *I put a pin in my scarf. / I pinned my scarf together.*)

pine needles qîrşîk

pineapple enenas

pink pîvazî (m)

pipe (for water or gas) burî (f)

pistachio fisteq

pistol (1) debance (f) (Leqmanî debance teqand. *Leqman shot the pistol.*)

(2) werrwere (Min fişek kirme di werrwera xwe da. *I put the bullet in my pistol.*)

pity [idiomatic] (dilê wîê sût bu wî *he took pity on him*)

pizza (1) pîze [American]
 (2) lehîmb'acîn [Kurdish] (Tu hês ji lehîmb'acîn dikî? *Do you like Kurdish pizza?*)

PKK Kurdish political party

place (1) cih (m) (Min cih bu kiça te nîne di timbêlê da. *I don't have a place [room] in my car for your daughter.*)
 (2) dir (f) (Em çûne direkê xweş. *We went to a wonderful place.*)
 (3) meydan (m) (Dê dawetê deynin li meydanekê mezin. *They'll have the wedding in a large open place.*)

placemat (1) xewlîka nav desta
 (2) xewlîka ser mêzê

plains (1) 'edre şov
 (2) 'edre rast

plane (1) teyare (f) (Ar) (Çend se'eta da ji Emrîke hêta Holende bi teyarê? *How many hours does it take to go by plane / to fly from America to Holland?*)
 (2) balefir (Balefirê Emrîka hatin ser Kurdistanê. *American planes came [flew] over Kurdistan.*)
 (3) firuk

plant (1) gul (f) [flower] (Ez hês ji gulê pîvazî dikim. *I like pink flowers.*)
 (2) keskatî (m) [general: grass, flowers, vegetables]
 (3) deramet (m) [vegetables]
 (4) rîzyank (name of a nice-smelling plant)

plant (v) çandin, biçîne (Min ev dare çand. *I planted this tree.*)

plastic neylon (Ev kîske neylon e. *This bag is plastic.*) (kažeza neylon *plastic wrap*)

plate (1) sênîk (f) (Sênîkê bu min bîne. *Bring me a plate.*)
 (2) lalîk (f) [said by villagers]

play (v) (1) yarî kirin, yarîa bike [a game] (Min divêt em yarîa bikîn gel êk. *I want us to play (a card game) together.*)
 (2) lê dan, lê bide [an instrument] (Pîanu lê ne de. *Don't play the piano.*)
 (3) bêsbal kirin, bêsbal bike [baseball, other sports] (Min divêt em bêsbal bikîn. *I want us to play baseball.*)

playdough teqinasîna'î (m) (Min ji teqinasîna'î hindek heywanê çêkirin. *I made some animals out of playdough.*)

playground (1) çul (m)
 (2) pleygrewnd

playing card wereqe (f)

plead (v) hîvî jê kirin, hîvî jê bike (Min hîvî ji Dilnazê kir min bibit dixurî. *I pleaded with Dilnaz to take me to the doctor.*)

pleasant (1) xweş (Evro dinya xweş e. *The weather is pleasant today.*)
(2) hestî sivik (Ew hestî sivik e. *She's a pleasant person.*)

please (1) bê zehmet
(2) zehmet ne bit

pleasure keyf (f) (Keyfa wî hat. *His pleasure came. / He's happy.*)
(2) [idiomatic] (bi keyfa te ye. *Do as you like.*)

plenty of gelek (Min gelek cilik hene. *I have plenty of clothes.*)

pliers pilês

plot of land (1) 'edir (f)
(2) 'erd (f)

plow (v) kêlan, bikêle (Cutîar 'erdê xwe dikêlit. *The farmer plows his land.*) (Min kêla. *I plowed it.*)

plum hîlik (f) (Bu min hîlikekê qet ke. *Cut a plum up for me.*)

plumber (Ew burîa çêdikit. *He does pipe work.*)

plunger pempa edebxanê

pneumonia (Singê wê kul e. *She has pneumonia.*)

pocket berîk (f) (Kurrkî di kilîla timbêla wî yê di berîka wî da. *The boy put his car key in his pocket.*)

pocket knife çequk (f) (Te çequk heye? *Do you have a pocket knife?*)

poem (1) huzan (f) (Wî huzanekê xweş got. *He said a nice poem.*)
(2) şî'er (f) (Ar)

poet (1) şa'er (m)
(2) huzanvan (m) (Huzanvanî got. *The poet said it.*)

point (in playing a game) nûqte (Te çend nûqte hene? *How many points do you have?*)

point (v) nîşan kirin, nîşan bike (Nîşan min bike. *Point to it for me.*)

point of view (see viewpoint)

poison derman (m) (dermanê mişkî *mouse poison*)

poisonous dijwar

police (1) polîs
(2) cenderme

police station merkezê şertê (m)

policeman (1) şerte (m) (şertê mirur *traffic policeman*)
(2) cenderme

polish (v) (1) paqij kirin, paqij bike [dust furniture]
(2) neynukêt xwe buyax kirin, neynukêt xwe buyaxê bike [do one's nails]

polite (1) bi edeb
(2) bi taze

political sîasî (Ev rojname sîasî ye. *This newspaper is political.*)

political party (1) partî (f) (Ez hês ji partî demokratî dikim. *I like the democrat party.*)
(2) hîzib (f)

politician sîasî (m)

politics sîaset (f) (Ez hês ji sîaset nakim. *I don't like politics.*)

pollution dîkêl (m)

pomegranate hinar (f) (Hinarê bu min hîr ke da ez bi kefçîkî bixwim. *Take the seeds out of the pomegranate so I can eat them with a spoon.*)

pond (1) kehnî(k)
(2) kanî(k) (f)

poor (1) feqîr (m/f)
(2) hejar (m/f) (Nanî belave ke li ser hejara. *Give the bread to the poor.*)

poor feqîr (Ew feqîr e. *He's poor.*)

poor (unfortunate) person who is unable to do things reben (m/f)

popcorn şamî(k) (pl) (genimê şamî *popcorn*) (Bu min şamîka çêke; ezê xwim. *Make some (pop)corn for me and I'll eat it.*)

pope popî

population xelik (m) (xelkê Virginia *the people of Virginia*)

porcupine jijî (m)

pork goştê barazî (Goştê barazî hêram e. *Pork is taboo.*)

positive (1) zaîd [math, blood]
(2) muceb [pole]

possible çêdibin (Li def Xwedê hemî tişt çêdibin. *With God all things are possible.*)

post office berîd (f) (Virrêke berîdê. *Send it [by] the post office.*)

postcard karte

postman sa'î berîd

pot qazan (f) (Min birinca xwe di qazana mezin da çêkirin. *I made my rice in a big pot.*)

pot holder berdesk

pot hole tese (Ev şarî'e hêmî tese ne. *This street has lots of pot holes.*)

potato pitat (f) (Min kotilkêt pitata çêkirin. *I made potato kotilk.*)

potato chips çips

pouch (of a kangaroo) berîk (f)

poultry goştê teyrî

pound pewnd
pour (v) riştin, birrêje (Avê birrêje. *Pour the water.*)
pouting (Lêvêt wî şurr in. *He's pouting.*)
powder putir
power (1) kehreb (f) (Kehreb çû. *The power went out.*)
 (2) şîan
practical ‘emelî
praise hemd (m) (Em hemdê bu Xwedê dikîn. *We're praising God.*)
praise (v) (1) kirin xêr, bike xêr (Wan bu wî kirin xêr. *They praised him.*)
 (2) di’ a kirin, di’ a bike [pray]
pray (v) (1) nivêj kirin, nivêjê bike [ritual prayers] (Deyka min çû nivêjê bikit. *My mother went to say her prayers.*)
 (2) di’ a kirin, di’ a bike (Wî di’ a ji Xwedê kir. *He prayed to God.*)
prayer (1) di’ a (f)
 (2) nivêj (f) [ritual] (Nivêja ‘îda feriq e ji nivêjê me yê her roj em dikîn. *The holiday prayer is different from the everyday prayer.*)
pray-er (person who prays) nivêjker (m/f) (Ez nivêjker im. *I'm a pray-er.*)
prayer beads destek tisbeha (f) (Min destek tisbeha bu deyka xwe kirî. *I did the prayer beads for my mother.*)
prayer rug şemilk (f) (şemilka nivêjê *prayer rug*)
predator bela (f) (Gurig bela pezî ye. *The wolf is the sheep's predator.*)
prefecture mihafeze (f) (Mihafeza Dihukê gelek mezin bî. *The prefecture of Dohuk was really big.*)
pregnancy test fehis (f) (Hadarê fehis çêkir. *Hadar did a pregnancy test.*)
pregnant (1) bi tişt (Ne bi tişt e. *She's not pregnant.*)
 (2) bi hial (Dilnaz bi hial e. *Dilnaz is pregnant.*)
 (3) bi hialekê (Ez bi hialekê me. *I'm pregnant.*) (Wextê deyka min bihialekê bî bi min ... *When my mother was pregnant with me ...*)
 (4) [idiomatic] (Min tişteke hey. *I'm pregnant.*)
 (5) [idiomatic] (Zikê min heft heyvî bî. *I was/am in my seventh month of pregnancy.*)
 (6) avis (f) [animals] (Pezê me aviz e. *My sheep is pregnant.*)
pregnant (v) (see get pregnant)
prepare (v) (1) çê bîn, çê be (Favîn çê bî? *Is lunch prepared [ready]?*)
 (2) amade kirin, amade bike (Min darsa xwe amade kir. *I prepared my lesson.*)
 (3) kar u barê xwe kirin, kar u barê xwe bike [oneself for something] (Min kar u barê xwe kir bu dawetê. *I prepared for the wedding.*)

preschool rewze
prescription (1) raçet (f) [for medicine] (Emê çin seydelîê raçeta te bîn da em dermana bu te bînîn. *We're going to the pharmacy to get your prescription.*) (Min telefuna dermanxanê kir da raçeta dermanê min serif kit. *I called the pharmacy for them to fill my prescription.*)
 (2) ‘edese (f) [for eyeglasses and contacts]
presence (1) hezîret (f) (di nav hezîreta Xwedê da *in the presence of God*) (Deyka min yê hezîreta Xwedê da. *My mother is in the presence of God.*) (Ew derket ji hezîreta Xwedê. *He went out from the presence of God.*)
 (2) [idiomatic] (Li pêş çavêt dujminê min *in the presence of my enemies*)
present (gift) (1) diarî (f)
 (2) hedîe (f)
 (3) xelat (m) (Te xelatê Hevalî bir? *Did you bring Heval's present?*)
present (v) (see be present)
president (1) reîs (m)
 (2) seruk (m) (Serukê me Mes’ûd Barzanî ye. *Our president is Me’sûd Barzanî.*)
pretend (v) (1) hecku (Hecku tu diçî Frensa. *Pretend you're going to France.*)
 (2) ji qestî (Ji qestî dixwit. *She's pretending to eat.*)
pretty (1) taze [things and babies] (Biluzê te taze ye. *Your sweater is pretty.*)
 (2) can [women and things] (Tu can î. *You're pretty.*)
preventative (e.g., birth control) mane’ (Ar) (Nîaz mane’î dikit. *Nîaz uses preventatives.*)
price (1) heq (m) (Heqê vî perdaî dullarek e. *The price of this glass is one dollar.*)
 (2) biha (m) (Çi bihaê wê gelek e. *This price is too much.*)
pride mezinatî (f) (Fatimaê mezinatî yê li nik heye. *Fatima has pride / is proud [in a bad way].*)
priest (1) qeşet (m)
 (2) qeş (m)
 (3) qeşayet (karê qeşayetê *serving as priest*)
prince emîr (m)
princess emîre (f)
principal (1) midîr (m)
 (2) midîra (f)
print (v) nivîsîn, binvîse [by hand with a pen or pencil]
 (2) tebe’ kirin, tebe’ k(bi)ke [photocopy] (Van tebe’ ke. *Print these.*)

prison (1) zîndan (f)
 (2) ħebis (f) (Kes bi keftit ħebisa Sedamî da. *Someone was put into Saddam's prison.*)

private şexsî

private school ehlî

prize (1) xelat (m) (Ew naciñ bî; xelat kir. *He won and got a prize.*)
 (2) [idiomatic] Sera çi? (*What are we playing / betting for? What will the prize be for the winner of this card game?*)

probably iħtîmal (İhtîmal ez bê m mala te. *I'll probably come to your house.*)

problem mişkîle (f) (Te mişkîlekê hey? Ne, min çi mişkîle nînin. *Do you have a problem? No, I don't have any problems.*)

procrastination te' xîrkî (Te divêt tu imtîhanê te' xîrkî? *Do you want procrastination/to procrastinate on your test?*)

produce (v) çêkirin, çêke

product (1) ber (m)
 (2) berhem (m)

proficient şehreza (Ez ne gelek şehreza li van rêka. *I don't know this road / way very well.*)

profit (1) feyde (bê feyde *without a profit*) (bi feyde *for a profit*)
 (2) ħak (m) (Min şul kir. Ĥakê min \$100. *I worked and made a profit of \$100.*)

program dewire (f) (Dewira min xweş bî? *Was my program nice?*)

program (broadcast) îza'ê (f)

progress pêşkeftin (f) (Milletê Kurd pê di vî pêşkeftinê ye. *The Kurds need progress.*)

progress (v) pêş keftin, pêş bikeve (Tu pêş dikevî bi zimanê Kurdî. *You are progressing in the Kurdish language.*)

promise (1) suz bit (Suz bit ez harî karîa te bikim. *I promise I will help you.*)
 (2) soz bit
 (3) we'd bit (Ar) (We'd bit ez dê bu te bînim. *Promise that I will see you.*)
 (4) tube bit [between people and God] (Tube bit ez êdî drewê bikim. *I promise to never lie.*)

prophecy pêxemberatî (f) (Pêxemberatîa Îbrahîmî got: Kesek dê êt, dê miruva xilas kit ji guneha. *The prophecy of Abraham said: Someone will come who will save people from sin.*)

prophecy (v) pêxemberatî kirin, pêxemberatî bike (Bi navê te pêxemberatî dikir. *We prophesied in your name.*)

prophet (1) pêxember (m) (Musa pêxember bî. *Moses was a prophet.*)
 (2) pêximber (m)

propose marriage (v) xastin, bixaze (Kê tu xastî? *Who asked you to marry him?*) (Te kî bi xwe xasti ye? *Who have you asked to marry you?*) (Kurrkekê ez xastim da ez şî pê bikim. *A boy asked me to marry him.*)

proud (1) difin bilind (Şengê difin bilind e. / Difna Şengê bilind e. *Şengê is proud.*)
 (2) (*see also be proud and pride*)

proverb (1) gutinêt mezin
 (2) serhatî
 (3) qesêt mezin
 (4) ħikme

province miħafeze (f) (Miħafeza Dihukê mezin e. *The province of Dohuk is big.*)

prune ħilîka ħişik

public 'am

public school ħikumî

PUK (Kurdish political party) yêketî (Yêketî u demokratî pêk hatin. *PUK and PDK came together / made an agreement.*)

pull (something) out (v) înan derê, bîne derê (Evro dikturî didanê min îna derê. *Today the doctor pulled out my tooth.*)

pull (v) kêşan, bikêşe (Min werîs kêşa. *I pulled the rope.*)

pull out / up (v) (1) hilkêşan, hilkêşe (Mîa wê hilkêşit. *Her hair was pulled out.*)
 (2) kum kirin, kum bike (Zîwanê kum bike! *Pull out the weeds!*)

pump pemp (f)

pumpkin kolindê zer (Min kolindê zer kir di nav nîskê da. *I made a dish of pumpkin and lentils.*)

punch şerbet (f)

punish (v) (1) ciza kirin, ciza bike (Min Hana ciza kir. *I punished Hana.*)
 (2) ceza kirin, ceza bike

punishment (1) cizakirin (f)
 (2) ciza (f) (Cizae wê gelek e. *Her punishment is a lot.*)

puppy têşik (m/f) (têşkê seî (m) *puppy / baby dog*)

pure (1) zelal [for things] (Ava kehnîe zelal e. *Spring water is pure.*)
 (2) dil ... paqij [for people] (Dilê wê paqij e. *She has a pure heart.*)
 (3) fesîh [e.g., a language without foreign words]

purity exlaq (m) (Exlaqê Dilnazê delal e. *Dilnaz's purity is beautiful.*)

purple (1) xemir (m) [dark]
 (2) adarî (m) [light] (adarîê vekirî *very light purple*)

purse çente (m) (Çentê min hat dizînê. Êkê ji min bir. *My purse was stolen. Someone took it from me.*)

pus edab (Kulka çîçkê min edab jê têt. *My breast lump is oozing pus (infection).*)

push (v) (1) dehf dan, dehf de (Kursîka xwe dehf de. *Push your chair.*)
 (Te ez dehf dam. *You pushed me.*)
 (2) havêtin, bihavêje [to make someone/thing fall] (Pişîka min qelemê min havêt. *My cat pushed my pen [so that it fell.]*)
 (3) da dan, da bide (Ez te da dim? *Shall I push you [on the swing]?*)
 (4) ??, bidewsîne (Dugimê bidewsîne. *Push the button.*)
 (5) lê dan, lê bide (Tila xwe lê bide. *Push it [the elevator button].*) (Tila xwe li reqema êk bide. *Push number one [on the phone].*)

put (v) (1) deynan, deyne (Deyne cihê wê. *Put it [the shirt] in its place [in the closet / drawer, where it belongs].*) (Qelemê xwe deyne cihê wî. *Put your pencil away.*) (Min qelemê xwe deyna ser mêzê. *I put my pen on the table.*)
 (2) kirin, bike

put a cast on a broken bone (v) cipis kirin, cipis bike (Ew dê cipis kit. *He will put a cast on [the broken leg].*)

put an X in a box [e.g., on an application] (v) fî kirin, fî ke

put away (v) (1) lêk dan, lêk bide
 (2) rakirin, rake
 (3) deynan cihê wî / wê, deyne cihê wî / wê (Qelemê xwe deyne cihê wî. *Put your pencil away.*)

put down (v) deynan, deyne

put in (v) (1) êxistên, bêxî (Min patrî êxistê. *I put the battery in [the fire alarm].*)
 (2) duwam kirin, duwam bike (Wê sefa êkê duwam kir ji ber ‘emirê wê yê sefa êkê bî. *She was put into the first grade because that her age was the first grade age.*)
 (3) kirin di ... da, bike di ... da (Bike tê da. *Put it in [the bag].*) (Şerbetê bike di selacê da. *Put it in the refrigerator.*)

put into practice (v) kar pê kirin, karî pê bike (Karî pê bike da tu fêr bî. *Put it into practice so you learn it well.*)

put on (v) (1) lê dan, lê bide
 (2) kirin ber xwe, bike ber xwe (Biluzê bike ber xwe. *Put on the sweater.*)
 (3) xwe dan, xwe bide (Duhinî tavê xwe bide da tav leşê wê ne sojît. *Put on sunscreen so your body doesn't burn.*)
 (4) kirin, bike (Pêlavêt xwe bike pê xwe. *Put your shoes on [your feet].*)

put to bed (v) nivandin, binvîne (Min nivand. *I put her to bed.*)

put to sleep (v) nivandin, binvîne (Min nivand. *I put her to sleep.*)

put together (v) (1) kum kirin, kum bike (L’abika kum bike. *Put the toys together.*)
 (2) êxistin di nav da, bêxe di nav da
 (3) kirin di nav da, bike di nav da (Serkê qelemê xwe bike di nav da. *Put the caps (?) on the pens.*)

put under water and bring up (v) jar av kirin, jar av bike (Min cilik jar av kirin. *I put the clothes underwater and brought them back up. / I rinsed the clothes [in deep water].*)

q

quart çarêk gelen

quarter (1) çarêkek [one-fourth]
 (2) kwarter (f) [25 cents] (Kwarterekê bide min. *Give me a quarter.*)

queen (1) melîka (f) [monarch]
 (2) keçik [playing card]

question pişîar (f) (Ez tê nagehim pişîara te. *I don't understand your question.*)

[question particle] (1) ka
 (2) pa
 (3) ma

quickly (1) zî (Zî were da biçîn mektebê. *Come quickly so we can go to school.*)
 (2) zîka (Zîka were. *Come quickly.*) (Zîka da bigehîn mektebê. *Come (very) quickly so we can get to the school.*) (Ez esmanê Kurdî zîka ‘elimîm. *I learned Kurdish quickly.*)
 (3) hêl (Hêl biçîn! *Let's go quickly!*) (Hêl were! *Come here quickly!*)
 (4) bi lez (Bi lez biçîn! *Let's go!*)
 (5) lez (Lezê bike da biçîn mektebê! *Do it quickly so we can go to school!*) (bi lez u bez *quickly and frantically*) (Min bi lez u bez xwe lêk da çinko dreng bî. *I got ready quickly because it was late.*)

quiet (1) rehet (Rehet be! *Be quiet!*)
 (2) tena (avêt tena *quiet waters*)
 (3) (*see also* be quiet)

quilt (1) cudelîa ser textî [thin]
 (2) ferîşa ser textî [thin]
 (3) futka ser textî [medium]
 (4) lifêfka ser textî [thick]

Quirinius Krînûs

quit (v) betal kirin, betal bike (Min [şulê xwe] betal kir. *I quit [my job].*)

r

rabbi (1) mi'elim (m)
 (2) mamosta
rabbit kêvrîşk (f) (Kêvrîşk xwe dihilavêt / dihilavêjit. *The rabbit hops.*)
Rachel Rañêl
racial discrimination feriq u cidahîe nav miruva (Ez ne gel wan im ewêt feriq u cidahîe nav miruva dîkin. *I'm against racial discrimination.*)
radio radiu (f)
radish (1) tevir (m) (Tevira spî ke. *Peel the radishes.*)
 (2) şêlim (f) [large white]
raft kelek (f) (Kelek çû hêdî hêdî heta çû ber lêva avê. *The raft slowly went to the edge of the water.*)
rag patê paqîjkirîne
rain baran (f)
rain (v) (1) baran hatin, baran bê (were) (Baran hat. *It rained.*)
 (2) barîn, bibare (Evroke baran dibarît. *It's raining today.*)
rainbow (1) qews u qîzeñî (f) (Ar)
 (2) keskî sorrî alaî (Keskî sorrî alaî derket li esmana. *The rainbow came out.*)
raincoat (1) qapîte barane
 (2) qapîte mişema
raise (v) (1) xudan kirin, xudan bike [animals, children] (Nazdar kiça xwe xudan dîkit. *Nazdar is raising her daughter.*)
 (2) rakirin, rake (Destê xwe rake. *Raise your hand.*)
 (3) (see also increase)
raisin mêwîj (f) (Te mêwîj hene? *Do you have any raisins?*)
Ramadan Remezan (f) (Kengî Remezan e? *When is Ramadan?*)
Ramah Rame
ranch guv (f)
rancher şivanê çêla
rank sef (f)
rash (1) nîşan (f) [the red marks]
 (2) hêsaşî [the sickness]
raspberry tîet sorr
rat cirid (f)
raven qirr (f)
raw (1) ter [vegetables]
 (2) ne çêkirî [meat]
 (3) xaf [grains] (birincê xaf *uncooked rice*)

razor (blade) gîzan (f) (Min gîzan divêt. *I want a razor.*)
react (v) pê hêsîn, pê hêse (Dê çi pê hêsî heker ew mir? *How will you react if he dies?*) (Wextê dinya sarr, ez pê dihesim ezê recifim. *When it's cold (my reaction is) I shiver.*)
reaction pêhêsîn (f) (Pêhêsîna wî ez mifaci' kirim. *His reaction surprised me.*)
read (v) xwandin, bixwîne (Min xwand. *I read [it].*)
ready hâzir (Ez hâzir im bu dersê. *I'm ready for the lesson.*)
ready (v) (see be ready)
real estate salesman delal (m) (Ez çûm nik delalî da xanîek bi dest min bikevit. *I went to a real estate salesman to get a house.*)
realtor delal (m) (Ez çûm nik delalî da xanîek bi dest min bikevit. *I went to a realtor to get a house.*)
rearrange (v) (1) cihêt wana guharrtin, cihêt wana biguhurre
 (2) lêk dan, lêk bide (Min serdava xwe lêk da. *I rearranged [the furniture in] my basement.*)
reason sebeb (m) (Sebeb çi ye evroke tu drengî hatî? *What is the reason you came late today?*)
rebel (v) dîrketin, dîrkeve (Heker tu ji Xwedê dîrketî ... *If you rebel against God ...*)
receipt rîsît
receive (v) wergirtin, wergire (Min şîmkêt taze wergirtin. *I received some pretty dress sandals.*)
recently [idiomatic] (Eve ji berî heyvekê ez ne çûme wêrê. *I haven't gone over there recently / in a month.*)
receptionist isti'elamat
recipe [idiomatic] (Te çawa çêkir? *How did you make this?*)
recline (v) pal dan, pal bide
recognize (v) (1) nas kirin, nas bike (Min ne nas kir. *I didn't recognize him.*)
 (2) nîasîn, nîase (Ez dê çawa te nîasim? *How will I recognize you?*)
rectangle mistetîl (Ar) (f)
rectangular mistetîl (Ar)
red sorr (m) (Eve çi reng e? *Sorr e. What color is this? It's red.*)
redemption qurtalkirin (f)
reflexion risim (m)
[reflexive pronoun (my, your, etc.)] (1) xwe (Ez çûm mala xwe. *I went to my house.*)
 (2) xwi
refreshed mirtahî

refrigerator selace (f) (Selaca min şul nakit. *My refrigerator isn't working.*)

refugee (1) muhacir (m/f) (Ez muhacira şiasî me li Emrîka dijîm. *I'm a political refugee living in America.*)
 (2) insanî (m/f) [less status and rights than *muhacir*]
 (3) muşextî (m/f) [asylee, political refugee]

region (city) (1) menteqe (f) (Hevala te li kîş menteqe ye? *Yê li Springfield. Which city is your friend from? From Springfield.*)
 (2) mifireq (f) (Meqerê peşmerge li mifireqa Maltaê. *The peshmerge fort is in the region of Malta [and looks out for it].*)

regret (v) pêşeman bîn, pêşeman be (Ez pêşeman bîm min welatê xwe hêla. *I regret that I left my home country.*)

regulation destur (f) (destura Emrîka American law / regulation)

rejoice (v) dil xweş bîn, dil xweş bibe (Em dil xweş bîn li Newrozê. *We rejoiced at Newroz.*)

relationship (1) hevalanetî (f) (Hevalanetîa min u Nazdarê li gel êk u dû xweş e. *My relationship with Nazdar is great.*)
 (2) têkilî (f) (Min têkilî li gel Rêsanê hey. *I have a relationship with Rêsan.*)
 (3) ‘îlaqet (f) (Ar) (‘Îlaqeta min li gel hevala min xweş e. *My relationship with my friend is good.*)

relative (1) mirov (m/f) (Ew mirovê me ye. *He's our relative.*)
 (2) miruv (m/f)
 (3) xizim (m/f)

relax (v) rehetîa xwe wergirtin, rehetîa xwe wergire

relaxed (1) rehet
 (2) mirtaî

release (v) ber dan, ber (bi)de (Min teyrê xwe ber da. *I let my bird go.*)

reliable mezbît (Fatima mezbît e. *Fatima is reliable.*)

relief organization mineðeme (f) (Ar) (Tu li kîş mineðemê bî? *Which relief organization did you work for?*)

relieved rehet

religion dîn (m) (Dînê te çi ye? *What is your religion?*)

religious leader (1) şêx (m) [Islamic or Yezidi religion]
 (2) îmam (m) [Islamic; leader in the mosque]

remain (v) (1) man, bimîne
 (2) rawestan, raweste (Buçî hîn serê rojê li vêrê dirawestin bê kar? *Why have you been remaining here all day long doing nothing?*)

remarry (v) jinek dî înan, jinek dî bîne [for men]

remember (v) bîr [idiomatic] (Bîne bîra xwe ...! *Remember when ...!*)
 (Hat bîra min. *I remembered.*) (Bîra te bêt. *You'll remember.*)

(Bîne bîra xwe wextê em çûn ser behrê? *Do you remember when we went to the ocean?*) (Bila li bîra te bit. *You'll remember...*)

renewal nîjên kirin (f)

rent (1) kirê (f) (Ev xanî bi kirê ye? *Is this house for rent?*) (Kirêa vî xanî çend e? *How much is the rent for this house?*)
 (2) îcar (f) (Ar)

rent (v) dan bi kirê, bide bi kirê (Ez şîqa xwe didim bi kirê. *I rent my apartment.*)

renter kirêdar

repair (v) (see fix)

repair person karker

repeat (v) (1) dubare kirin, dubare bike (Dubare ke. *Ezê tê gehim. Repeat it; then I'll understand.*) (Ew her tiştê bê raman dubare dikit. *She repeats everything without thinking / babbles.*)
 (2) î'ade kirin, î'ade bike (Ar)

repent (v) (1) tube kirin, tube bike (Ez dê tube kim. *I'll repent.*)
 (2) peşêman bîn, peşêman bibe (Bi peşêmanî nebît. *He does not need to repent.*)

repentance tube (f) (Tuba wî ne dirist e. *His repentance isn't real.*)

replace (v) (1) guhartin, biguhurre
 (2) bedil kirin, bedil (bi)ke (Ar)

reply (v) (1) cab dan, cab bide
 (2) bersiv dan, bersiv bide

reporter (1) rapor
 (2) zelamê programê dibêjît

reproach (v) gazinde ... kirin, gazinde ... bike (Gazinda jê bike. *Show him where he is at fault.*) (Min gazinda te kir. *Buçî tu naçî nik me? I reproached you. Why don't you come visit us?*)

reptiles (1) zewaîf
 (2) heywanê edrî ve çin

request (v) daxwaz kirin, daxwaz bike (Tu çawa ji min daxwaz dikî avê bideme te? *How is it that you request water from me?*)

rescue (v) qurtal kirin, qurtal bike (Min qurtal kir ji mirinê. *I rescued her from death.*)

resentment kerib u kîn (Bes kerib u kînê li gel cîranê xwe bike. *Enough resentment toward your neighbor. Let it go!*)

respect qedir (m)

respect (v) qedir girtin, qedir bigire (Gelek qedirê wê bigire. *Show her a lot of respect.*) (Malêt Kurda gelek qedirê min digirin. *The Kurdish families respect me a lot.*)

responsibility bar (m) (Barê Nazdarê giran e. *Nazdar's responsibilities are difficult.*)

responsible (1) baş (Ev mirove baş e. *This person is responsible.*)
 (2) rêka xwe da (Ev mirov e rêka xwe da ye. *This person is responsible.*)

rest bêhin vedan (m) (Hîn dê bu derunêt xwe bêhin vedanê bînin. *You will find rest for your souls.*)

rest (v) bêhina xwe vekirin, bêhina xwe veke

restaurant (1) met'em (f) (Ar) (Em çûin met'emê. *We went to the restaurant.*)
 (2) xaringeh (f)
 (3) lûqinte (f)

rested (from enough sleep) têr (Binve heta tu têr bî ji xewa. *Sleep until you're well rested / not tired or sleepy any longer.*)

restful rehet

result netîca (f) (Evro min netîca imtîhîna xwe stand. *Today I got the result of my [academic] test.*)

resurrect (v) sax kirin, sax bike (Xwedê 'Îsa ji mirnê sax kir. *God resurrected Jesus from death.*)

retirement center mala pîra

return (v) (1) vegerîn, vegere (Heyva êk ez dê vegerim ji Texas. *I'll return (to Virginia) from Texas in January.*)
 (2) zivirîn (ve), bizivirre (ve) (Bizivirre ve ji mala Leymînê. *Return to Leymin's house.*)
 (3) (see also exchange)

review (v) xwandin ve, bixwîne ve (Vê dersê bixwîne ve. *Read / review this lesson again.*)

revise (v) dirist kirin, dirist bike (Ezê kitêbekê dirist kim. *I'm revising a book.*)

revolver (1) debance (f) (Leqmanî debance teqand. *Leqman shot the revolver.*)
 (2) werrwere

reward xelat (m) (Xelatekê bide wê. *Give her a reward.*)

reward (v) xelat kirin, xelat bike (Ew dê wê xelat kit. *He will reward her.*)

rib parasî (f) (Parasîa Leymînê şikest. *Leymin's rib is broken.*) (Parasîa wê derizî wextê timbela wê di'emî. *Her rib cracked when her car crashed.*)

rice (1) birinc (f) [cooked] (Min birinc u metfînê çêkirî. *I made rice and stew.*)
 (2) girar (f) [cooked]
 (3) birinc (m) [uncooked] (Bu min hindek birincî bikirre. *Buy me some rice.*)

rice with vegetables and meat perde pelav (f)

rich (people) zêngîn (Ew zelam zêngîn e. *That man is rich.*)

rich (places, things) dewlemend (Emrîke dewlemend e. *America is rich (a rich country).*)

riddle mamik (f) (Min mamkekê hey. *I have a riddle [to tell you].*)
 (Babê min gelek mamkê xweş bu me digotin. *My father told us a lot of great riddles.*)

ride (car, horse, boat) (v) (1) tê da bîn, tê da bibe (Kî tê da bî? *Who (rode with you)?*) (Çîmen tê da bî. *Çîmen [rode with me].*)
 (2) sîar bîn, sîar be (Ez sîar bîm [li hespî]. *I rode [the horse].*)
 (3) da dan, da bide (Min teyare da da. *I rode (in) the plane.*)
 (4) (see also drive)

rifle çifte (f) (Te çifte heye? *Do you have a rifle?*)

right (1) heq (m) (Hêqê Leqmanî namekê bu President Bush virrêkit. *Leqman has a right to send President Bush a note [about this issue...].*)
 (2) maf (Me çi maf nîne em kesê bikujîn. *We don't have the right to put anyone to death.*) (Ma min maf nîne ewê bikim ewa min divêt di malê xwi da? *Don't I have the right to do what I want with my own money?*)
 (3) rast (Eve ne rast e. *This isn't right.*)

right side (of fabric) rast (m)

right side up rast (Ew rast e. *It's right side up.*)

righteous (1) heqî
 (2) rast u dirist (miruvêt rast u dirist *righteous people*)
 (3) ser firaz (Ez ser firaz e. *He is righteous.*)

righteousness (1) çakî (f)
 (2) rastgu (f) (rastgua wî *his righteousness*)
 (3) rastî (m) (berê min didet rêkê rastîê *before me are paths of righteousness*)

ring gustîrk (f) (Gustîrka min zêrr e. *My ring is gold.*)

ringlets bisk [in front of a woman's ear]

rinse (in running or deep water) (v) (1) jar av kirin, jar av bike (Min cilik jar av kirin. *I rinsed the clothes.*) (Amanêt xwe jar av ke. *Rinse your dishes.*)
 (2) bi avê şîştin, bi avê bişo

ripe geheştî

rise (v) rabîn, rabe (Nanê min rabî. *My bread rose.*)

risk cir'ed (Min pêl cir'eda xwe kir ez çûm Kurdistanê. *I threw my risk out when I went to Kurdistan.*) (Min pêl cir'eda xwe kir u min timbêl hajot li ser "highway" u ez ne tirrsam. *I threw caution to the wind and drove the car on the highway; I wasn't afraid.*)

river (1) xabîr (m) (Xabîrê Mississippi *the Mississippi River*)
 (2) celala avê (celalê avê *small river / stream*)

river rapids ro

road (1) şari' (m) (Ar) (Şari'ê Pohikê *Pohick Rd.*) (Ev şari'e hemî tene. *This road has lots of pot holes.*)
 (2) (Rêka 495 gelek izdîham e. *I-495 is very busy.*)
roast (v) kirin di firnê da, bike di firnê da (Ez dê xwarina xwe kim di firnê da. *I will roast my food.*)
robe robe (m)
rock (huge rock smaller than foothills) kevir (m)
rocky berîn (Hindek kefte ser erdê berîn da. *Some fell on rocky ground.*)
rod (shepherd's) dar (m)
roll (v) (1) girêle bîn, girêle bibe [active voice] (Ez girêle bîm. *I rolled [down the hill].*)
 (2) girêle kirin, girêle ke [passive voice] (Min girêle kir. *I made [him] roll [down the hill].*) (Herre xwe girêle ke. *Go roll yourself [down the hill].*)
rollers (for hair) role
roof (1) ban (m) (Em li ser banî dinivîn. *We sleep on the roof.*)
 (2) kaşhanê banî
roofer (Ew ser banî çêdikit. *He constructs roofs.*)
room (1) mezel(ik) (f) (Herre mezelka xwe. *Go to your room.*) (Te çend mezel hene? *How many bedrooms do you have?*)
 (2) ode (f)
 (3) xorfe (f) (Ar)
 (4) cih (m) [a place] (Min cih bu kiça te nîne di timbêlê da. *I don't have room [a place] in my car for your daughter.*)
roost (v) lîsîn, bilîse (Mirîşka me lîsî li cihê xwe. *Our chicken roosted in her place.*)
rooster dîkil (m) (bangê dîkilî *rooster's sound*) (Dîkilî bang da. *The rooster crowed.*)
rooster's sound bang (m)
root (1) reh (f) (Ew bê reh bû. *It had no root.*)
 (2) binyat [idiomatic] (Ewî çî binyat nîne ... *He has no root [no relatives, no home ...].*)
root up (v) helkêşan, helkêşe (da ku genimî ne helkêşin *in order that the wheat won't be rooted up*)
rope werîs (m) (Destê wî bi werîsî girêdan. *They tied his hands with rope.*)
rotten (1) pîc (Ew xux yê pîc bîn. *Those peaches were rotten.*)
 (2) xirab
rouge buyaxa rîa
rough zivir (Çerimê minê zivir bî. *My skin was rough.*)
round (1) grrovir (Ev grrovir e. *This is round.*)
 (2) daîre (Ar)

round-trip (ticket) çûn u hatin
route rêk (f)
row rêz (m) (Çend li vê rêzê ne? *How many are in this row?*)
rub (v) gemirandin, bigemarinê (Destê xwe gemirand. *She rubbed her hands.*)
rubber neylun (lepikê neylun *rubber gloves*)
rubbing alcohol spîrtu (m) (Min destê xwe bi spîrtuê paqij kir. *I cleaned my hand with rubbing alcohol.*)
rug (1) mañfir (f) [rug which is placed on top of other rugs or wall-to-wall carpet]
 (2) barik (f)
 (3) (*see also* carpet)
ruin (v) xirab kirin, xirab bike (Wan rêka qîtarê xirab kir. *They ruined the train track.*)
rule (v) hîkmî kirin, hîkmî bike (Bush hîkmî li Emrîke dikit. *Bush rules America.*)
ruler mestere (f) (Te mestere heye? *Do you have a ruler?*)
run (v) kirin xar, bike xar (Ne ke xar. *Don't run.*) (Hêl bike xar! *Run fast!*)
run away (v) revîn, birreve (Em revîn çîa. *We ran away to the mountains.*)
runny nose [idiomatic] (Difna min têt xwarê. *I have a runny nose.*)
rusty jengar (Qazanê min jengar bî. *My pot was rusty.*)

S

sack (1) turr (f)
 (2) (*see also* bag)
sacred (1) pîroz
 (2) pîruz (Incîl pîruz e. *The Bible is sacred.*)
sacrifice qurban (m/f) (Qurbanekê bide. *Give a sacrifice [for him because he's sick].*)
sacrifice (v) (1) gurî kirin, gurî bike (Xwedê heywanekê gurî kir. *God sacrificed an animal.*)
 (2) qurban kirin, qurban bike (Wan qurbanek bu Xwedê ser jê kirin. *They sacrificed to God.*)
 (3) gurî bîn, gurî bibe (Ez gurî te bim. *I sacrifice for you. = I love you!* [*said by a mother to her children*])
sad (1) qehirî
 (2) melîl (Jiber babê Sîarî em melîl î. *We're sad because of Sîar's dad [who has cancer].*)

(3) bi xem (Ew bi xem çû. *He went away sad / with sadness.*)
 (4) dil ne xweş (Rêsan dil ne xweş e çinko xoşka wê mirî. *Rêsan is sad because her sister died.*)
 (5) (see also be sad)

Saddam Sedam
safe (1) emîn (Em emîn in. *We're safe.*)
 (2) ne xeter
safety silametî (f) (Polîs hatî ye medresê bu silametîa me. *The police has come to the school for our safety.*)
sake [idiomatic] (jiber navê xwe for [his] name's sake)
salad zilate (f) (Min zilata mastî çêkir. *I made yogurt salad.*)
sale (see marked down)
sale (price) erzanî (f) (Ev kirase min di erzanîê da kirrî. *I bought this dress on sale.*)
salesman (1) dikandar (m) [for clothes, furniture, vacuum cleaners; not for cars] (Babê Xiludê dikandar e. *Xilud's father is a salesman.*)
 (2) beqal (m) (Ar)
 (3) xudanê timbêla [for cars]
 (4) xudanê xanîa [for houses; a realtor]
salt (1) xwê (f) (Te xwê heye? *Do you have any salt?*)
 (2) xê (f)
salty (1) bi xwê (Xwarina min bi xwê ye. *My food is too salty.*)
 (2) sîr
salvation (1) xefirandin (f) (Ar)
 (2) lêburîn (f) (Lêburîna me ji 'Îsaî Mesîh e. *Our salvation is from Jesus Christ.*)
 (3) xilaskirin (f)
 (4) qurtalbûn (f)
Samaria Samîre
Samaritan Samirî (m/f)
same wek (Her dû wek êk in. *They're both the same.*)
sand xîz (m) (Biçîk çûne di nav xîzî da xanîk çêkirin. *The kids went in the sand to make a sand house.*)
sand dune zîrê xîzî
sandal (1) sendel [like American sandals]
 (2) şimik (f) [like flip flops] (Min şimkêt taze wergirtin. *I received some pretty dress sandals.*) (Deyka Leqmanî bu min şimkek îna. *Leqman's mother brought me some sandals.*)
sandwich (1) parîek (parîek goştî *meat sandwich*)
 (2) lefe (f) (Ar) (lefa penîrî *cheese sandwich*)
 (3) sendewîç (f) (Min bu xwe sendewîça hêka kirrî. *I bought an egg sandwich for myself.*)

sane bi 'aqil (Tu bi 'aqil î? *Are you sane? [asked when something hard to believe was said by a friend or spouse]*)
sanitary pad santî
sash şîtik (f) (Şîtika min qeta. *My sash tore.*)
Satan (1) Iblîs (m) (Iblîs xirab e. *Satan is evil.*)
 (2) Şeytan (m) [Kurds usually don't say this word]
satisfied (1) razî (Xwedê ji te razî bit. *God be satisfied with you.*) (Şîrîn ji min razî bî bu dersa Kurdî. *Şîrîn was satisfied with me for the Kurdish lesson.*) (Biçîk razî ne bîn bi hedîet min. *The kids aren't satisfied with the gifts I give them.*)
 (2) qane' (Ez qane' im bi şulê xwe. *I'm satisfied with my work.*)
 (3) têr [idiomatic] (Min têr xwar. *I ate until I was satisfied / no longer hungry.*) (Ez têr im. *I'm not hungry. / I'm full.*) (Binve heta tu têr bî ji xewa. *Sleep until you're well rested / not tired or sleepy any longer.*)
Saturday şembî (f) (şembîa çûî / hêftîa çûî şembîê *Sat. of last week*)
sauce (1) metfînî (f) (metfînîa fasolîa *white beans in tomato soup*)
 (2) afîk (f) [broth]
 (3) tehîn (f) [from sesame seeds] (Tehîn u duşav xweş e. *Tehîn and date syrup is delicious.*)
sauté (v) qelandin nav duhinî da, biqelîne nav duhinî da (Pîvazê biqelîne nav duhinî da. *Fry the onion.*)
save (v) (1) qurtal kirin, qurtal bike (Kî dişet qurtal bît? *Who can be saved?*)
 (2) xilas kirin, xilas bike (Min xilas ke! *Save me!*)
 (3) hilgirtin, hilgire (Tu çawa pare hildigirî? *How do you save money?*)
 (4) rakirin, rake (Min hindek parêt xwe yê rakirîn bu wextê mehtace ye. *I saved some money for emergencies.*)
saw mişar (f) (Te mişar heye? *Do you have a saw?*)
saw (v) mişar kirin, mişar bike (Pêpkê kursîka xwe mişar ke. *Saw your chair leg.*)
say (v) (1) gotin, bêje (Belê ez dibêjime hewe. *But I say to you...*) [idiomatic] (Ez dibêjim. *I think so.*) (see also believe [idiomatic])
 (2) gûtin, bêje (Min gût Rojî, "Bixwe." *I told Roj, "Eat."*)
 (3) (see also speak and word)
say good-bye (v) xatra xwe xastin, xatra xwe bixaze (Emê çin dû mala da xatra xwe bixazîn. *We'll go to two homes to say good-bye.*)
scandal hetik (f) (Monicê hetka Clintonî bir. *Monica and Clinton had a scandal.*)
scar nîşana birînê (Nîşana birînê li destê Şîrînê. *Şîrîn has a scar on her hand.*)
scared (1) kîvî
 (2) (see also fear)

scarf (1) lihafê (f) [decorative] (Ez lihafê dê êxim hefka xwe. *I'll take off the scarf from my neck.*)
 (2) dersuk (f) [hair covering] (Ez dersukê naêxim / nakim serê xwe. *I won't take the scarf off my head.*)
 (3) kefik (f) (Ar) [for hair]

scarf pin sinceq (f) (Min sinceq êxist dersuka xwe. *I put a pin in my scarf. / I pinned my scarf together.*)

scatter (v) belav kirin, belav bike (Biçîka tovê belav kirî li nîva malê. *The kids scattered the seeds in the house.*)

scent bêhin (f) (Çi bêhinek xweş e ava gula ye. *Perfume has a great scent.*) (Bêhina lewenta te xweş e. *The scent of your perfume is nice.*)

schedule ceduwel (f) (Ezê sehkim ceduwela xwe. *I'll look at my schedule.*)

scholar (see student)

school (1) medrese (f) (Ar) (Te çend sala li medresê xwandî ye? *How many years have you studied in school?*)
 (2) mektebe (f)
 (3) qota bi xane (f)

science (1) 'ilum (f) (Ar)
 (2) zanist

scientist (1) zanîarî (m)
 (2) zana (m)

scissors meqes

scorch (v) sutin, bisuje

scotch tape (1) lesqe (Min lesqeê hey. *I have some scotch tape.*) (Min lesqe lê daî bî. *I taped it.*)
 (2) tîp (Min tîp kir. *I taped it.*)

scratch (v) xurandin, bixurîne (Min destê xwe xurand. *I scratched my hand.*) (Ezê dixwûrînim. *I'm scratching.*)

screen şaşê (f)

screw birrîxî

screwdriver dernefîs

script (1) şêw (f) (Kurdî bi şêwê 'Erebî *Kurdish in the Arabic script*)
 (2) herif (f) [letters]
 (3) pît (Min pîtê Ingîlîzî xwandin. *I read the English letters.*)

scrub (v) paqij kirin, paqij bike

scrub brush firçe (f)

sea behir (f)

seafood goştê heywanê avê

seamstress diryarker (Ew cilka dirî. *She sews clothes.*)

search (v) lê gerran, lê bigerre (Min deftera xwe hinda kir. Ez dê lê gerrim. *I lost my notebook. I'll search for it.*)

season (time of year) (1) wexitê salê
 (2) demê salê (Ev demê salê xweş e. *This season is wonderful.*)

seat kursîk (f)

seatbelt qaîş (m) (Qaîşê xwe bigirêde. *Fasten your seatbelt.*)

second (1) sanîe (f) [time]
 (2) dûê [series] (bu cara dûê *for the second time*)

second child navî (Navîê Adarê kî ye? Heval e. *What's the name of Adar's second child? Heval.*)

secret (1) veşartî (Me dersa Kurdî veşartî dixwand. *We studied Kurdish lessons in secret.*) (Tiştêk veşartî minê hey. *I have a secret.*)
 (2) nepenî (bi nepenî *in secret*) (ewê dibînî nepenîa *who sees what is done in secret*)
 (3) di dilê (Tiştêk yê di dilê te da ye best tu ne şêî bêjî. *You have a secret but you can't tell it.*)

secretary sikirterî

security gate derrgeh (m)

see (v) (1) dîtin, bibîne (Te ez dîtîm? *Did you see me?*) (Evroke dinya mij e; ez taze nabînim. *It's foggy today; I can't see very well.*)
 (2) seh kirin, seh bike (Ez dê seh kimê. *I'll see.* Em dê seh kîne. *We'll see.*)
 (3) [idiomatic] (Ez hatim Holende ser xatra te. *I came to Holland to see you / because I miss you / because I like you.*)
 (4) (see also eyesight)

seed (1) tov (m) (li tov hebîn *seed-bearing*)
 (2) dêhindik (Em dêhindika dixwînim. *We're eating seeds.*)
 (3) dinik (dinkeka xerdelî *a mustard seed*)

seek (v) (1) xwastin, bixwaze (Aştîê bixwaze. *Seek peace.*)
 (2) lê gerran, lê bigerre (Min deftera xwe hinda kir. Ez dê lê gerrim. *I lost my notebook. I'll seek it.*)

seen (v) (see be seen)

selfish li ber xwe bi tinê (Ew li ber xwe bi tinê ye. *He is selfish.*)

sell (v) (1) firotin, bifiroşe (Min pezê xwe ne firotin. *I didn't sell my sheep.*)
 (2) firutin, bifiruşe

send (v) (1) hinartin, binhêre (Min mektuba xwe hinart. *I sent my letter.*)
 (2) virrêkirin, virrêke (Virrêke berîdê. *Send it [by] the postal system.*)
 (3) firêkirin, firêke (Wî firêkiri ne di nav rezî da. *He sent them to the vineyard.*)

(4) hinartin, henêre (Ez dê bu wî hinêrim. *I will sent him [the pictures].*)
 (Min hinart. *I sent [it].*)

senior citizen pîr
seniority mezinatî (f)
sense [idiomatic] (zivirîn bu deruna xwe *to come to one's senses*)
sensitive (1) hêsas (Rêsan gelek hêsas e. *Rêsan is very sensitive.*)
 (2) diluvan
 (3) hênun

sentence (1) cimil (f) (Ar) (Cimlekê bu min bêje. *Tell me a sentence.*)
 (2) rist (f) (Ristekê bu min bêje. *Tell me a sentence.*)

separate (v) (1) dîr kirin, dîr bike (Gunnêhêt me me ji Xwedê dîr dîkî.
Our sin separates us from God.)
 (2) cida kirin, cida (bi)ke (Kefçika ji çetala cida ke. *Separate the spoons from the forks.*)
 (3) jêk vekirin, jêk veke [physical]
 (4) ji ... dîar kirin, ji ... dîar ke [mental] (Peyvêt Kurdî ji peyvêt 'Erebî dîar bike. *Separate the Kurdish words from the Arabic words.*)

separated from jêk dîar (Nîsk u nuk jêk dîar in. *The lentils and chick peas are separated from each other.*)

separation cidabîn (f) (Cidabîna me u Fatimê gelek ne xweş bî. *Our separation from Fatima was awful.*)

September (1) Îlun (f)
 (2) heyva neh (f)

series (TV) miselsel (Ev miselsele li Misrê êkirîne. *This TV series is made in Egypt.*)

serious (1) cidî (Ar) (Min cidî got ... *I was serious when I said ...*)
 (2) ji dil (Ez ji dil hês ji wê dikim. *I seriously / really like her.*)

sermon (1) peyv (f) (Wî peyv xwand. *He read the sermon.*)
 (2) xudibe

servant (1) xulam (m) (Xulamê me çû bu me sîkê. *Our servant went to the market for us.*)
 (2) xudam (f) (Xudamê cilik şîştin. *The servant washed the clothes.*) (Ez xudama Xwedê me. *I'm the Lord's servant.*)
 (3) kuîl (m/f)

service xizmet (Xizmetekê bu min bike, Hana. *Do [a job / something / a chore] for me, Hana.*)

sesame seed kuncî (f/pl) (Teîîn ji kuncîê çê dibit. *Teîîn is made from sesame seeds.*)

sesame seed candy (1) sewkêt kuncîa
 (2) simsimî (Ar) (f)
 (3) kuncîluk (f)

set a trap with bait (v) telhe ve dan, telhê ve de (Min telhe ve da li ber kêvrîşkê. *I set a trap with bait [to catch] rabbits.*)

set fire (v) hil kirin, hil bike (Vî agirî hil bike. *Light this fire.*)

set free (v) ber dan, ber bide (Mi ji qefeskê teyr ber da. *I set the birds free from the cage.*)

set up (v) rakirin, rake (Kurrê Çîmenê dulaba min rakir. *Çîmen's son set up my china cabinet.*)

settle accounts / issues (v) hijmarê kirin, hijmarê bike (Paşatekîe vîa hijmarê di gel kuîlêt xwi biket. *A king wanted to settle accounts with his servants.*)

seven heft (f)
seventeen (1) hivde (f)
 (2) hevde (f)

seventy heftê (f)
several (1) çendek (Çendek hat bîn kumbîne. *Several [people] came together.*)
 (2) hindek (Hindek mirov li mala Leymînê bîn. *Several people were at Leymin's house.*) (Hindek şekirê bide min. *Give me several [cubes of] sugars.*)
 (3) [idiomatic] (her çar pênc roja *several days*)

severe dijwar

sew (v) (1) dirîn, bidrî (Min 'ezî dirî. *I sewed the dress.*)
 (2) diryar kirin, diryarê bike (Ezê diryarê dikim. *I'm sewing.*)

sewing diryar (f) (Ez gelek hês ji diryarê dikim. *I really like sewing.*)

sewing machine (1) mekîna diryarê (Te mekîna diryarê heye? *Do you have a sewing machine?*)
 (2) mekîna cilka dirî
 (3) mekîna xeyatîe (Ar)

sex (1) cinis (m) (zêlam *male*) (jin *female*)
 (2) (*see also* have sex)

shade sih (f) (Ezê li ber siha darê rîniştîm. *I've been sitting in the shade of the tree.*)

shadow sîtafk (Herre ji ber sîtafka min. *Go in front of my shadow.*) (f)

shake (v) (1) hejandin, bihejîne [someone] (Ezê te hejînim. *I'm going to shake you!*) (Destê min bihejîne. *Shake my hand.*)
 (2) hejan, biheje [earthquake] (Evro 'edir heja li Tirkîe. *There was an earthquake in Turkey today.*)
 (3) şilqandin, bişilqîne [something] (Min dermanê xwe şilqand. *I shook my medicine.*)
 (4) xwe ziha kirin, xwe ziha bike [water off] (Pişkê xwe ziha kir. *The cat shook the water off [her furr].*)

shallow qam (Av qam e. *The water is shallow.*)
shame ‘eyb (f) (‘Eyb e. *We ne ke! Shame on you! Don’t do that.*)
shameful ‘eyb (‘Eyb e, Roj! Rîne xwarê! *That’s shameful, Roj. Sit down.*)
shameless edepsis (Ev biçîke edepsis e. *This child is shameless.*)
shampoo şempu
shape şikil (m) (şiklê hêkê *the shape of an egg / oval*) (Şiklê wê çawa ne? *What does she/it look like? / What is her/its shape?*)
share behir (f) (Eve behira te ye. *This is your share.*) (behirek ji vê kêkê *a share of this cake*)
share (v) behir kirin, behir bike (Hana, kêka xwe li gel hevala xwe behir bike. *Hana, share your cake with your friend.*)
shark qirrş
sharp (spicey hot) dijwar (Filfil dijwar e. *The pepper is sharp.*)
sharpen (v) (1) mişar kirin, mişar bike (Kerika xwe mişar ke. *Sharpen your knife.*)
(2) tîj kirin, tîj bike (Vê kerkê tîj bike. *Sharpen this knife.*)
(3) lêk vekirin, lêk veke
shave (v) (1) teraşîn, biteraşê (Leqmanî rihêt xwe teraşîn. *Leqman shaved his beard off.*) (Dixturî zikê pişikê min teraşî. *The doctor shaved my cat’s stomach.*)
(2) gîzan kirin, gîzan bike (Zikê pişikê gîzan kir. *The cat’s stomach was shaved.*)
shaver (electric) mekîna riha
shaving cream me’cîna riha
she (1) ew [direct] (Ew çû. *She went.*) (Ew hat mala me. *She came to our house.*)
(2) wê [oblique] (Wê got. *She said it.*) (Wê kêk da min. *She gave me the cake.*)
shear (v) birrîn, bibirre (Pirrça xwe bibirre. *Shear your hair.*) (Min pîrtê pezê xwe birrî. *I sheared my sheep’s wool.*)
sheep pez (m) (Min dû pez hebîn. *I had two sheep.*)
sheep and goats terş
sheet (bed linen) çerçef (f) (Herre çerçefa xwe biguhurre. *Go change the sheet on [the bed].*)
shelf (in a cupboard) texçik (f)
shelter kuxik (f) (kuxkê peza *sheep pen*)
shepherd (1) şivan (m)
(2) gavan [one who stays at the farm and doesn’t go out with the sheep]
shine (v) runahî dan, runahî bide (Tavê runahîa xwe da mala me. *The sun shone on our house.*)

ship (1) gemî (f) (Gemîet leşkerê Emrîkî geheştin di befirê da. *The US Army ships reached the ocean.*)
(2) sefine (f) (Ar)
shirt (1) kumlek (m) (Kumlekê min sorr e. *My shirt is red.*)
(2) qemîs (m)
shiver (shake) (v) recifîn, birrecife (Ez ne sax im. Ez dirrecifim di taê da. *I’m sick. I’ve been shivering from fever.*)
shocked (1) ‘ecêb maî (Wextê 11.9 ew teqîne çê bî li New York. Em gelek qehirîn u ‘ecêb maî maîn. *When the explosion happened Sept. 11 in New York, we were very sad and shocked.*)
(2) ‘ecêb girtî
shoe (1) pêlav (f) (Pêlavê xwe bike pê xwe. *Put your shoes on [your feet].*)
(2) qondere (f)
(3) şimik [sandals, flip flops] (Şimkê xwe bide ser pêt xwe. *Put your sandals on your feet.*)
shoelace qeytan (f) (Qeytana pêlava xwe girê de. *Tie your shoelace.*)
shoot (v) (1) avêtin, bavêje [throw, e.g., an arrow] (Heker “Cupid” tîrêt xwe avêtin ... *If Cupid shot his arrows ...*)
(2) teqandin, biteqîne (Leqmanî debance teqand. *Leqman shot the pistol.*)
shop dikan (f) (Herre dikana Hevalî. *Go to Heval’s shop.*) (dikana ‘omlê / sarafî *money changer’s shop*) (dikana hêlaqî *barber shop*)
shopping basket selka sîkê
shopping cart ‘erebane (f)
shore lêv (f) (Ew li ser lêva derîaçê rînişt. *He saw by the shore of the lake.*)
short (1) kort [people, animals] (Pêt pişikê min kort in. *My cat’s legs are short.*) (Deyka min kort e; babê min drêj e. *My mother is short; my father is tall.*)
(2) nizim [things] (Banê me nizim e; dara he bilind e. *Our roof is short/low; the tree [out there] is tall.*)
(3) heyamek [time] (Eve heyameke min biraê xwe min ne dîte. *I haven’t seen my brother for a few days.*)
(4) piçîskek [time] (Ez dişêm (bes) piçîskekê rînim. *I can only stay/sit for a short time.*)
shortening (solid fat for cooking) duhin (m) (Piçek duhinî bike binê qazanê da u rijdêt xwe biqelîne. *Put some shortening in the pan and fry the tiny noodles.*)
short-tempered ‘esebî (Hêja miruvek ‘esebî ye. *Hêja is a short-tempered person.*)

shot (medical injection) (1) derzî (f) (Sisterê bu min derzî dana. *The nurse gave me an injection.*)
 (2) şirenqe (f) (Ar) (Min şirenqa telqîhî deyna de Hanaê da ew ne sax nabit. *I gave Hana an immunization shot so that she won't get sick.*)

should (1) lazim (Lazim e tu Inglîzî bi'elimî. *You should learn English.*)
 (2) mecbûr (Ez mecbûr im. *Yes, I should.*)

shoulder mil (m) (Milê xeşîa Dilnazê yê şikestî. *Dilnaz' mother-in-law's shoulder is broken.*) (Milê wê betal bî. *Her shoulder didn't work.*)

shout (v) (1) qêrrqêrr kirin, qêrrqêrr bike (Min u deyka xwe qêrrqêrr kir. Me Hana ji xew rakir. *My mother and I shouted at [fought] each other and woke Hana up.*)
 (2) qîjqîj kirin, qîjqîjê bike (Biçîk îna bes qîjqîjê bikin. *She brought the child but they shouted [fought].*)
 (3) hewar kirin, bike hewar (Min hewar kire Nazdarê ji derve. *I shouted for Nazdar outside [because she was lost].*)

show (v) nîşa ... dan, nîşa ... bide (Neqşî nîşa min bide. *Show me how to embroider.*) (Rêka mala wê nîşa min bide. *Show me the way to her house.*)

show respect (v) qedir girtin, qedir bigire (Gelek qedirê wê bigire. *Show her a lot of respect.*)

shower (room) (1) hêmam (f) (Ar) (Ezê li hêmamê me. *Ezê paqij dikim. I'm in the shower; I'm cleaning it.*)
 (2) serşu(k) (f) (Zavaê bibine serşuê ... *Bring the bridegroom to the shower room ... [part of a song]*)

shrill sounds made by women at a wedding tilîlîve (Hemî dawetê reqîsin bi tilîlîve. *Everyone danced at the wedding and made shrill sounds.*)

shuffle cards (v) (1) têk ve şeh kirin, têk ve şeh (bi)ke [Kurdish style]
 (2) şeh kirin, şeh (bi)ke [American style]

shy (1) kîvî
 (2) şerim
 (3) şermîn (Schnooki şermîn e. *Schnooki is shy.*)

sick (1) ne sax
 (2) tengav [sick and wanting to go to the bathroom]
 (3) terim [sick and almost dead]

sick days îcaze (f)

sick people êş (California êş zehîf in. *There are a lot of sick people in California.*)

sickness nesaxî (f) (nesaxîa dilê *heart disease* - Wê nesaxîa dilê da hey. *She has heart disease.*) (nesaxîa şekirê *diabetes*)

side (1) rex (f) (rexê dî *on the other side*)
 (2) tenişt (f) [side of the body]

side street kulan (f)

sideburns ziluf (f)

sift (v) moxel kirin, moxel bike (Ezê arî li moxelê dikim. *I'm sifting wheat.*)

sign (v) tewqî' kirin, tewqî' bike

sign (your) name (v) tewqî' kirin, tewqî' bike (Tewqî' xwe bike. *Sign your name.*)

signature (1) tewqî' (Ar) (Tewqî' xwe bike! *Write your signature!*)
 (2) îmza (f)

silent lal

silent (v) mit bîn, mit bibe (Demê ez mit bîim ... *When I kept silent...*)

silver (1) zîv (m)
 (2) şipe (m)

Simeon Şemxun

similar (1) wek êk
 (2) ştî êk

simmer (v) (1) kê m kirin, kê m (bi)ke (Agirê xwe kê m ke. *Turn down your fire.*)
 (2) kirin sernîvî, bike sernîvî (Agirî bike sernîvî. *Turn the fire down halfway.*)

simple (1) sanahî
 (2) sehil

simply kurt (bi kurtî bila ... *simply let ...*)

sin (1) guneh (f)
 (2) guneh (f)
 (3) hêram (f)

sing (v) stran gotin, stran bêje (Strana bu min bêje. *Sing for me.*)

singer (1) muşenî
 (2) stranbêj

single (1) ne şî kirî [women]
 (2) ne jin înaî [men]
 (3) zigurdî (m/f)

sink meşsel (f) (Meşwel xetimî. *The sink is stopped up.*)

sink (v) xeriqîn, bi xeriqe

sinner gunehkar (gunehkarek peşêmanêt *a sinner who repents*)

sir (1) ez benî [said by men to other men]
 (2) ez xudam [said by women to men]

sister (1) xoşk (f)
 (2) xîşk (f)
sister-in-law (1) diş (f) [sister of my spouse]
 (2) jinbira [wife of my brother]
 (3) jintî [wife of my husband's brother]
sit (v) rîniştin, rîne (Ez dişêm (bes) piçîskekê rînim. *I can only stay/sit for a short time.*)
sit down (v) rîniştin xwar, rîne xwar
situation ziruf (m) (Zirufî 'Îraqê ne xweş bî. *The situation in Iraq was awful.*)
six şeş (f)
sixteen şazde (f)
sixty şeşt (f)
size mezinatî (f)
ski hat kulav (m)
skin (1) tîvil (m) [fruits, vegetables]
 (2) kelpik (m) [fruits, vegetables] (kelpikê muzê *banana peel*)
 (3) çerim (m) [people, animals] (Çerimê minê zivir bî. *My skin was rough.*)
skirt tenure (m)
skull hestîê serî
sky 'esman (m)
slap (1) tep (f) [gentle] (Min tepek li Hanaê da. *I gave Hana a slap.*)
 (2) şeş (f) [very hard, on the face] (Şeqekê kiça xwe bide. *Give your daughter a slap.*)
slave (1) xulam (m)
 (2) xudam (f)
sleep xew (f) (xewek kîr u dîr *a deep sleep*) (Xewa min giran bî. *I slept soundly.*)
sleep (v) nivistin, binve (Deyka te nivistî ye? *Is your mother sleeping?*) (Binve heta tu têr î. *Sleep until you're not tired or sleepy any longer [said to a baby].*) (Ez nivistinekî kîr nivisti bîm. *I slept soundly / like a rock.*)
sleepy (1) [idiomatic] (Xewa wî têt. *He's sleepy.*)
 (2) bi xew (Ew bi xew e. *She's sleepy.*)
sleeve (1) hiçik (m)
 (2) hirçke
slice (v) qet kirin, qet (bi)ke (Herre gêzera qet ke. *Go slice the carrots.*)
sling (1) dersuk
 (2) pate
slip etek (m)

slipper ni'al (f)
slow (laid back) nerim
slowly (1) hêdî (Ez hêdî çûm da kes min ne bînit. *I went slowly so no one would see me.*)
 (2) hêdî hêdî (Hêdî hêdî em bigehîne sîkê. *Go slowly until we get to the market.*) (Hêdî hêdî were xwarê da çi lê ne êt. *Go slowly! and come here so that nothing happens to you [said to kids].*)
 (3) rehet (Rehet bi rê ve herre. *Walk slowly.*)
small biçîk
small talk (v) sihbet kirin, sihbet bike (Min u deyka xwe mi bu xwe sihbet kir. *My mother and I made small talk.*)
smart (1) çak
 (2) 'aqil [smart and well-behaved]
smell bêhin (f) (Bêhina gula xweş e. *The smell of the flowers is nice. / The flowers smell nice.*)
smell (v) (1) bêhin kirin, bêhin ke
 (2) seň kirin, seň bike (Ez bêhina mexelelê seň dikim. *I smell the pickles.*)
smile (v) (1) bişkurîn, bibişkure
 (2) kenîn, bikene (Bikene! *Smile! [said when taking a picture]*)
smoggy ne paqij
smoke (from a fire) dîkêl (m)
smoke (v) kêşan, bikêşe (Min cihare kêşa. *I smoked a cigarette.*)
smoke detector fîrfîrk (f) (fîrfîrka agirî *fire detector*)
smooth hîlî
snacks xwarinê sivik
snake mar (m)
snap (on clothing) digme
snatch away (v) dizîtoke (Ew dê dizîtoke. *He will snatch it away.*)
sneeze bêhinişk (f)
sneeze (v) bêhinişîn, bibêhinje (Ez dibêhinijim. *I'm sneezing.*)
snow befir (f)
snow (v) (1) befir hatin, befir bê (were) (Baran hat. *It snowed.*)
 (2) barîn, bibare (Evroke befir dibarit. *It's snowing today.*)
snowball tepka befirê (f)
snowman mêrkê befirê (m)
so (1) da
 (2) vêca (Vêca em biçîn da em drêngî negehîn. *So, let's go so we don't arrive late.*)
 (3) rabî(n) [in story-telling]
so far gavê
so that da ku

so too her wesa
So what? (1) Vêca çi ye? [informal]
 (2) Ma çi ye? [informal]
soap sabîn (f) (Destêt xwe bi sabînê bişo. *Wash your hands with soap.*)
soap opera hielqa
soccer qedem
sociology wetenî (f)
sock gure (f)
soda (soft drink) suda
sofa qenepe (f)
soft nerim
soft drink (soda) suda
soften (v) (*see* become soft)
soldier (1) ‘esker [in Saddam’s army, not in the Kurdish army]
 (2) askerbî [in Saddam’s army, not in the Kurdish army]
 (3) pêşmerge (m) [Kurdish guerilla; in the mountains]
 (4) cindî (Cindî yêt ‘Îraqê hatin ‘erdê Kurdistanê da. *Arab soldiers came to Kurdistan.*)
 (5) ceîş
 (6) serbaz (m)
 (7) leşker (m) [a troop] (Leşkerê Kurdî bi hêz e. *Kurdish soldiers are strong.*)
sole (1) binê pê [of the foot]
 (2) pehnîa pê [of the foot]
 (3) binê pêlavê [of the shoe]
Solomon Silêmanî
some (1) çend
 (2) çendek
 (3) hindek (Min hindek gilas hene. *I have some drinking glasses.*)
 (4) piçek (Min piçek şerbet heye. *I have some juice.*)
some filan (Filan şevê emê êin mala we. *Some evening [this week] we’ll come to your house*)
somebody kesek (Kesek pirsîara te dikit? *Has somebody asked you?*)
someone (1) êk (Êkê da min. *Someone gave it to me.*)
 (2) kes (Kes bi keftit hêbsa Sedamî da. *Someone was put into Saddam’s prison.*)
 (3) kesek (Kesek pirsîara te dikit? *Has someone asked you?*)
something (1) tiştêk
 (2) hindek tişt (m)
 (3) qese (Were, da ez bu te qesekê bêjim. *Come here so that I can tell you something.*)

(4) xizmet (Xizmetekê bu min bike, Hana. *Do [a job / something / a chore] for me, Hana.*)
 (5) [idiomatic] (Min şulekê te hey. *I want to talk to you about something.*)
sometimes (1) car (cara hey, cara nîne *sometimes on, sometimes off*)
 (2) hindek cara
 (3) hinde ca
 (4) (bê hinek *some time [minutes, hours]*)
son (1) kurr (m)
 (2) kurrik (m)
Son of Man Kurrê Miruvî
song stran (f)
son-in-law zava (m)
sore throat (*see* have pain)
sorrow (1) kerrib (f)
 (2) xem (f)
sort babet (f) (Wî li ser gelek babeta bi xûna bu wan axift. *He told them many sorts of parables.*)
sort of ye’nî
soul (1) derun (f)
 (2) derûn (f) (Derûna min tenadibît *He restores my soul.*)
 (3) nefes (Ar)
sound deng (m)
soup (1) metfînî (f) [tomato soup base with beans, squash, okra, meat, etc.]
 (2) şurbe (f) [rice, broth made without a tomato soup base]
sour tırış
sour cream qeymaş (f)
south (1) xuwaro (m)
 (2) cinub (Ar) (m)
sovereignty desthelatî (f)
sow (v) çandin, biçîne
sower tovçîn (m)
spade (playing card) maçe
spaghetti noodles spagetî
Spanish (language) Espanî
spank (v) (1) deynan, deyne (Min deyna Hanaê. *I spanked Hana.*)
 (2) qotan, biqote (Min Hana qota. *I spanked Hana.*)
speak (v) (1) axiftin, baxive
 (2) (*see also* tell and word)
speak about (v) beş kirin, beş bike (Min beşê Dilnazê kir. *I talked about Dilnaz.*)

special teybet(î) (xwarinek teybet *special food*)
special feature rawesta (f)
specialty exisaî (Tu exisaî î? *Are you a specialist (doctor)?*)
 (Tu biçî exisaî? *Will you specialize?*)
[specific reference marker] he (Ev qelemê he sorr e. *This [specific] pen (here) is red.*)
speck of dust zil (m)
speech peyv (f)
speech impediment (Ezmanê wî fis e. *He has a speech impediment.*)
spell (v) (1) tehecî kirin, tehecî bike (Ka bu min navê xwe tehecî ke. *Spell your name for me.*)
 (2) pît kirin, pît ke (Bu min navê xwe pît ke. *Spell your name for me.*)
spend money (v) pare serif kirin, pare serif bike (Tu çawa pare serif dikî? *How do you spend [your] money?*) (Min dihî pare serif kir. *I spent money yesterday.*)
spend time (v) burandin, biburîne
spices filfil u biharet
spider tevinpîrk
spill (v) riştin, birrêje (Çay rişt. *The tea spilled.*)
spin (wool) (v) teşî ristin, teşî birêse (Şulê wê teşî dirêsit. *She spins wool for her job.*)
spinach spênaġ (f)
spinal column (1) emud feqerî
 (2) hestîe piştê
spirit (1) rehî (m)
 (2) derûn (m)
 (3) riġ (f)
 (4) ruhî (f)
 (5) cin (m) [good or bad]
 (5) (*see also* neck (back of))
sponge (1) lîfik (m)
 (2) îsfenc
 (3) lîfkê îsfenc
sponsor (for refugees in America) kefil
spoon (1) kefçik (f)
 (2) hesik (m) [large one used for cooking for crowds]
sports (1) rîaze (f)
 (2) werzeşî
sports jacket (1) bedle (m)
 (2) qat (m)
spot (1) xal (f) [e.g., a stain on clothes]
 (2) nekte nekte [polka dots]

sprain (v) xelhan, bixelhe
sprained qolipî (Pê wê qolipî. *Her ankle is sprained.*)
spray (v) reşandin, reşîne (Dermanî breşînîn. *We'll spray the poison.*)
spread (v) (1) belav kirin, belav bike
 (2) şikandin, bişkêne [a pile of playing cards out]
spread out belav (Li Emrîka Kurd belav in. *The Kurds are spread out in America.*)
spring (season) (1) bihar (f) [season]
 (2) behar (f) [season]
 (3) kehnî (f) [water]
spring (water) kanî (f)
spring up (plants) (v) serkeftin, serkeve (Ew zî bi serkeft. *It sprang up quickly.*)
sprout (v) şîn bîn, şîn bibe (Genim / gul şîn bîn. *The grain / flowers sprouted.*)
spurting visik (viska xwîne *spurting blood*)
square (1) çar kujî
 (2) mirebe' (Ar) (f)
squash kolind (m)
squeegee masîhe (f)
squirrel sivure (m)
stable stebil (f) (stebila hespa *horse stable*)
stack (dishes) (v) (*see* turn over and stack)
staff (shepherd's) gupal (m)
stairs derince (f, pl)
stamp (postage) (1) pîl (Pîlekê li nama xwe bide. *Put a stamp on your envelope.*)
 (2) tabe' (Ar)
stand up (v) (1) rabîn, rabe
 (2) rabûn, rabe
 (3) rawestan, raweste (Buçî hîn serê rojê li vêrê dirawestin bê kar? *Why have you been standing here all day long doing nothing?*)
 (4) rabîn ji pê ve, rabe ji pê ve [on your feet]
stapler kabîse (f)
star (1) stêr (f)
 (2) stêrik (f)
start (v) (*see* begin)
state (1) bajêr (m)
 (2) bacêr (m)
 (3) miġafeze (f) (Miġafeza Dihukê gelek mezin bî. *The state of Dohuk was really big.*)

State Department wezareta ji der ve (Çîmen wezareta ji der ve şul dikit.
Çîmen is working for the State Department.)

statue of liberty timθalî azadî

statute (1) destur (f)
(2) qanûn (f)

stay man (f) (Dumahîka mana min ... *At the end of my stay ...*)

stay (v) (1) man, bimîne
(2) rîniştîm, rîne (Ez dişêmb bes piçîskekê rînim. *I can only stay for a short time.*)

steal (v) (1) dizîn, dize (Çentê min hat dizînê. *My purse was stolen.*)
(2) dizîtobe (Ew dê dizîtobit. *He will steal it.*)

stealing dizî (f) (dizîê ne ke *don't steal*)

steam (v) (see steamer)

steamer qazana sefuk (Min derametê xwe deland di qazana seful da. *I boiled my vegetable in a steamer.*)

stepbrother (1) kurrê zirbab
(2) kurrê jinbab (m)

stepfather zirbab (m)

stepmother jinbab (f)

steps derince

stepsister (1) kiça zirbab
(2) kiça jinbab (m)

stereo system sterîo

stern dijwar

stew (1) metfînî (f) [tomato soup base with beans, squash, okra, meat, etc.] (Min birinc u metfînîê çêkirî. *I made rice and stew.*)
(2) hîrkê kotilka (f) [yogurt or tomato soup with meat patties]

still tena (avêt tena *still waters*)

stir (v) têk ve dan, têk ve (bi)de

stocking hat kulav (m)

stomach (1) me'îde (m)
(2) 'îrik (Ez dê 'îrika çêkim. *I'll make stomach [for dinner].*)
(3) zik [idiomatic] (m) (Zikê min di'êşit. *My stomach hurts.*)

stomachache (see have pain)

stone (1) ber (m) (Her berek cihê xwe yê bi qedirê. *Every stone has its own place until it goes into the grave. "Every person wants to stay in his home sweet home until he dies."*)
(2) kevir (m) [huge]
(3) kuçik (m) [small]
(4) ke'be [black stone in Mecca]

stop (v) (1) sekinandin, sekinîne (Min seyare sekinand ber dergehî. *I stopped the car in front of the door.*)

(2) sekinîn, bisekine (Bisekine! Te xelet çêkir. *Stop! You made a mistake.*) (Seyare sekinî ber dergehî. *The car stopped in front of the door.*) (Baran sekinî. *The rain stopped.*)

(3) birrîn, bibirre

(4) rawestan, biraweste

stopped up xetimî (Meşwel xetimî. *The sink is stopped up.*)

storage area (1) mexzen (f)
(2) xezînk
(3) mezelka qîtî
(4) kewenter (f) [locker]

store dikan (f) (dikana cilka *clothes store*) (Herre dikana Hevalî. *Go to Heval's store.*)

store up (v) (1) kum kirin, kum bike
(2) kwar kirin, kwar bike??

storm babelîsk (f)

story (1) çîrok (f)
(2) serhatî (f) [true and short, happened a long time ago, used to teach a moral or lesson]
(3) tebeq (tebeqa sîê *third story / floor*) (Xanîê te çend tebeq e? *How many stories does your house have?*) (Tu li kîşk tebeqê? *Which story are you on?*)

stove tebaxe (f)

straight (1) serh [hair] (Pirrça wê serh e. *Her hair is straight.*)
(2) rast u rast [direction] (Herre rast u rast. *Go straight ahead.*)

strange 'ecêbî (Film 'ecêbî bî. *The film was strange.*)

stranger xerîb

strangle (v) (1) deshêfik nan, deshêfik bine
(2) fetisandin, fetisîne (Ez te fetisînim. *I'm strangling you.*) (Te ez fetisandim. *You strangled me.*)

straw (1) ka (f)
(2) qirrşik (f) [small pieces]

strawberry ferawle (f)

stream (1) cuk (f)
(2) şîvik
(3) celalê avê

street (1) şari' (m) (Şari'ê Pohikê *Pohick St.*) (Ev şari'e hîemî tese ne. *This street has lots of pot holes.*)
(2) kinîşt

strength (1) qowet
(2) taqet
(3) şîan
(4) hêz (f) (Hêza wî ne maî ye. *His strength is gone.*)

strep throat (1) (Binguhkê wê yêt kefîn. *She has strep throat.*)
 (2) (Hestîkê wê yêt kefîn. *She has strep throat.*)

stretch (v) (1) xwe vekêşan, xwe vekêşe (Ez xwe ve dikêşim. *I'm stretching.*)
 (2) drêj kirin, drêj bike [so as to relax] (Pêt xwe drêj bike. *Stretch out your legs.*)

stretchy metat (Kirasê min metat e. *My dress is stretchy.*)

string ta (m)

stripe xîç xîçî

stripped (stripped of his clothes *cil jê standin*)

stroller ‘erebane (f)

strong (1) bi qowet
 (2) bi hêz
 (3) qewî
 (4) zorr
 (5) qayim [things difficult to cut, tear, break]

stubborn mejî hîşik

student (1) qotabî (m/f) (Hana qotabî ye li sefa dûê. *Hana is a student in the second grade.*)
 (2) talib (m) (Ar)
 (3) talîbe (f) (Ar) (Ez talîbe me medresê. *I'm a student in school.*)

study (v) xwandin, bixwîne

stuffed vegetables (1) îprax (f) [specifically, stuffed grape leaves]
 (2) dolme (Ar) (f)

stupid mejî hîşik

subject (1) mewzu’ (m)
 (2) babet (f) (Mewzu’ê evro zimanê Inglîzî bî. *The subject for today was English.*)

subject to hejî

submissive mutî’ (Ar)

submit (v) pîa ... kirin, pîa ... bike (Roj pîa min ne kir. *Roj didn't submit to me.*) (Ez pîa wî dikim. *I submit to him.*)

substitute tişteke dî (Pêş wê ve Xwedê tişteke dî da wan. *Instead, God gave them a substitute.*)

substitute (v) bedil kirin, bedil (bi)ke

subtract (v) kêmkirin, kêmkir bike

subtraction kêmkirin (f)

subway mîtro

succeed (v) serkeftin, serkeve (Hana li medresê serkeft. *Hana succeeded in school.*)

successful naciî (Tu naciî î di jîana xwe da. *You're successful in your life.*) (Ez naciî ne bîm di imtîhanê da. *I wasn't successful in the test.*)

suddenly (1) ji nişke kê ve
 (2) helefe??

sue (you) (v) bibe (te) dadgehê

sufficient besî (... bes ne besî bî. ... *but it wasn't sufficient.*)

suffocate (v) (1) xeniqîn, bixeniqe
 (2) fetisandin, bifetise (Dê fetisit. *He'll suffocate.*)

sugar şekir (f) (Hindek mirov li mala Leymînê bîn. *Several people were at Leymin's house.*) (Hindek şekirê bide min. *Give me several [cubes of] sugars.*)

sugar bowl şekirdan (f)

suit (1) bedle (Ar) (m) [men's or women's]
 (2) qat (m) [men's]

suitable (1) minasib
 (2) (*see also* be suitable)

summary kortbîn (f) (u bu kortbîn ... *and in summary (after all has been said) ...*) (u kortbîna vê ... *the summary is ... (and then tell it)*)

summer havîn (f)

summon (v) gazî kirin, gazî bike [someone's name] (Gazî Îsaî kir u pisîar jê kir ... *He summoned Jesus and asked him ...*)

sun tav (f)

Sunday êkşemb (f)

sunglasses berçavk yê tavê

sunny tav (Dinya runahî ye u tav e. *The weather is bright and sunny.*)

sunrise spêde (f)

sunscreen (1) duhinê tavê (Duhinî tavê xwe bide da tav leşê wê ne sojît. *Put on sunscreen so your body doesn't burn.*)
 (2) rînê tavê

supervisor (1) midîr (m) (midîrê da'îrê *office supervisor*)
 (2) midîra (f)
 (3) karibedest (m/f)
 (4) mamusta (m/f)

supervisor of a flour mill aşivan (m)

supper (evening meal) şîv (f) (Te çi xwar evro şîvê? *What did you eat for dinner?*) (şîva dîmahîkê *the last supper*)

sure (1) [idiomatic] (Ew bi xwe nizanî, bes wî ji ne xwe got. *He's not sure but he thinks so [e.g., that it is cancer].*)

(2) şehreza (Ez ne gelek şehreza li van rêka. *I'm not very sure of this road / way very well.*)

surgery (1) 'emeliât (f) (Dixturî ez benc kirim ji berî 'emeliâtê. *The doctor gave me anesthesia before the surgery.*) (Gerdinê biçikê xwe bi 'emeliâtê bî. *Gerdin had her baby by surgery [C-section].*)
(2) (see also have surgery)

surprise mifaci' (f) (Amy bu min hêflek mifaci' çêkir. *Amy threw a surprise party for me.*)

surprise (v) mifaci' kirin, mifaci' bike (Pêhesîna wî ez mifaci' kirim. *His reaction surprised me.*)

surround dur man durî (Dur man durî min biçik bîn. *The children surrounded me.*)

suspenders (1) doxîn
(2) şeluwan

swallow (v) da'îren, da'îre (Van hâbka da'îre. *Swallow these tablets.*)

swamp cooler moberîde (f)

swear (v) sînd xwarin, sînd bixwin

sweat (v) xwe hi dan, xwe hi bide

sweater (1) biluz (m) (Biluzê te taze ye. *Your sweater is pretty.*)
(2) çakêt (m) [cardigan sweater]

sweats tereksûd (m) (biluzê tereksudî *sweatshirt*)

Sweden Siwîd (f)

sweep (v) (1) gêzik kirin, gêzik bike
(2) maliştin, bimale

sweet şîrîn

sweet potato pitatê sorr

sweetheart (1) evîndar (Dilnaz u Şerzad bi evîndarî şî bi êk u dû kirin. *Dilnaz and Şerzad were sweethearts and got married.*)
(2) dildar
(3) xweştêvî

swiftly bi lez

swim (v) ketin av, bikeve avê (Tu hês jê dikî bikevî avê? *Do you like to swim?*) (Tu dê çî ser avê kevî avê? *Will you go swim in the river?*) (Tu dê çî ser mezbeîê kevî avê? *Will you swim in the swimming pool?*)

swimming pool mezbeî

swimming suit maîu

swimming trunks derpê ketin avê

Swiss chard beqil

swollen werimî

sword şîr (m)

symbol nîşan (f)

synagogue (1) peristgeh (f)
(2) cad
(3) kenîşte
(4) bêt el 'êbede (Ar) [house of worship]

Syria Surîa

t

table mêze (f)

tablecloth (1) patê mêzê
(2) neylonê mêzê

tablespoon kefçikê xwarinê

tablet (pill) hâbik (m)

tail dîfk (m)

tailor xeyat (m)

take (v) (1) birin, bibe (Ezê te bim dixturî. *I'm taking you to the doctor.*)
(Çentê min hat dizînê. Êkê ji min bir. *My purse was stolen. Someone took it from me.*)
(2) girtin, bigire (Vê kahezê bigire. *Take this paper.*)
(3) înan, bîne (Ka wî qelemî ji def deyka xwe bîne. *Take that pen to your mother.*)
(4) wergirtin, wergire (Vê dîarîê ji min wergire. *Take this present from me.*)
(5) gehanandin, bigehîne (Şîrînê ez gehandim def dixturî. *Sirîn took me to the doctor.*) (Evê kahezê bigehîne Dilnazê. *Take this paper to Dilnaz.*)
(6) standin, bistîne (Biraê min parê min ji min standin. *My brother took my money [from me].*)
(7) burandin, biburîne [take and go to another place] (Te dît? Bîk burandin. *Did you see? They took the bride [and went to the groom's house].*)
(8) bi xwe bîn, bi xwe bibe [take for oneself]
(9) gehan, bigehe [length of time] (Çend se'eta rêk heta tu bigehî Texas? *How long does it take you to get to Texas?*)
(10) kêşan, bikêşe [length of time] (Sê se'eta rêk kêşa fieta ez geheştim Dohukê. *It took me three hours to get to Dohuk.*)
(11) (see also se'et and kengî and ago)

take a bath (v) serê xwe şîştin di banîuê da, serê xwe bişo di banîuê da

take a bite (v) devê xwe kirin, devê xwe bike (Kesê devê xwe ne kir. *No one ate from / took a bite [of the cookie].*)

take a census (v) serjimêr kirin, serjimêr bike

take a picture (v) (1) risim girtin, risimî bigire (Min divêt ez risimekê bigirim. *I want to take a picture.*)
 (2) risim standin, risimî bistîne (Bila ez risimê te bistînim? *May I take your picture/photo?*)
 (3) risim kêşan, risimê bikêşe (Risimekê bu min bikêşe! *Take a picture for me.*)

take a shower (v) serê xwe şîştin, serê xwe bişo

take an oath (v) sînd xwarin, sînd bixwe

take an x-ray (v) îşa'e standin, îşa'ê bistîne

take apart (v) jêk vekerin, jêk veke (e.g., furniture)

take back (merchandise) (v) zivirrandin ve, bizivirrîne ve (Vê tenure bizivirrîne ve sîkê. *Take this skirt back to the market.*) (Min tenure zivirand. *I took the skirt back.*)

take care of (v) (1) xudan kirin, xudan bike (Ez deyka xwe xudan dikim. *I take care of my mother.*)
 (2) guhê xwe dan, guhê xwe bide (Cîrana min guhê xwe dit pişikê min. *My neighbor takes care of my cats.*)

take medicine (v) xwarin, bixwe

take off (v) (1) êxistin, bêxe (Min fanêlê êxist. *I took off the t-shirt.*)
 (2) xwe rîz kirin, xwe rîz bike (Hanaê xwe rîz kir u kete avê. *Hana took her clothes off and went swimming.*)

take on (v) helgirtin, helgire (Barsulê min helgirin. *Take my yoke upon you.*)

take out (v) (1) havêtin, bavêje (Ziblî bavêje. *Take out the garbage.*)
 (2) înan der, bîne der (Qelemê xwe bîne der. *Take out your pencil.*)
 (3) înan derê, bîne derê (Min xoşka xwe ji avê îna derê. *I took my sister out of the water.*)

take pity (v) dil ... man bi ... ve, dil ... bimîne bi ... ve (Dilê xudanî ma bi wî kuîlê ve. *The master took pity on that servant.*)

talent (ancient money) derhem (10000 derhemêt zivî *10000 silver coins*)

talk (v) (1) axiftin, baxive
 (2) (*see also tell and word*)

talk about (v) beñsa ... kirin, beñsa ... bike (Min divêt em beñsa Kurdistanê bikîn. *I want us to talk about Kurdistan.*)

tall (1) drêj [people, animals, things] (Ev dare gelek drêj e. *This tree is really tall.*) (Deyka min kort e; babê min drêj e. *My mother is short; my father is tall.*)
 (2) bilind [things, buildings, trees, people] (Banê me nizim e; dara he bilind e. *Our roof is short/low; the tree [out there] is tall.*)

tamarind temerhind [a sour tropical fruit that Kurds eat or drink the juice of; looks like a date]

tangerine lalingî (f)

tangled alizî (Sufî yê alizî. *The yarn is tangled.*)

tape (1) tîp [scotch tape, masking tape, etc.]
 (2) lesqe [scotch tape, masking tape, etc.]
 (3) şelît (f) [cassette]

tape (v) tîp kirin, tîp bike [with scotch tape]

tape measure fit

tape player (cassette) misecil

Tarshish Terşîş (f)

taste tam (f) (Av bê tam e. *The water is without taste / tasteless.*) (Tama xwarina te xweş e. *The taste of your food is yummy.*)

taste (v) tam kirin, tam bike (Tam bike hêkê. *Taste the egg.*)

tattoo deq

taught (v) (*see be taught*)

tax (1) teks (f) (Her sal ez teksê dim hîkmetê. *Every year I pay taxes to the government.*)
 (2) dêrîbe (f) (Ar) (Hîkmet her sal dêrîbê ji min stînit çînko ez şul dikim. *The government takes taxes from me every year because I work.*)

tax collector (1) bacgir
 (2) baçwergir

taxi teksî (f)

taxi owner/driver xudanê teksî

taxi stand cihê teksî

tea çay (f) (Çay teñil e. *The tea is bitter / doesn't have sugar in it.*)

tea glass pîale (f)

tea house (1) çayê xane (f)
 (2) gazînu (f)

tea kettle (1) qorî (m)
 (2) qurrî (m)

tea leaves tuvça (f)

tea pot (1) qorî (m)
 (2) qurrî (m)

tea saucer teblîk (f)

tea spoon kefçikê çayê

teach (v) (1) nîşa ... dan, nîşa ... bide (Dersa nîşa min bide. *Teach me the lesson.*) (Neqşî nîşa min bide. *Teach me how to embroider.*)
 (2) tedirîs kirin, tedirîs bike (Ar)
 (3) fêr kirin, fêr bike

teacher (1) mamosta
 (2) mamusta (m) (mamustaêt desturî *teachers of the law*)
 (3) sêyda (Ar) (m)
 (4) mu'îd (m/f) [college]

(5) mideris (m) [high school]
 (6) miderîse (f) [high school]
 (7) mi'elim (m/f) [primary; general]

teaching zanîn (f)
team tîp (f)
tear (v) (1) dirandin, bidirîne (Kažezê bidirîne. *Tear the paper.*)
 (2) qetandin, biqetîne
tear apart (v) qetan, biqetîne (Werîsî biqetîne. *Tear the rope apart.*)
 (Werîs qeta. *He tore the rope apart.*)
tears rundik (f, pl) (Rundik ji çava hatine xwarê. *Tears ran down.*)
teasing (1) ji qesta (Ne, ez naçim. Min ji qesta we got. *No, I'm not going. I told you that teasingly.*) (Buçî te we kir? Ji qesta. *Why did you do that? I was just teasing.*)
 (2) ji qestî
teenager (1) genc
 (2) mirrahiq (m/f)
tehin (sauce made from sesame seeds) tehîn (f)
telephone (1) telefun (f)
 (2) telefon (f) (reqemê telefon *telephone number*) (deftera telefonê *telephone book*)
telephone (v) telefon kirin, telefon bike (Min divêt ez telefona Adarê bikim. *I want to phone Adar.*) (Telefona xoşka xwe bike. *Call your sister.*) (Çi wextê te divêt, telefona min bike. *Call me when you want to.*)
television televizîun (f) (Televizîun kê m ke. *Turn the TV volume down.*)
tell (v) (1) gotin, bêje
 (2) gûtin, bêje
temperature (1) taî (f) [fever] (Taî ya li min e. *I have a temperature [fever].*) (Min ta gelek heye. *I have a high temperature.*)
 (2) heraret [fever] (Heraret bu te çê dibit? *Do you have a temperature?.*)
 (3) mihrar (f) [thermometer for a fever] (Reqemê mihrarê wî çend e? *What's his temperature? / What's the thermometer number?.*)
 (4) cew [weather] (Evroke cew çawan e? Cemidî ye. *What's the temperature like today? It's freezing.*)
temple (1) kenîşte
 (2) bê Allah (Ar)
 (3) peristgeh (f)
temptation taqîkirin (f)
ten deh (f)
tenant kirêdar
tenderness diluvanî (f)
tennis tenis

tennis shoes puftin
termites heywan darî dixwit
test (1) fehs (f) (Ar) [medical] (da fehsa min bikit *in order to have a test*) (fehsa xwîne *blood test*)
 (2) imtîhan (f) (Ar) [academic]
test (v) taqî kirin, taqî bike
testify (v) şehdekîê ... kirin, şehdekîê ... bike (... daku şehdekîê bo rastîê bikim. ... *in order for me to testify to the truth.*)
testimony sînd (drew sînd *false testimony*)
text [e.g., lyrics] tekst
textbook kitêb (f)
Thank you. (1) memnun (gelek memnun *thank you very much*)
 (2) supas
thankful memnun
that (1) ew (m/f) [direct]
 (2) ewe (m/f) [direct]
 (3) wê (f) [oblique]
 (4) ewê (f) [oblique]
 (5) wî (m) [oblique] (wî qelem *that pen*)
 (6) ewî (m) [oblique]
 (7) ya [(f) izafe] (Ya min e! *That's mine!*)
 (8) yê [(m) izafe] (Yê min e! *That's mine!*)
 (9) da
 (10) ku
that which ewa (Ew dê êt u ewa di dilê wî da hatî ye çandin dê dizîto bit. *He will come and steal that which was sown in his heart.*)
theft dizî (f)
their wan [oblique] (kitêbê wan *their books*)
them (1) ew [direct]
 (2) wan [oblique]
then (1) dîv da (Ê, dîv da... *So, after that ... [in listening to someone tell a story].*)
 (2) paşî (Ê, paşî çî lê hat? *So what happened then?.*)
 (3) piştî hîngê (Ez çûm mala Canê. Piştî hîngê ezê em mala we. *I went to Canê's house. After that I'm coming to your house.*)
 (4) vêca (Ê, vêca? *And? So what?.*)
 (5) hîngê (A: Tu kengî çû mala Canê? B: Hîngê, wextê em ji medresê hatîn. *A: When did you go to Canê's house? B: Then, when we got home from school.*)
 (6) rabî(n) [story-telling]
 (7) îna [story-telling]
there wêrê

therefore jiber hindê
thermometer (for checking a fever) mihrar (f) (Mihrarê bine. Ĥerareta wî bigire. *Bring the thermometer and check his fever.*) (Reqemê mihrarê wî çend e? *What's his temperature?*)
these (1) ev [direct]
 (2) eve [direct]
 (3) van [oblique]
 (4) va [oblique]
 (5) evan [oblique]
 (6) eva [oblique]
they (1) ew [direct]
 (2) wan [oblique]
thick stîr (weyrê stîr *thick wire*)
thief diz
thigh rehin (m)
thin (1) ze'if [people]
 (2) tenik [things]
 (3) zirav [things] (Nan tenik e. *The bread is thin.*)
thing tişt (m)
think (v) (1) raman, birame
 (2) [idiomatic] (Ew bi xwe nizanit, bes wî ji ne xwe got. *He's not sure but he thinks so [e.g., from his own experiences he thinks that it is cancer].*)
 (3) ya ji mi ve [idiomatic] (Ez çûme mala wan. Min biraê wê dît, ya ji mi ve yê li gel wan e. *I went to their house and saw her brother. I thought he lived with them.*)
 (4) (*see also* say (v) [idiomatic])
think about (v) (1) hizirêt xwe kirin, hizirêt xwe bike (Hizirêt xwe bike; paşi bêje min. *Think about it and tell me later.*)
 (2) tefkîr kirin, tefkîr bike (Tu çi tefkiîr dikî? *What are you thinking / daydreaming about?*)
thinking raman (f) (bê raman *without thinking*)
third (series) sîê (biçîkê sîê *third child*)
thirsty têhnî
thirteen sêzde (f)
thirty (1) sih (f)
 (2) sîh (f)
this (1) ev (m/f) [direct] (ev sale *this year*)
 (2) vê (f) [oblique] (vê nîvroê *this afternoon*) (vê heyvê *this month*) (vê heftîê *this week*)
 (3) evê (f) [oblique]
 (4) vî (m) [oblique] (vî xanî *this house*)
 (5) evî (m) [oblique]

this morning evro siharê
thistle strî(k) (f)
thorn stirî (m)
those (1) ew [direct]
 (2) wan [oblique]
 (3) wa [oblique]
 (4) ewan [oblique]
 (5) ewa [oblique]
 (6) yêt [(pl) izafe] (Yêt min in! *Those are mine!*)
thought raman (f)
thoughtful (1) ne bê xem
 (2) ne li ber xwe bi tinê
thread (1) dezî (m)
 (2) dirêzî (m)
 (3) ta (m)
three sê (f) (sê cara *three times*) (sê çarêk *three-fourths*)
three days ago betira pêr
three nights ago şev tira dî
three-fourths sê çarêk
three-quarters sê çarêk
thrift store dikana mista'mil
throat hefik (f)
 (3) [idiomatic title of respect said by men ("sir" or "ma'am")] ("ez benî")
benîşt (m) cud
benîşt cîtin, benîştî bicî to chew (Dihî Hanaê benîşt cît. *Hana chewed gum yesterday.*) (Pez benîştê xwe yê cî. *The sheep chewed their cud.*)

beq (f) frog
beqal (m) (Ar) (1) food salesman
 (2) seller of vegetables and fruit
beqil Swiss chard
beqlewa baklava
ber (1) in front of
 (2) in
 (3) at (Ez ber derrgehî me. *I'm at the door [e.g., said to your host through the apartment intercom system at the front door].*)
ber (m) (1) product
 (2) crop/produce
 (3) yield
 (4) fruit (Dara pîç dê berekê pîç dit. *A good tree bears good fruit.*)
 (5) offspring/descendant
 (6) stone
ber ... ketin, ber ... bikeve to inherit (Ji malê ev komedîne ber mi ket. *I inherited this dresser from the house.*)
ber dan, ber bide (1) to leave (Alî jina xwe ber da. *Ali left his wife.*)
 (2) to let go / release / set free (Min teyrê xwe ber da. *I let my bird go.*)
 (Mi ji qefeskê teyr ber da. *I set the birds free from the cage.*)
 (3) to drop
 (4) to allow [hair or beard] to grow
 (5) to divorce (Ahmedî jina xwe ber da. *Ahmed divorced his wife.*)
 (Zuzanê mêrê xwe ber da. *Zuzan divorced her husband.*)
ber xwe kirin (*see kirin ber xwe*)
beramber (1) commandments
 (2) regulations??
beramberî face to face (Ez beramberî te rîniştî me. *I was sitting face to face with you.*)
beramberî 'edrê (1) face down (Navçavê wî beramberî 'edrê bî. *His face was face down.*)
 (2) prone
beramberî seqfî face up (Navçavê wî beramberî seqfî bî. *His face was face up.*)
beran berî êk parallel (Xatêt beran berî êk in. *The lines are parallel.*)
beraz (m) pig (Goştê barazî hêram e. *Pork (pig meat) is forbidden.*)
berber Berber
berçavk (pl) eye glasses (Berçavkêt min şikestin. *My eye glasses broke.*) (Ez nabînim bê berçavik. *I can't see without glasses.*) (berçavk yê tavê *sunglasses*)
berdaî divorced (Ev jinke berdaî ye. *This woman is divorced.*)
berdana jina divorce

berdawam bîn, berdawam bibe to work unceasingly (Şulê xwe berdawam be. *Don't stop your work.*)
berde (*see berdan*)
berdesk pot holder
berdeskê dixturî dental assistant
berev together
berê in front of
berê xwe dan, berê xwe bide to look at (Berê xwe bide min! *Look at me!*) (Berê xwe bidê! *Look!*)
berik (f) mat / wall to wall carpet / area rugs] (berka biçîk *bath mat*) (Pê xwe dîf berka xwe drêj (bi)ke. *Stretch your legs out according to the size of your carpet. "Make do with what you have."*)
berî before
berî (m) filbert / hazelnut (Em berî dikîne bi nav pelêt agirî da şîrîn dibit. U em dixwîn. *We put filberts in fire pan to make them sweet; then we eat them.*)
berîd (f) (1) post office
 (2) mail box (Min mektubê xwe havête sinduqa berîdê. *I put a letter in the mailbox.*)
 (3) mail (Min berîda xwe vekir u îna malê. *I sent my mail and brought it home.*)
berîk (f) (1) pocket (Kurrkî di kilîla timbêla wî yê di berîka wî da. *The boy put his car key in his pocket.*)
 (2) pouch (of a kangaroo)
berîne drill
berîvan (f) milkmaid (girl who milks animals) (Berivan şîrî duşit. *The milkmaid milks.*)
berlêvê avê beach
bermil (m) small bundle
bernamic (f) TV program
bersiv (f) message (Ezê bersivekê dime te wextê Naz bêt. *I'll give you a message when Naz comes.*)
bersiva cab ... dan, bersivacab ... bide to answer (Wî bersiva caba min da. *He answered my message.*)
berx(ik) (m) lamb
berze (1) lost
 (2) missing (Derzîa min berze bî. *My needle was missing.*)
berze kirin, berze bike to lose
bes (1) but (bes ji rexeke dî ve *but on the other hand side*)
 (2) except (Derametî ez ne şêm bixwim bes xîar e. *I can't eat any vegetables except cucumbers.*)
 (3) only (Bes evro ez dişem bêm nik te. *Only today can I come to your*

house.) (Em hêmî çûn seyranê bes mala Adarê ne hatin. *We all went on the picnic; only Adar's family didn't come.*) (Ez dişem bes piçîskeke rînim. *I can only stay/sit for a short time.*)

(4) enough (Min bes e. Xwedê zêde kit. *I had enough [to eat]. Thanks.*) (Dersa Kurdî vê gavê bes e. *I've had enough of the Kurdish lesson for now.*)

besî (1) simple (Ez hês ji jîana besî dikim. *I like the simple life.*)
(2) sufficient (Pare ne besî min bî. *I didn't have enough money.*)

bet (f) duck

betal (1) unemployed

(2) having nothing to do

(3) day off (Kîş rojê tu betal î? *Which day to you have off?*)

(4) [when the norm isn't taking place] (Wextê min hebik betal kirin ... *When I didn't take the birth control pills ...*)

(5) [not functioning normally] (Milê wê betal bî. *Her shoulder didn't work.*)

betal kirin, betal bike to quit [one's job] (Min betal kir. *I quit [my job].*)

beten inside (of clothes, things)

betenî (f) blanket

beş bad luck (Reqem sêzde beş e. *The number 13 is bad luck.*)

beşûş cheerful

betil (m) bottle

betîra pêr three days ago

betle bottle

bext (f) (1) chance

(2) luck

bextê ... to be totally dependant on someone (ez bextê te me *I'm in God's hands*) (Ez bextê te me. *I am totally in your hands.*) [When somebody is totally in somebody else's hand, he is relying on this person's mercy. Claiming to be at someone's mercy is appealing to his mercy. If somebody is totally dependent on God, it means that he has nothing. If one gives to somebody who is totally dependent on God, it is like doing God a favor. (Ez bextê te me, "Hindek pare bide min!" *I beg of you, "Give me some money!"*) (Ez bextê Xwedê me. Leqman, harî min bike. *I'm in God's hands; Leqman, help me!*)]

bexte bext begging

beyana biçîk birth certificate (Te beyana wê heye? *Do you have her birth certificate?*)

Beşda Baghdad

beşemî grumpy

beyna between (Ferqek heye beyna kiçkê u kurrkî. *There is a difference between the girl and the boy.*) 201

Beytlehim Bethlehem

bê without (Ev çay bê şeker e. *This tea is without sugar.*) (bê kes *lonely [without anyone]*)

bê 'aqil foolish

bê cir'et cowardly

bê gaê blamelessly

bê hinek (1) some time [minutes, hours]

(2) a while

bê hinek dî after a while [minutes, hours] (Bê hinek dî were mala me. *Come to our house after a while.*)

bê hinekê (1) for some time [minutes, hours]

(2) for a while (Bê hinekê min divêt bêm def te. *I want to come [to your house] for a while.*)

bê hîvî hopeless

bê kêmasî perfect [things]

bê raman dubare kirin, bê raman dubare bike to babble (Ew her tiştê bê raman dubare dikit. *She repeats everything without thinking / babbles.*)

bê sîtar immodest (Ooo tu çi bê sîtar yê rîniştî. *Oh, you sat in an immodest way.*)

bê xem (1) apathetic

(2) unconcerned

bê xîret lazy [not smart]

bê zehmet please

bêcî (Ar) (m) beige

bêhin (f) (1) breath

(2) smell (Bêhina gula xweş e. *The smell of the flowers is nice. / The flowers smell nice.*) (Ez bêhina mexelexê seî dikim. *I smell the pickles.*)

(3) odor (Bêhin ne xweş e ji te têt. *Your body odor is bad.*)

(4) scent (Bêhina lewenta te xweş e. *The scent of your perfume is nice.*)

(Çi bêhinek xweş e ava gula ye. *Perfume has a great scent.*)

bêhin fireh (1) patient (Şîrîn bêhin fireh e. *Şîrîn is patient.*)

(2) long-suffering

bêhin kirin, bêhin bike to smell

bêhin teng (1) depressing

(2) impatient

(3) lonely (Bêhina min teng e. *I'm lonely.*)

bêhin vedan (m) rest (Hîn dê bu derunêt xwe bêhin vedanê bînin. *You will find rest for your souls.*)

bêhina xwe fireh kirin, bêhina xwe fireh bike be patient (v) (Bêhina xwi li min fireh ke. *Be patient with me.*)

bêhina xwe kêşan, bêhina xwe bikêşe to inhale (Min bêhina xwe kêşa. *I breathed in.*)

bêhina xwe vekirin, bêhina xwe veke to rest

bêhinêre (see hinartin)
bêhinijîn, bibêhinje to sneeze
bêhinişk (f) sneeze
bêje (see gotin or gûtin)
bêsbal baseball
bêsbal kirin, bêsbal bike to play baseball (Min divêt em bêsbal bikîn. *I want us to play baseball.*)
bêt next (heftîa bêt *next week*) (heyva bêt *next month*) (sala bêt *next year*)
bêt Allah (Ar) temple
bêt el ‘êbede (Ar) synagogue [house of worship]
bêxe (see êxistin)
bi (1) by means of (bi teyarê *by plane*) (bi çavekê xirab *lustfully [with a destroying eye]*)
(2) with (bi qelemî *with [the] pen*)
bi ‘aqil sane (Tu bi ‘aqil î? *Are you sane? [asked when something hard to believe was said by a friend or spouse]*)
bi ... ra in (Kilîlê bi derrgehî ra ye. *The key is in the door.*)
bi ... ve (1) on (Se’etê bi dîwarî ve ye. *The clock is on the wall.*)
(2) in (Kilîlê bi derrgehî ve. *The key is in the door.*)
bi avê şîştin, bi avê bişo to rinse
bi bizav active (Leqman gelek bi bizav e. *Leqman is very active.*)
bi cir’et (1) brave
(2) courageous
bi dest by hand (Min bi destê xwe çêkir. *I made it myself / by my hands.*)
bi dest ... ketin, bi dest ... bikeve to get (Ez çûm nik delalî da xanîek bi dest min bikevî. *I went to a realtor to get a house.*)
bi dest xwe ve înan, bi dest xwe ve bîne to inherit
bi deyn (see dan bi deyn)
bi dîv ketin, bi dîv bikeve (1) to follow (Biçîk bi dîv babê xwe ketin. *The children followed their father.*)
(2) to walk after
bi edeb polite
bi hewe ketin, bi hewe bikeve to go up
bi hêz strong
bi hîvî hopeful
bi ħal (f) pregnant (Dilnaz bi ħal e. *Dilnaz is pregnant.*)
bi ħalekê pregnant (Ez bi ħalekê me. *I’m pregnant.*) (Wextê deyka min bi ħalekê bî bi min... *When my mother was pregnant with me...*)
bi ħalekê ketin, bi ħalekê bikeve to get pregnant [women]
bi kar hatin, bi kar bê (were) to pay for (Lazim e mirin bu gunnehê bi kar bê. *Sin must be paid for by death.*)

bi kar înan, bi kar bîne to use (Tu çawa telefonê bi kar tîni? *How do you use the telephone?*)
bi keyf happy (gelek bi keyf *excited [happy]*)
bi keyf u xweşî joyfully (Ez u tu bi keyf u xweşî çûine seyranê. *You and I went joyfully to the picnic.*)
bi kîn bitter anger (Çend tu bi kîn î! *You’re very bad / full of bitter anger.*)
bi kurrî bila simply let ...
bi lez (1) quickly (Bi lez da biçîn! *Let’s go quickly!*)
(2) swift
(3) fast
(4) in a hurry (Ew bi lez e. *He’s in a hurry.*)
bi lez u bez quickly and frantically
bi qowet strong
bi rê ve (1) on the way
(2) in the way
bi rê ve çûn, bi rê ve herre to walk
bi rehîm merciful
bi rex ... ve (1) beside (Şirîn bi rex min ve rînişt. *Şirîn sat next to me.*)
(2) next to (Mala me bi rex mala we ve ye. *Our house is next to your house.*)
bi rojî bîn, bi rojî (bi)be to fast [for religious purposes] (Ew bi rojî ne. *They’re fasting [for God].*)
bi ser keve up (Wextê tu bi ser kevî ... *When you go up ...*)
bi ser u ber perfectionistic [organized, clean, put together] (Dixtur bi ser u ber e. *The doctor is perfectionistic.*)
bi serda riştin, bi serda birrêje to overflow (Perdaşa min bi serda rişt. *My cup overflowed.*)
bi sitar (1) conservative (Cilkêt min bi sitar in. *My clothes are conservative.*)
(2) modest (Min divêt ez bi sitar bim. *I’m modest.*)
bi taze polite
bi tazî bîn, bi tazî bibe (1) to grieve
(2) to mourn (Ez bi tazî me. *I’m mourning.*)
bi şul busy
bi tinê (1) alone
(2) lonely (Ez bi tinê me. *I’m lonely.*)
bi tişt pregnant (Ne bi tişt e. *She’s not pregnant.*)
bi tişt ketin, bi tişt bikeve to get pregnant [women] (Tu bi tişt ketî. *You got pregnant.*)
Bi xatra te / we! Good-bye (sng / pl)! [said by those leaving the house or by the one hanging up on the telephone]

bi xew sleepy (Ew bi xew e. *She's sleepy.*)
Bi xêr biçî (ser çava)! Good-bye (sng)! [said by (a) the one staying at home, (b) both if you're both leaving, or (c) by the one who responds to *bi xatra te* on the telephone]
Bi xêr hatî Welcome [to my home]! (sng)
bi xîret (1) energetic
(2) active
bi xurtî (by) force (Şîrînê bi xurtî xwarin da min. *Şîrîn forced me to eat.*)
bi xwe dan şulî, bi xwe bide şulî to invest (Min bi xwe dan şulî. *I invested [the money].*)
bi xwe jê girtin, bi xwe jê bigire to choose (Bi xwe jê bigire. Te kîşk divêt: av, şerbet, şîr? *Choose. Which do you want: water, juice, milk?*)
bi xwe şulek dîtîn, bi xwe şulek bibîne to get a job
bi xwê salty (Xwarina min bi xwê ye. *My food is too salty.*)
bi xezeb angry (Ew bi xezeb e. *He is very angry*) (Ev mirove bi xezeb e. *The people are angry and fighting about something.*)
bi zurî (by) force (Ewî bi zurî pare ji mi standin. *He forced me to give him money.*)
bi'elime (*see* 'elimîn)
bi'elimîne (*see* 'elimandin)
bibare (*see* barîn)
bibe (*see* bîn or birin)
bibe esker (*see* bîn esker)
bibêhinje (*see* bêhinijîn)
bibîne (*see* dîtîn)
bibirre (*see* birrîn)
bibişkure (*see* bişkurîn)
bibure (*see* burîn)
biburîne (*see* burandin)
biçe (*see* çûn)
biçe sîkê (*see* çûn sîkê)
biçemîne (*see* çemandin)
biçine (*see* çinîn)
biçîk (1) small (gelek biçîk *tiny [things]*)
(2) little [amount]
(3) [idiomatic] barren (Çû biçîk ne bîn. *They had no children.*)
biçîk (m) (1) baby (biçîkê sava *tiny baby*)
(2) child (biçîkê çarê *fourth child*) (biçîkê sê *third child*)
(3) youngest child
(4) toddler

biçîk bîn, biçîkî bibe (1) to give birth (Ew biçîk bî. *She gave birth.*)
(2) to have a baby
biçîk çûn, biçîk biçe (herre) to miscarry (Biçîk ji ber Rêsanê çû. *Rêsan miscarried her baby.*)
biçîk ji ber xwe birin abortion (Biçîk ji ber xwe birin guneh e. *Abortion is sin.*)
biçîk ji ber xwe birin, biçîk ji ber xwe bibe to abort (Wê biçîk ji ber xwe bir. *She aborted her baby.*) (Guneh e tu biçîkî ji ber xwe bibî. *It's sin for you to abort the baby.*)
biçîkatî (f) childhood (Biçîkatîa min xweş bî. *My childhood was wonderful.*)
biçîne (*see* çandin)
bide (*see* dan)
bidewsîne to push (Dugimê bidewsîne. *Push the button.*)
bidirîne (*see* dirandin or dirêtin)
bidrî (*see* dirîn)
biêşe (*see* êşan)
biêşîne (*see* êşandin)
bifetise (*see* fetisandin)
bifirre (*see* firrîn)
bigehe (*see* gehan or geheştin)
bigemarîne (*see* gemirandin)
bigerre (*see* gerran or gerrhan)
bigire (*see* girtin)
bigirî (*see* girîn)
biguhişe (*see* guhişîn)
biguhurre (*see* guharrtin or guhurrîn)
biha (m) (1) price (Çi bihaê wê gelek e. *This price is too much.*)
(2) cost
(3) expense (Bihaê vî qemîsî kê m e. *My expense for this shirt was only a little.*)
bihar (f) spring (season)
bihavêje (*see* havêtin or pavêje)
bihejîne (*see* hejandin)
bihêle (*see* hêlan)
bihilavê (*see* hilavêtin)
bihinêt buxîrê incense
bihîstin, bibihîze to hear (Te bihîst? *Did you hear?*)
bijî (*see* jîan)
bike (*see* kirin)
bike hewar (*see* hewar kirin)
bike xar (*see* kirin xar)

bikene (see kenîn)
bikeve (see ketin)
bikêle (see kêlan)
bikêşe (see kêşan)
bikirre (see kîrîn)
bikuje (see kuştin)
bikule (see kulan)
bikuxe (see kuxîn)
bila OK (Bila ezê li gel te êm. *OK, I'll come with you.*)
bilêne (see lênan)
bilî ace [playing card]
bilîl (f) flute
bilind (1) tall [people, trees] (Banê me nizim e; dara he bilind e. *Our roof is short/low; the tree [out there] is tall.*)
(2) high [buildings, things]
bilindahî (f) height
bilive (see livîn)
biluz (m) (1) sweater (Biluzê te taze ye. *Your sweater is pretty.*)
(2) turtleneck (biluzê tereksudî *sweatshirt*)
bilûk (1) cement block (Ew biluka çêdikît. *He lays bricks / cement blocks.*)
(2) (see also hêlan)
bimale (see maliştin)
bimîne (see man)
bimire (see mirin)
bin (m) bottom (binê pê *sole of the foot*) (binê pêlavê *shoe sole*)
(binê textî *bed frame*)
binçuk (m) calf (of the leg)
bindest (m) colony (Emrîke bindestê Inglîzî bî. *America was a colony of England.*)
binve (see nivistin)
binvîse (see nivîsîn)
binxêve (see nixaftin)
binyat foundation (Ewî çî binyat nîne. *He has no foundation / root. [He doesn't know his parents; life is shakey; he has no relatives, no home ...]*)
(Binyatê xaniê me gelek qayim e. *Our foundation is very strong.*)
bipeqe (see peqîn)
bipêje (see pehîtin)
bipêve (see pîvan)
bipsî Pepsi
biqehire (see qehirîn)
biqelîne nav duhinî da (see qelandin nav duhinî da)

biqetîne (see qetandin)
biqewme (see qewmîn)
biqosîne (see qosandin)
biqote (see qotan)
birâ (m) (1) brother
(2) half brother
birâştin, birêje (1) to barbecue
(2) to grill
biraweste (see rawestan)
bireh (f) eyebrow
birhu (f) eyebrow
birin, bibe (1) to take (Ezê te bim dixturî. *I'm taking you to the doctor.*)
(Çentê min hat dizînê. Êkê ji min bir. *My purse was stolen. Someone took it from me.*)
(2) to pick up [transport] (Zehmet ne bit tu dê şê min gel xwe bibî? *May I go with you (in your car), please? / Can you pick me up?*)
(3) to win [a game] (Min bir. *I won.*)
birinc (f) rice [cooked] (Min birinca xwe di qazana mezin da çêkirin. *I made my rice in a big pot.*) (Min birinc u metfînê çêkirî. *I made rice and stew.*)
birinc (m) rice [uncooked] (Bu min hindek birincî bikirre. *Buy me some rice.*)
birîsk (f) fax (Bu min birîskê virrêke / lê bide. *Send a fax for me.*)
birkan volcano
birrecife (see recifîn)
birreve (see revîn)
birrevîne (see revandin)
birrêje (see riştin)
birrîn (f) wound
birrîn, bibirre (1) to cut with a knife or scissors [paper, hair, wings, body parts, cloth] (Min pirrça xwe birrî. *I cut my hair.*)
(2) to cut off
(3) to amputate (Dixturî destê wî birrî. *The doctor amputated his arm.*)
(4) to cut down (Min dar birrî. *I cut the tree down.*)
(5) to wound by cutting
(6) to clip
(7) to shear (Pirrça xwe bibirre. *Shear your hair.*) (Min pîrtê pezê xwe birrî. *I sheared my sheep's fur.*)
(8) to bleed (Tila min birrî. *My finger bled / is bleeding.*)
(9) to stop
birrî u birîsî (f) lightning and thunder
birrî screw

birs (f) (1) hunger
(2) famine (Birs bi ser wî welatî hebî da hat. *There was a famine in that country.*)

birsî hungry (Ez birsî me. *I'm hungry.*) (Li Efrîqîe alem birsî ne. *Everyone in Africa is hungry.*)

bisekine (*see sekinîn*)

biserrman (m/f) Muslim

bisk ringlets in front of ear [for women]

bisoje (*see sotin*)

bistîne (*see standin*)

bitamirîne (*see tamirandin*)

biteqîne (*see teqandin*)

biteze to get cold (Min gusik bire ser banî da bitezit. *I brought a jug [of water] up on the roof so that it would get cold.*)

bişê (*see şîan*)

bişilqîne (*see şilqandin*)

bişkê (*see şikestin*)

bişkêne (*see şikandin*)

bişkîne (*see şikandin*)

bişkurîn, bibiškure to smile

bişo (*see şîştin*)

bişu (*see şîştin*)

bitirrse (*see tirrsan*)

bivê (*see vîan*)

bivir ax

biweste (*see westan*)

bixaze (*see xastin*)

bixçik (f) bridegroom's wedding clothes which are wrapped up in a square cloth (Mala zavaî sê çar bixçika yê reng u reng dê kinit navda. *The groom's family will put three or four sets of colorful clothes in it [the cloth].*)

bixelhe (*see xelhan*)

bixemilîne to decorate (Ew dê timbêla bikê xemilînin. *They'll decorate the bride's car.*)

bixeniqe (*see xeniqîn*)

bixêrî (f) chimney

bixurîne (*see xurandin*)

bixwe (*see xwarin*)

bixwîne (*see xwandin*)

bixwîr (m) incense (Min bixwîr hilkir. *I lit the incense.*) (Bêhîna bixwîrê gelek xweş e. *The smell of incense is very nice.*)

bixwire (*see xurîn*)

bixeriqe (*see xeriqîn*)

bizane (*see zanîn*)

bizin (m) goat

bizivirre (*see zivirrîn*)

bizmar nail

bîanî (m/f) foreigner (Kurd li Emrîke bîanî ne. *Kurds are foreigners in America.*)

bîber (f) pepper (bîbera sorr *red / chili pepper*) (bîbera reş *black pepper*)

bîcame (m) men's pajamas

bîf (f) dresser

bîk (f) (1) bride
(2) daughter-in-law
(3) woman (bîka befirê *snowwoman*)
(4) doll

bîmbax (f) bow tie

bîn biskuşk, bibe biskuşk to bud (Gulêt me bîne biskuşk. *My flowers budded.*)

bîn dadgehê, bibe dadgehê to sue

bîn esker, bibe esker to join the army

bîn, bibe (1) to be
(2) to become (Ez dê bim dixtur. *I'll become a doctor.*)

bîne (*see înan*)

bîne der (*see înan der*)

bîr (f) (1) well [water, oil]
(2) memory [idiomatic: remember / forget] (Min ji bîr kir gel te biaxivim. *I forgot to talk to you.*) (Bîne bîra xwe ...! *Remember when ...!*) (Hat bîra min. *I remembered.*) (Bîra te bê. *You'll remember.*) (Bîne bîra xwe wextê em çûn ser behrê? *Do you remember when we went to the ocean?*) (Bila li bîra te bit. *You'll remember...*)

bîre beer (Ew bîre navexwit. *He doesn't drink beer.*)

bîrhatin (f) anniversary

bîst (f) twenty (bîst u êk *twenty-one*)

bîstan (m) (Ar) farm [has trees and bushes]

bîtaqe ticket

bîşeng flower (the name of one flower)

bîze (f) crochet hook (bîza sufî *yark hook*)

bo (*see bu*)

boî waiter

brîndar wounded

brunzî (Ar) dark-skinned

bu (1) for (Ev kitêbe bu te ye. *This book is for you.*)
(2) to (Çîrokekê bu min bêje. *Tell a story to me.*)

(bu alê çepê *to the left*)
 (3) to / until (se'et dû bu sê *2:00 to 3:00*)
buçî why (Buçî tu ji min 'aciz î? *Why are you angry with me?*)
bufê (m) dish cabinet
buîmbax̄ (f) bow tie
bul (f) ball (Min bulekê hey. *I have a ball.*)
bulanê kirin, bulanê bike to throw a ball (Min bulanê kir. *I threw the ball.*)
burandin, bibure to forgive (Li min bibure. *Forgive me. [said also after sneezing]*) (Te dihî xeletîa min burand. *Yesterday you forgave my mistake.*)
burandin, biburîne (1) to spend time
 (2) to go to and from a place
burek beef rolls (spicy beef rolled up in thin bread and fried)
burî (f) pipe [for water or gas]
burîn, bibure (1) to pass by (Ez burîm. Min tu ne dîtî. *I passed by; I didn't see you.*) (Ez burîm. Min tu ne dîtî. *I passed by; I didn't see you.*) (Pas burî u me ne dît. *The bus went by and I didn't see it.*) (Ez burîm. *I passed it [the house I was looking for].*)
 (2) to go through (U divîa ew dinav devera Samîre ra biburît. *He wanted to go through Samaria.*)
burîzan (m) trumpet??
burr gruff
buş big (e.g., mustache) (Ev ave buş e. *This river is big.*)
buyax kirin, buyax ke to paint
buyax nail polish
buyaxa rîa (1) blush
 (2) rouge

C

cab (f) (1) answer (Ew cabê wê dit. *She answers her.*) (Caba min bide. *Give me an answer.*) (Cabê bide min. *Answer me.*) (Duşembê ez dê cabekê dim te. *Monday I'll give you an answer.*) (Min cabek da wê. *I answered her.*)
 (2) message (Cabê bide min wextê Adar bêt. *Give me a message when Adar comes.*)
cabî conductor
cad synagogue
cam (f) (1) glass [window, table top, sliding patio door, windshield]

(2) negative of a photo (Te heyê cam? *Do you have the negative [of this picture]?*)
cami' (f) mosque [big] (Ew çû xwe diba Înê cami' mezin. *He went himself to the big mosque on Friday.*)
camî'a (Ar) (f) university
can (1) beautiful [women and things]
 (2) pretty [women and things] (Tu can î. *You're pretty.*)
car (f) (Ar) time (Hindek cara ezê êm. *I come sometimes.*)
carek dî (1) again (Carek dî were def min. *Come to me again.*)
 (2) another time
carekê once
caş(ik) (m) foal of a donkey
ceban (Ar) afraid of everything
ceduwel (f) schedule (Ezê sehkim ceduwela xwe. *I'll look at my schedule.*)
ceh (m) barley
cehnem hell (Mirovê xirab dê çit cehnemê. *An evil person will go to hell.*)
ceîş (m) soldier (Ceîşê Emrîkî bi hêz e. *American soldiers are strong.*)
cejin (f) holiday (Cejina te pîroz bit! *Happy holiday!*) (Cejina Derbazbunê *Passover*)
cejina şîkirin (f) anniversary (Dihî cejina şîkirna deyk u babêt min bî. *Yesterday was my parents' anniversary.*)
cel hair gel
celadê hêpsîa jailor
celal (m) (1) stream (celalê avê *small river / stream*)
 (2) creek
Celîl Galilee
cemed (f) ice on the streets
cemedanî (f) Kurdish men's head covering
cemidî (1) freezing (Evroke cew çawan e? *Cemidî ye. What's the temperature like today? It's freezing.*)
 (2) frozen [seafood]
cemidî icy (Ava tankî yê cemidî. *The water tank is icy.*)
cenderme police
cenderme (m) policeman
ceng (f) (1) fighting
 (2) war
 (3) battle
ceres (f) bell
ceribandin, ceribîne to inspect (Ceribîne da tu bizanî şul dîkî an şul nakî. *Inspect it to know if it works or not.*)

cerîde (m) (Ar) newspaper
cerr (m) large jug [for water] (Cerrê min yê şikestî. *My jug is broken.*)
cerrik (m) medium jug [for water] (Min bu xwe cerrik kirî. *I bought a jug for myself.*)
cerrîfik (m) broom (cerrîfkê zihakirnê *mop*) (cerrîfkê edebxanê *toilet brush*) (cerrîfkê kehrebê *vacuum cleaner*)
cerrîfkê kehrebê paqij kirin, cerrîfkê kehrebê paqij bike to vacuum
cerrîfkê paqij kirin, cerrîfkê paqij bike to mop
cew (m) (1) weather
 (2) temperature (Evroke cew çawan e? Cemidî ye. *What's the temperature like today? It's freezing.*)
cewdik heating pad
cewisifir (Ar) passport
ceza kirin, ceza bike (1) to punish
 (2) to discipline
Cezaîr (f) Algeria
cezakin (f) (1) punishment
 (2) discipline
cezîre (f) island (cezîra Guam(ê) *the island of Guam*)
cêgirê daraî administrative assistant
Cibraîl Gabriel
cida (1) by (it/my/him)self
 (2) apart from
 (3) separate from
cidabîn (f) separation (Cidabîna me u Fatimê gelek ne xweş bî. *Our separation from Fatima was awful.*)
cida kirin, cida ke to separate one from another
cidî (Ar) serious (Min cidî got ... *I was serious when I said ...*)
cih (m) (1) bed
 (2) place (cihê pêa *footstool*) (cihê l'abika *toy chest*) (cihê teksî *taxi stand*) (cihê timbêlê *parking space*) (cihê tu lê Xwedê daî *birthplace*) (cihê jîanê *city*) (cihekî emîn / veşartî (f) *hiding place* (see also perde) (cihê rîniştinê *living room*) (Min cih bu qiça te nîne di timbêlê da. *I don't have a place [room] in my car for your daughter.*)
cihêt wana guharrtin, cihêt wana biguhurre (1) to (re)arrange
Cihî (m/f) Jew (‘Îsa Cihî bî. *Jesus was a Jew.*)
cihêl young
cihêlatî (f) youthfulness (Cihêlatî gelek xweş e! *Youthfulness is great.*)

cil jê standin stripped of clothes
cilik (pl) clothes (cilkê şulî *uniform*) (Min gelek cilik hene. *I have a lot of clothes.*)
cim’e (Ar) (f) Friday
cimil (f) (Ar) sentence (Cimlekê bu min bêje. *Tell me a sentence.*)
cin (m) (1) spirit [good or bad]
 (2) demon
cindî (m) soldier (Cindî yêt ‘Îraqê hatin ‘erdê Kurdistanê da. *Arab soldeirs came to Kurdistan.*)
cinet (f) paradise (Enşallah tu biçî cinetê. *God willing you will go to paradise.*)
cinis (m) sex (zelam *male*) (jin *female*)
cinsîe citizenship (Tu Emrike ne şêî cinsîe wergirî heta pênc sala. *In American you can't get your citizenship until you've been here for 5 years.*)
cinsîe (f) (1) alien card
 (2) i.d. card
cinub (Ar) (m) south
cipis cast [for a broken bone] (Cipis giran e. *The cast is heavy.*)
cipis kirin, cipis bike to put a cast on a broken bone (Ew dê cipis kit. *He will put a cast on [the broken leg].*)
cir’ed risk (Min pêl cir’eda xwe kir ez çûm Kurdistanê. *I threw my risk out when I went to Kurdistan.*) (Min pêl cir’eda xwe kir u min timbêl hajot li ser “highway” u ez ne tirrsam. *I threw caution to the wind and drove the car on the highway; I wasn't afraid.*)
cirid (f) rat
cihare (f) cigarette
cihrafi (f) geography
ciz’e part of
ciza (m) (1) punishment (Cizaê wê gelek e. *Her punishment is a lot.*)
 (2) discipline
ciza kirin, ciza bike (1) to punish (Min Hana ciza kir. *I punished Hana.*)
 (2) to discipline
cizakin (f) (1) punishment
 (2) discipline
cizdank (m) wallet
cihan (f) world (Hîn dê tengavê di cihanê da bînin. *You will have trouble in this world.*)
cihazê biçik incubator (for infants)
cînz jeans

cîran (m/f) (1) neighbor
 (2) neighborhood [neighbors]
cudelîa ser textî (1) bedspread [thin]
 (2) quilt
 (3) comforter
cuk (f) drain water [from a house pipe]
cut pair
cutîar (m) (1) farmer (Cutîar ‘erdê xwe dikêlit. *The farmer plows his land.*)
 (2) gardener

Ç

çak (1) good (Şulê min çak bî. *I did good work.*)
 (2) smart
 (3) beautiful
çakêt (m) cardigan sweater
çakî (f) (1) good deeds (Çakî bike. *Do good things.*)
 (2) righteousness
 (3) goodness (Çakî u diluvanî li drêjîa jîana min dibine behira min. *Goodness and love will follow me all the days of my life.*)
çandin, biçîne (1) to sow
 (2) to plant (Min ev dare çand. *I planted this tree.*)
çar (f) four (çar kujî *four corners / square*)
çarde (f) fourteen
çarê fourth [series]
çarêk one-fourth (çarêk gelen *quart*)
çarêkek (1) one-quarter
 (2) quarter (coin)
çarşemb (f) Wednesday
çav (m) (1) eye
 (2) [idiomatic] (Ser çava! *You're welcome!*)
 (3) [idiomatic] (Gelek çavê wê lê ye. *She is very devoted.*)
 (4) [idiomatic] (Li pêş çavêt dujminêt min *in the presence of my enemies*)
çav vekirî generous
çavik (m/f) burner (çavkê teboxê *stove burner*) (Çavka teboxê piç bî. *The stove burner/coil was damaged.*)
çawa how
çawan how (Çawan î! *Hi! / Good evening! / How are you?*)

çay (f) tea (çayê xane *tea / coffee house*) (Çay tehil e. *The tea is bitter / doesn't have sugar in it.*)
çek (f) check (Şirînê bu min çekek nivîsî bi sed dulara. *Şirîn wrote me a check for \$100.*)
çek (m) weapon
çekîç (m) hammer
çekmeçe drawer (çekmeça bîfê *dresser drawer*)
çelek u çespan able (ability) (Leqman gelek çelek u çespan e bu şulê xwe. *Leqman is very able / has a lot of ability to do his work.*)
çem (m) orchard
çemandin, biçemîne to fold
çend (1) how many (Te çend bazînk hene? *How many bracelets do you have?*)
 (2) how much (Ev çente bi çendê ye? *How much does this bag cost?*)
 (3) some
çend ca how often (Salê çend ca tu diçî dixturî? *How often in a year do you go to the doctor?*)
çend dir (1) how far (Medrese çend dir e? *How far is the school?*)
 (2) how long (Rêk çend dir e? *How long is the journey?*) (Rêk çend se'et in heta tu bigehî Texas? *How long does it take you to get to Texas?*)
çend salek dî (1) after many years
 (2) a long time
çendek (1) several (Çendek hat bîn kumbîne. *Several [people] came together.*)
 (2) some
 (3) a number
çendî [idiomatic] (Evro çendî heyve ye? Evroke bîst u çar e. *What's today's date? Today is the 24th.*)
çeng(il) (f) bell (Çenga derê *church bell*)
çente (m) (1) bag (çentê destî *hand bag*)
 (2) purse (Çentê min hat dizînê. Êkê ji min bir. *My purse was stolen. Someone took it from me.*)
 (3) duffel bag
çep left (Herre qolaça he u bu alê çepê çep de. *Go to the corner here and turn left.*)
çep (m) back / wrong side [of fabric]
çep dan, çep de to turn (“Turn left!” “Çep de bu alê çepê!”)
çeqmaq (f) cigarette lighter
çequk (f) pocket knife (Te çequk heyê? *Do you have a pocket knife?*)
çerçef (f) (1) sheet [bed linen] (Herre çerçefa xwe biguhurre. *Go change the sheet on [the bed].*)
 (2) dust ruffle
 (3) bed spread [thin-medium]

çeres (f) mixture of a variety of nuts and seeds
çerim (m) (1) skin [people, animals] (Çerimê minê zivir bî. *My skin was rough.*)
 (2) leather
çerwan pasture (Min li çerwanê kesik tewil didet. *He makes me lie down in green pastures.*)
çetal (f) fork
çete (m) someone hired by Saddam Hussein to do his dirty work for him; also called *caş(ik)*
çewir kirin, çewir bike to anoint (Te bi zeytî ez çewir kirim. *You anointed me with oil.*)
çewit (1) wrong
 (2) mistake
 (3) crooked
çê çî + wî; çî + wê [contraction]
çê bîn, çê be (1) to fix (Ez çê bîm. *I fixed it.*) (Îta te çê bî. *Your iron is fixed.*)
 (2) to repair
 (3) to get better [health] (Ew hêş ne çê bî ye. *She isn't better yet.*)
 (4) to happen (Ev şule ebed na çê bit. *This thing will never happen.*)
 (Wextê 11.9 ew teqîne çê bî li New York. *The explosion happened Sept. 11 in New York.*)
 (5) to make from (Tehîn ji kuncîê çê dibit. *Tehîn is made from sesame seeds.*)
Çê nabit! (*It's not good. It doesn't work. You must not do it.*)
çêkirî cooked [meat]
çêkirin, çêke (1) to make (Ez çî çêkim? *What shall I make?*)
 (2) to build
 (3) to produce
 (4) to fix / repair (Îta min bu min çêke. *Fix my iron.*) (Min îta te çêkir. *I fixed your iron.*)
 (5) to cook
 (6) to throw (a party) [idiomatic] (Ez dê heflekê bu Amy çêkim. *I'll throw a party for Amy.*)
 (7) to create
çêl (f) (1) cow (çêlperês *Hindu; cow worshiper*)
 (2) cattle
çênebî not ripe
çêng (m) wing
çêtir better (Ew çêtir e. *He's better.*)

çêydank (f) china cabinet (Kurrê Çîmenê çêydanka min rakir. *Çîmen's son set up my china cabinet.*)
çi what
çi cara never (Çi cara min u te şerr ne kirî ye. *You and I have never fought.*)
çi dem what time
çi dî what else (Çi dî wî hebî? *What else did he have?*)
çi kirin, çi ke to know what to do (Ez çî bikim? *What shall I do?*)
çi lê hatin, çi lê bê (were) to happen (Çi lê hat çinko ... *This happened because ...*) (Şula te çî lê hat? *What happened at [your] work?*) (Çi li te hat? *What happened to you?*)
çi ne nothing (Te çî kirî? Çi ne. *What did you buy? Nothing.*)
çi pê ne vêt It's no trouble for me; I can/will do it.
çi tişt anything
çi tişt ne nothing (Çi tişt ne bî. *There was nothing [I wanted to buy].*)
çi wext what time (çi wextê te hebit *whenever you have time*)
çiçik (m) breast
çifte (f) rifle (Te çifte heye? *Do you have a rifle?*)
çiklêt (f) candy that is wrapped in paper
çil (f) forty
çinîn (f) harvest (çinîna gula *the flower harvest*)
çinîn, biçine to harvest [vegetables, fruit]
çinko because (Em çûn dixturî çinko ez ne sax bîm. *We went to the doctor because I was sick.*)
çipçip dripping
çipik (f) drop
çips chips / potato chips
çiqil (m) branch (çiqilê darê *the branch of the tree*)
çira (f) (1) lamp
 (2) oil lamp
çirçira didana gnash teeth (Ahmed gelek çirçira didanê wî. *Ahmed gnashes his teeth a lot.*)
Çirîa duê November
Çirîa êkê October
çîa (m) mountain (çîa herifî *mudslide*) (Çîaêt Kurdistanê gelek xweş in. *The mountains of Kurdistan are beautiful.*)
çîçeluk (m/f) baby chicken / bird
çiçik (m) small brown bird
çînkî because
çîrok (f) (1) story ("Mam u Zîn" çîrokekî kevin e ji kelepurê Kurdî. *"Mam u Zîn" is an ancient romantic Kurdish legend in Kurdish history.*)
 (2) novel

çuk (f) knee
çul (m) (1) countryside; a place without people or houses
 (2) playground
 (3) pasture (Em çûîne çulekî gelek xweş. *We went to a nice pasture.*)
 (4) park (Em biçîn çulê. *Let's go to the park.*)
çunku because
çûn ... da, biçe (herre) ... da to enter (Ez çûm mezela wan da. *I entered their room.*)
çûn nav da, biçe (herre) nav da to get on
çûn selal, biçe (herre) selal to go up (Herre selal da biçîn binvîn. *Go up [there] so that we can go to sleep.*)
çûn sîkê, biçe (herre) sîkê to go shopping
çûn u hatin round-trip (ticket)
çûn, biçe (herre) (1) to go (Jinik çûn. *The women went [somewhere].*)
 (2) to leave (Ahmed çû. *He left.*)
 (2) to convert (Ew çû dînek dî. *He converted to another religion.*)

d

da (1) in [postposition] (Min kitêb kir çantê xwe da. *I put the book in my bag.*)
 (2) to [posposition] (Cindî yêt 'Îraqê hatin 'erdê Kurdistanê da. *Arab soldiers came to Kurdistan.*)
 (3) by means of
 (4) so (Vêca em biçîn da em drêngî negehîn. *So, let's go so we don't arrive late.*)
 (5) in order to (Ez hatim mala we da ez bixwînim. *I came to your house in order to eat.*)
 (6) during (Heyva sê da ez çûm Holende. *During March I went to Holland.*)
da dan, da bide (1) to push someone (Ez te da dim? *Shall I push you [on the swing]?*)
 (2) to ride (Min teyare da da. *I rode (in) the plane.*)
 (3) to drive (Min seyare da da. *I drove the car.*)
da ku (1) so that
 (2) in order to (Ez hatim mala te da ku ez dersê nîşa te bidim. *I came to your house in order to give you a lesson.*)
da'imî eternal (Bes Xwedê da'imî ye. *Only God is eternal.*)

da'îre (Ar) (f) office (da'îra mehkemê *courthouse*) (midîrê da'îrê *office manager*)
da'îren, da'îre to swallow (Van habka da'îre. *Swallow these tablets.*)
dad kirin, dad bike to judge (someone or something) (Xelkî dad ne ken da hîn ne êne dad kirin. *Don't judge or you too will be judged.*)
dadgeh (f) court(room)
dadwer (m) judge
daê mother [slang]
dagire (*see dagirtin*)
dagirtin, dagire to fill out (Vê wereqê bu me dagire. *Fill out this paper for us.*)
daîre (Ar) (1) circular
 (2) round
dan bi deyn, bi deyn bide (1) to lend (Ka deh dulara bi deyn bide min. *Lend me \$10.*) (Te deh dular hene? Tu bi deyn bidî min? *Do you have ten dollars? Will you lend it to me?*) (Min deh dular dana Nazdarê bi deyn. *I lent ten dollars to Nazdar.*)
dan êk, bide êk to unite (Bide êk. *Button it / sew it together.*) (Devê xwe bide êk. *Close your mouth [and stop fighting].*)
dan rê, bide rê to leave [for a long journey] (Dihî da rê. *He left yesterday.*)
dan u standin kirin, dan u standinê bike (1) to bargain (Ez dê dan u standinê gel xudanê dikanê kim. *I will bargain with the shopkeeper.*)
 (2) to discuss/to have a discussion (Min dan u standin li kir li gel mi'elima Hanaê. *I had a discussion with Hana's teacher.*)
dan, bide (1) to give [said if the desired object is near by] (Ka piçek avê bide min. *Give me some water [please].*) (Keseke ez ne dam şulî. *No one gave me any work / hired me.*)
 (2) to cause
 (3) to turn
dana wise (?)
danan, dane to finish [books only] (Şîrînê qamusa xwe dana. *Şîrîn finished her dictionary.*)
danqit (f) barley (Ez dê evroke danqitê çêkim. *I'll make barley today.*)
dapîrk (f) midwife
dar (f) tree [alive] (Hirmîkê ji darê bike. *Pick the pear [off the tree].*)

dar (m) (1) tree [dead]
 (2) wood
 (3) shepherd's rod

darçîn (f) cinnamon

darik (m) small piece of wood

daristan (f) forest (Rabî çû daristanê. *After that he went to the forest.*)

Daûd David

dawet (f) wedding

dawet kirin, dawet bike to celebrate

dawetî person who attends a wedding

daxwaz kirin, daxwaz bike (1) to request (Tu çawa ji min daxwaz dikî avê bideme te? *How is it that you request some water from me?*)
 (2) to demand

daxwez kirin, daxwez bike to order [something]

dayîn (f) (1) daycare (Min kiça xwe deyna def dayînekê. *I left my daughter with the daycare.*)
 (2) childcare (Dayînek kiça me xudan dicit. *The childcare took care of my daughter.*)
 (3) wet nurse
 (4) babysitter (Dê biçikê xwe deynin def dayînekê. *They'll leave their children with a babysitter.*)

dayk (f) mother

daykbisûn (f) conception (?)

de'mîn, bide'me (Ar) to have an accident (Heyva neh seyara min de'mî. *My car was in an accident in September.*)

debance (f) (1) pistol (Min fişek kirne di debanca xwe da. *I put the bullet in my pistol.*)
 (2) revolver (Leqmanî debance teqand. *Leqman shot the revolver.*)

def (1) to (Herre def derrgehî. *Go to the door.*)
 (2) with (Min kitêb deyna def te. *I left the book with you.*)
 (3) beside (Şirîn li def min rînişt. *Şirîn sat with / beside me.*)
 (4) near (Ez rîniştim def dîwarî. *I sat near the wall.*)

defter (f) (1) notebook (Deftera xwe bîne. *Bring your notebook.*)
 (2) workbook

deftera telefonê telephone book

deh (f) ten

dehf dan, dehf de to push (Kursîka xwe dehf de. *Push your chair.*) (Te ez dehf dam. *You pushed me.*)

dehmen pîs (1) adulterer
 (2) adulteress

dehmen pîsî (f) (1) adultery (Ez hês ji dehmen pîsîê nakim. *I don't like adultery.*) (Dehmen pîşî gelek ne baş e. *Adultery is very bad.*)
 (2) marital unfaithfulness

dehmen pîsî kirin, dehmen pîsî bike to commit adultery
 (Wî dehmen pîsî kir. *He committed adultery.*)

dehol (f) drum

dehwet (f) wedding

delal (1) cute [animals, babies, people]
 (2) dear [animals, babies, females] (Tu delala min î. *You (f) are my dear [friend].*)
 (3) nice [things, animals, females] (Ev kiçe delal e. *This girl is nice.*)

delal (m) realtor / real estate salesman (Ez çûm nik delalî da xanîek bi dest min bikevit. *I went to a realtor to get a house.*)

defîlê telefon phone book

defiv (f) circumstance (hevalê dilivêt teng *all-weather / faithful friend = friend of difficult circumstances [idiomatic]*)

dem (m) (1) when (unspecified time) (Demê tu hatî, ez ne li mal bîm. *When you came, I wasn't home.*)
 (2) season [time of year] (Ev demê salê xweş e. *This season is wonderful.*)

demar (m) (1) artery (demarê mezin *large vein*)
 (2) vein (demarê biçîk *small vein*)

dembusk (f) pin (Min dembusk êxiste kirasê xwe. *I put a pin in my dress [to hold it together].*)

demokratî (1) PDK (Kurdish political party)
 (2) democratic (Ez hês ji partî demokratî dikim. *I like the democratic party.*)

deng (m) (1) voice
 (2) sound (Dengê Şivanê xweş e. *Şivan's voice is wonderful.*)

dengê xwe dan, dengê xwe bide to vote (Min dengê xwe da. *I voted.*)

dengî kirin, dengî bike to make noise (Hana, dengî ne ke da ez binvim. *Hana, don't make noise so that I can sleep.*)

dengubas (pl) news (Dengubasê Kurdistanê evroke gelek xweş bî. *The news from Kurdistan was very good today.*) (Rojnama Xabatê behsa dengubasê ji der ve kirin. *The Xabat newspaper talks about the news from the outside world.*)

deqîqe (f) minute (Deqîqek dî, ezê êm. *Wait a minute; I'm coming.*)
 (deqîqekê *Wait just a minute.*)

der (m) door [said by villagers]

der êxistin, der êxe to beat

deramet (m) (1) plant
 (2) vegetable

deravê mirinê half dead

derbarê about (Pisîara min kirin derbarê biçîka. *She asked me about the children.*) (Buçî tu pisîara min dikî derbarê yê baş? *Why do you ask me about what is good?*)

derbas bîn, derbas bibe (1) to cross
(2) cross over (Ez derbas bîm. *I was finished / crossed over.*)

derbas kirin, derbas bike to cross over (Min derbas kir. *I crossed over.*)

derece (Ar) degree (Te çi derece heye? *Which degree (from college) do you have?*)

derêxistin, derxîne to cast out (Bi navê te me cin derêxistin. *We cast out demons in your name.*)

derhem (1) coin
(2) talent [money] (deh hizar derhemêt zîvî *10,000 silver coins*)

derheqê ... da against (someone or something) (Bilind xelet bî derheqê min da. *Bilind sinned [made a mistake] against me.*)
(Ez derheqê Şirînê da ne baş im. *I sinned against Şirîn.*)

derince (f, pl) (1) stairs
(2) stairwell
(3) steps

derizî cracked (Dîwar derizî ye. *The wall is cracked.*)

derîaç (f) lake

derîya (f) lake (Mala me li ser derîyaekê ye. *Our house is on a lake.*)

derkeftin (*see* derketin)

derketin, derkeve (1) to go out (Ez evro se'et êk ji mal derketim. *I left the house at 1:00 today.*)
(2) to leave (Ez ji Kurdistanê derketim sala 96. *I left Kurdistan in 1996.*)
(3) to fall away (Ew ji dînê xwe derket. *He fell away from his religion.*)

derman (m) (1) medicine (Te derman evroke xwarî ye? *Did you take your medicine today?*) (dermanê bêhinê yê bin çenga *deodorant*)
(2) poison (dermanê mişkî *mouse poison*)

dermanê bêhinê li bin çengê xwe kirin, dermanê bêhinê li bin çengê xwe bike to use deodorant

dermanxane (f) pharmacy (Emê çîn dermanxanê. *We're going to the pharmacy.*)

dernefis screwdriver

derpê (m) (1) boxer shorts (derpê ketin avê *swimming trunks*) (derpê cukî *briefs*)
(2) panties
(3) underwear

derrgeh (m) (1) door (Derrgehî bigire. *Shut the door.*)
(2) security gate

derrgehvanê hêpsîa jailor

ders (f) lesson (Sê cara heftîê da ders heye. *The less is three times a week.*)

dersuk (f) (1) hair scarf (Ez dersukê naêxim / nakim serê xwe. *I won't take my scarf off my head.*)
(2) sling

derun (m/f) (1) sense (Zivirîn bu deruna xwe. *He came to his senses.*)
(2) soul (Derûna min tenadibît *He restores my soul.*)
(3) spirit
(4) heart and soul
(5) conscience
(6) the inside
(7) the interior

derun biçîk (1) humble
(2) meek

derûn (*see* derun)

derxîne (*see* derêxistin)

derzî (f) (1) needle (derzî şîş(ik) *knitting needle*) (Derzîa min berze bî. *My needle was missing.*)
(2) injection / shot (Sisterê bu min derzî dana. *The nurse gave me an injection.*)

deshefik nan, deshefik bine to strangle

dest (m) (1) arm (Min destê xwe şikand. *I broke my arm.*) (Destê wê rîz in. *Her arms are naked. [Her clothes don't have sleeves.]*)
(2) hand (Ew destê wî yê rastê bî. *He was his right hand man [and did everything for him].*)
(3) wrist

dest gurk (f) glove

dest pê kirin, dest pê bike to begin (demê dest bi hijmarê di gel wan kirî *when he began the settlement with them*) (Dîmahîkê 'adê dest pê bike bixwe. *Begin to take [the birth control pills] when your period is finished.*)

destbra (m/f) friend

destek tisbeha (f) prayer beads (Min destek tisbeha bu deyka xwe kirî. *I did the prayer beads for my mother.*)

destê xwe pê da înan, destê xwe pê da bîne pet (vt) (Destê xwe bi pişikê da bîne. *Pet the cat.*)

destê xwe kirin, destê xwe bike (1) to feel
(2) touch (Wî destê xwe kir min. *He touched me.*)

desthelatî (f) (1) sovereignty
(2) dominance

destik (m/f) (1) bunch
 (2) handful (Min destike gula bu te înadî. *I brought you a handful of flowers.*)
 (3) handle (destikê derrgehî *the door handle*)

destîrî heye may [permission] (Destîrî heye ez pêt xwe drêj kim? *May I stretch out my legs?*)

destur (m/f) (1) law (Desturê vêrê dibêjit: lazim tu biçika ne qotî. *The law here says you may not beat your child.*)
 (2) regulation (destura Emrîka *American regulation / law*)
 (3) permission (Desturê bide min; ez dê çim. *Give me permission. I will leave.*)
 (4) authority (Desturê biserrmana Qur'an e. *The authority of the Muslims is the Koran.*)

deşt (f) (1) meadow
 (2) flat land

dev (m) mouth (Herre devê xwe bişo; devê te gelek pîs e. *Go wash your mouth off; it's dirty.*)

devê xwe kirin, devê xwe bike to take a bite / to eat from (Kesê devê xwe ne kir. *No one ate from / took a bite [of the cookie].*)

dew (m) salty, watery yogurt drink

dewam (f) work hours

dewire (f) (1) course
 (2) program (Dewira min xweş bî? *Was my program nice?*)

dewlemend rich (places, things) (Emrîke dewlemend e. *America is rich (a rich country).*)

dewlemendî wealth

dewlet (f) (Ar) country [political]

dexil (m) grain (Dexilê me ev sala ne baş bî. *Our grain was bad this year.*)

deybab (m) parents (Deybabêt Adarê sax in. *Adar's parents are alive.*)

deyk (f) mother (deyka ____ [name of oldest son] *name used to respectfully refer / call to a female peer*) (Deyka min gelek hês ji te dikit. *My mother really likes you.*)

deyn (m) loan (deynê xanî *mortgage*)

deyn kirin, deyn bike to borrow (Nazdar deh dular ji min deyn kir. *Nazdar borrowed ten dollars from me.*) (Min pare ji banqê deyn kir. *Yesterday I borrowed money from the bank.*)

deynan cihê wî / wê, deyne cihê wî / wê to put away (Qelemê xwe deyne cihê wî. *Put your pencil away.*) (Deyne cihê wê. *Put it [the shirt] in its place [in the closet / drawer, where it belongs].*)

deynan dan, deynanê bide to establish or found (Emrîke li sala 1776 hate deynan dinê. *In 1776 America was established.*)

deynan, deyne (1) to land (Teyarê deyna metarî. *The airplane landed at the airport.*)
 (2) to beat
 (3) to spank (Min deyna Hanaê. *I spanked Hana.*)
 (4) to put (Min qelemê xwe deyna ser mêtê. *I put my pen on the table.*)
 (5) to throw (a party) (Tu dê hêfla 'îd mîlada xwe deynî? *Are you going to throw a party for your birthday?*)
 (6) to create
 (7) to put down

deynatin, deyne to discard (Min karte deynat. *I discarded the card.*)

deyndar (m/f) (1) borrower (Ez deyndar im. *I'm a borrower.*)
 (2) indebted to (Ez deyndara Nazdarê me. *I'm indebted to Nazdar.*)
 (3) obligated to (Ez deyndara te me; te dersa Kurdî dan min. *I'm obligated to you; you gave me Kurdish lessons.*)

deynesor (f) dinosaur

dezgire (f) (1) engaged (Ev kurrke he desgirê daî ye. *This boy here is engaged.*)
 (2) fiance (Kî ye dezgira wî? *Who is his fiancé?*) (Kiça mamê wî dezgira wî ye. *His cousin is his fiance.*)

dezgurk (f) (1) mitten
 (2) glove

dezî (m) thread (dezîê didanê *dental floss*)

dêdîk (f) cradle (American)

dêhindîk seed (Em dêhindîka dixwînin. *We're eating seeds.*)

di ... da (1) in (di avê da *in the water*) (Ez naciî ne bîm di imtîhanê da. *I wasn't successful in the test.*) (Av di glasî da heye? *Is there water in the glass?*) (Ez hatim di seyarê da. *I came in the car.*) (Betenî di textî da ye? *Is the blanket in the bed?*)
 (2) into (di avê da *into the water*)
 (3) from (Ez dirrecifim di taê da. *I've been shivering from fever.*)

di ... ra (1) in
 (2) among
 (3) from (Ez di wêrê ra çûm. *I went from there.*)
 (4) through (Wî ew di pencerê ra havêt. *He threw it through the window.*)

di ... ve in (Kî li mezêlê ye? Kiçkê tê ve ye. *Who's in the room? The girl's in there.*)

di jur ve inside (Ew ma di jur ve. *He stayed inside.*)

di nav in the presence of

di nav ... da (1) among (Ew di nav wan da bî? *Was he among them?*)
 (2) in (Qelemê di nav kitêbê da ye. *The pen is in the book.*) (Kakil di

nav tovî da. *The seed is in the husk.*) (Mala zavaî sê çar bixçika yêt reng u reng dê kinit nav da. *The groom's family will put three or four sets of colorful clothes in it [the cloth].*)
 (3) at (Evroke ez di nav hefla Newrozê da bîm. *Today I was at the Newroz party.*)
 (4) with (Çi xweş e, bes Şîrîn di nav me da nîne. *It's nice, but Şîrîn isn't with us.*)

di nîva ... de between (Kitêba di nîva me de ye. *The book is between us.*)

di nîveka ... in the middle of (Ez dê di nîveka wan dabim. *I am there in their midst.*)

di'a (f) prayer

di'a kirin, di'a bike (1) to pray (Wî di'a ji Xwedê kir. *He prayed to God.*)
 (2) to praise

didan (m) tooth

didanêt xwe paqij ke bi taê didanî, didanêt xwe paqij kirin bi taê didanî to floss one's teeth

didanêt xwe paqij kirin, didanêt xwe paqij ke to brush one's teeth

difin (f) (1) nose (Difna min têt xwarê. *I have a runny nose.*)
 (2) trunk (of an elephant)

difin bilind proud (Şengê difin bilind e. / Difna Şengê bilind e. *Şengê is proud.*)

digme snap (on clothing)

dihî yesterday (dihî êvarî *yesterday afternoon*) (dihî siharê *yesterday morning*)

dijdaşe (m) Kurdish women's house dress (dijdaşe nivistinê *nightgown*)

dijî (1) against (Çend cara braê min dijî min xelet bit ez lê biburim? *How many times shall I forgive my brother when he sins against me?*)
 (2) opposite

dijwar (1) severe / angry
 (2) angry
 (3) tough
 (4) undisciplined / very active [child]
 (5) poisonous
 (6) biting [animals] (Pişîka min 'aqil e; ne dijwar e. *My cat is good; he doesn't bite.*) (Şer heyanek gelek dijwar e. *Lions bite animals a lot.*)
 (7) hot / sharp [spicy] (Ev filfîlkê te gelek dijwar e. *Your pepper is spicy hot.*)

dikan (f) (1) store (dikana mista'mil *thrift store*) (Herre dikana Hevalî. *Go to Heval's store.*)
 (2) shop (dikana 'omlê / sarafî *money changer's shop*) (dikana hêlaqî *barber shop*)

dikandar (m) salesman [for clothes, furniture, vacuum cleaners; not for cars] (Babê Xiludê dikandar e. *Xilud's father is a salesman.*)

diktur (m/f) (*see* dixtur)

dil ... paqij pure in heart (Dilê wê paqij e. *She has a pure heart.*)

dil ... teng depressed (Dilê min teng bi. *I was depressed.*)

dil (m) (1) heart (Nesaxîa dilî hebî. *He had heart disease.*)
 (2) compassion [idiomatic] (Dilê wî pê ve man. *His heart was filled with compassion.*)
 (3) pity [idiomatic] (Dilê wê sût bu wî. *He took pity on him.*) (Dilê xudanî ma bi wî kuîleî ve. *The master took pity on that servant.*)
 (4) like [idiomatic] (Bi dilê te ye, eve? *Do you like it?*) (Bi dilê te bî? *Did you like it?*) (Ne bi dilê min e. *I don't like it.*) (Ez hês jê nakim. *I don't like it.*)
 (5) love [idiomatic] (Dilê min ketê. *I fell in love with him.*)
 (6) encourage [idiomatic] (Ezê li ber dilê te deynim. *I'll encourage you.*)
 (7) comfort [idiomatic] (Ez dê dilê te xweş kim. *I'll comfort you(r heart).*)
 (8) hurt [idiomatic] (Dilê te namînit? *You feelings aren't hurt, are they?*) (Dilê wê ma. *Her feelings were hurt.*)
 (9) serious [idiomatic] (ji dil *serious[ly]*)
 (10) depressed [idiomatic] (Dilê min teng bi. *I was depressed.*)
 (11) faint [idiomatic] (Dilê wî girt. *He fainted.*)
 (12) longing [idiomatic] (Çend dilê wî diçûê. *He longed [to do something].*)
 (13) feel awful [idiomatic] (Dilê min xirab dibit; min divêt ez bihilavêjim. *I feel awful; I want to throw up.*)
 (14) broken hearted [idiomatic] dil şikestî (Mala mamê min dil şikestî ne çinko kurrê wan yê hatî kuştinê. *My uncle's family is broken hearted because their son was killed.*)
 (15) sad [idiomatic] (Rêsan dil ne xweş e çinko xoşka wê mirî. *Rêsan is sad because her sister died.*)
 (16) angry [idiomatic] (Dilê te ji mi maî ye? *Did I make you angry? / Are you mad at me?*)
 (17) unhappy [idiomatic] (Dilê te mînit? *Will you be unhappy?*)
 (18) secret [idiomatic] (Tiştêk yê di dilê te da ye best tu ne şêî bêjî. *You have a secret but you can't tell it.*)

dil girtin, dil bigire to faint (Dilê wî girt. *He fainted.*)

dil ketin, dil bikeve to fall in love (Dilê min ketê. Min hês jê kir. *I fell in love with him. I loved him.*)

dil şikestî broken hearted (Mala mamê min dil şikestî ne çinko kurrê wan yê hatî kuştinê. *My uncle's family is broken hearted because their son was killed.*)

dil xweş bîn, dil xweş bibe to rejoice (Em dil xweş bîn li Newrozê. *We rejoiced at Newroz.*)

dildar (1) sweetheart
(2) lover
(3) valentine

dilik (m) chain necklace with something hanging on it

dilup kirin, dilupa bike to leak (Kaşhanê banî dilupa dikit. *The roof is leaking.*)

diluvan (1) merciful
(2) sensitive

diluvanî (m) (1) mercy (Dê diluvanî hête rêka wan *They will be shown mercy.*) (Çakî u diluvanî li drêjîta jîana min dibine behira min. *Goodness and love will follow me all the days of my life.*)
(2) affection
(3) tenderness
(4) love (çakî u diluvanî *goodness and love / mercy*)

dinik seed (dinkeka xerdelî *a mustard seed*)

dinya (f) (1) world
(2) weather
(3) age [idiomatic] (li dumahîka dinyaê *at the end of the age / world*)

dir (f) place (Em çûine direkê xweş. *We went to a wonderful place.*)

dirandin, bidirîne to tear (Kaşezê bidirîne. *Tear the paper.*)

direw [*see drew*]

direwker liar (Ev mirove direwker e. *That person is a liar.*)

dirêzî (m) thread

dirist (1) complete
(2) correct
(3) perfect [situations, things]

dirist kirin, dirist (bi)ke (1) to make
(2) to correct (Kaşezê min dirist bike. *Correct my papers.*)
(3) to perfect
(4) to revise (Ezê kitêbekê dirist kim. *I'm revising a book.*)
(5) to accomplish (Hemî şulê xwe min dirist kirin. *I accomplished / finished all my work.*)
(6) to complete

dirîn (f) harvest (dirîna genimî *the wheat harvest*) (wextê dirînê *the time of the harvest*)

dirîn, bidrî (1) to harvest [grain, hay] (Bidrî genimî *Harvest the wheat!*) (Kê genim dirî? *Who harvested the wheat?*)
(2) to sew (Min 'ezî dirî. *I sewed the dress.*)
(3) (*see also dirîtin, bidrîne*)

dirîtin, bidrîne to be harvested [hay, grain] (Genim dirîtin. *The wheat was harvested.*)

dirrî hypocritical (Ew çî dirrî ye. *She's very hypocritical / two-faced.*) (Ew dirrî ye. *He's a hypocrite.*)

diryar (f) sewing (Ez gelek hês ji diryarê dikim. *I really like sewing.*)

diryar kirin, diryarê bike to sew (Ezê diryarê dikim. *I'm sewing.*)

diryarker seamstress (Ew cilka dirî. *She sews clothes.*)

distîr (m) permission (Desturê bide min; ez dê çim. *Give me permission; I will leave.*)

distur (m) (*see destur*)

diş (f) sister-in-law [sister of my spouse]

dixtur (m/f) (Ar) doctor (dixturê a'saba *neurologist*) (dixturê batinî *internist*) (dixturê biçîka *pediatrician*) (dixturê didana *dentist*) (dixturê jinka *women's doctor (Ob-Gyn)*) (dixturê heywana *veterinarian*)

Diyarbekir city in eastern Turkey; the capital of Turkish Kurdistan

diz thief

dizî (f) (1) theft
(2) stealing (Dizî ne ke. *Don't steal.*)

dizîn, dize to steal (Çentê min hat dizînê. *My purse was stolen.*)

dizîtobe (1) to steal
(2) to snatch away (Ew dê dizîtobit. *He will steal it / snatch it away.*)

dî (1) other (Çenta dî bine. *Bring the other purse.*)
(2) another
(3) next (roja dî *next day*) (heftêk dî *next week*) (heyvek dî *next month*) (salek dî *next year*) (Hana dê çit sefek dî. *Hana will go to the next class.*)

dîar bîn, dîar bibe (1) to appear
(2) to visit (Tu buçî tu ne dîar bî? *Why didn't you visit / haven't you visited?*)
(3) to know (Hês çî tişt dîar ne bî ye. *They still don't know [the result of the medical exam] yet.*)

dîar kirin, dîar bike (1) to explain (Ev jinke rêka mala te bu min dîar kir. *This woman told me how to get to your house.*)
(2) to clarify (Ka bu min dîar ke. *Please clarify this for me.*)

dîarî (f) gift
dîf ... ra with (Ez çûm dîf wan ra. *I went with them.*)
dîfk (m) tail
dîkêl (m) (1) pollution
 (2) smoke from a fire
dîkil (m) rooster
dîmahîk (f) (1) end (dîmahîka rêkê / çîrokê / axiftinê / mirovê [her mirine] *the end of the journey / story / conversation / people [because they all died]*) (Ev çîroke bi dîmahîk hat. *This story came to the end / is at the end.*)
 (2) last (Min navê xwe dîmahîka perrî nivîsî. *I wrote my name on the last page.*)
dîn insane
dîn (m) religion (Dînê te çi ye? *What is your religion?*)
dînar (f) (1) denarius
 (2) diamond (playing card)
 (3) Iraqi money (Te çend dînarêt heyn? *How many dinars to you have?*)
dîng (m) hump (of a camel)
dîr (1) distant
 (2) far
dîr kirin, dîr bike to separate (Gunnehêt me me ji Xwedê dîr dikit. *Our sin separates us from God.*)
dîrketin, dîrkeve to rebel (Heker tu ji Xwedê dîrketî ... *If you rebel against God ...*)
dîsa again [used in telling a story or making a point] (Dîsa tu hatî def me. *You came to our [house] again.*)
dîtin nav ... da, bibîne nav ... da to tour (Min hêmî cih dîtin yê nav White House da. *I took a tour of the whole White House.*)
dîtin ve, bibîne ve to find (again)
dîtin, bibîne (1) to meet (Min ji nî dît. *I just met him / her.*) (Min hevala xwe li sîkê dît. *I met my friend at the market.*)
 (2) to see (Evroke dinya mij e; ez taze nabînim. *It's foggy today; I can't see very well.*)
 (3) to find (Min qelemê xwe dît. *I found my pen.*)
dîv after
dîv da (1) then
 (2) after that (Emê dersê xwînîn. Dîv da em dê xwarinê xwîn. *We're studying the lesson. After that we'll eat.*) (Ê, dîv da... *So, after that ... [in listening to someone tell a story].*)
 (3) later (Ez çûme mala Nîazê. Dîv da ez çûm mala Adarê. *I went to Nîaz's house. Later I went to Adar's house.*)

dîwar (m) wall
dolme (Ar) (f) stuffed vegetables
dondirme (Ar) (f) ice cream (Biçîkêt min hês ji dondirmê dikin. *My kids like ice cream.*)
doxîn suspenders
dreng late (Ez dreng ji xew rabîm.. *I got up late.*) (Ez dreng geheştim dersê. *I arrived late for the lesson.*) (Em drengê geheştine pasê. *We got to the bus too late.*)
drew (f) (1) lie [sin] (Drew gunneh in. *Lies are sin.*)
 (2) false (drew sînd *false testimony*) (Bi drew sînd ne xwe. *Don't give false testimony.*)
drewîn liar (Mala drewînî sut, kesê bawer ne kir. *The liar's house burned down; no one believed him. "Never cry wolf."*)
drewker liar (Ev mirove drewker e. *That person is a liar.*)
Drewa Nîsanê ye! April fools!
drêj (1) high [trees] (Ev dare gelek drêj e. *This tree is really high [tall].*)
 (2) tall [people, animals] (Deyka min kort e; babê min drêj e. *My mother is short; my father is tall.*)
 (3) long [clothing, carpet, bread] (Kirasê min drêj e. *My dress is too long.*)
drêj bîn, drêj bibe to grow up [people] (Cuan zî drej bî. *Cuan grew up fast.*)
drêjahî (f) length
drêjî (f) length (Drêjîa mêza te çend e? *How long is your table?*)
dubare kirin, dubare bike to repeat (Dubare ke. Ezê tê gehim. *Repeat it; then I'll understand.*) (Ew her tiştê bê raman dubare dikit. *She repeats everything without thinking / babbles.*)
dugim (f) button [mechanical] (Dugimê bidewsîne. *Push the button.*)
duhin (m) shortening / solid cooking fat (duhinê leşî *body lotion*) (duhinê tavê *sunscreen*) (Piçek duhinî bike binê qazanê da u rijdêt xwe biqelîne. *Put some shortening in the pan and fry the tiny noodles.*)
duhinî tavê xwe dan (da tav leşê wê ne sojit), duhinî tavê xwe bide (da tav leşê wê ne sojit) to put on sunscreen
duhî yesterday
dujmin (m) (1) adversary
 (2) enemy (Ew dujminê min e. *He is my enemy.*)
dulab (f) china cabinet (Kurrê Çîmenê dulaba min rakir. *Çîmen's son set up my china cabinet.*)
dular (m) dollar (735 dular \$735)
dumahî (f) the last (people / ones) (Dumahîê dest pê bike. *Begin with the last ones.*)
dur (1) almost
 (2) nearly

(3) before (dur se'et pênc *almost 5:00*)
 (4) distant
 (5) far away
dur (f) (1) appointment
 (2) turn (Dura min e ez biçim medresê. *It's my turn to go to the school [for carpool].*) (Dura te ye tu bixwîl. *It's your turn to eat.*) (Kengî dura min e tu dê seyarê nîşan min dî? *When is it my turn for you to give me driving lessons?*)
dur man durî (1) all around (Dur man durî min gul in. *The flowers are all around me.*)
 (2) surround (Dur man durî min biçik bîn. *The children surrounded me.*)
duşin (f) (*see dirîn*)
duşav (f) date syrup (Tehîn u duşav xweş e. *Tehîn and date syrup is delicious.*)
duşek (f) (1) mat [foam mat used for sitting on the floor]
 (2) mattress (duşeka êk mêt e *single bed mattress*) (duşeka dû mêt e *double bed mattress*) (duşeka req *box spring*)
duşemb (f) Monday (Ez dê duşembê êm mala te. *I'll come to your house on Monday.*)
dutmam (f) cousin [father's brother's daughter]
duwam kirin, duwam bike to put in (Wê sefa êkê duwam kir ji ber 'emirê wê ye sefa êkê bî. *She was put into the first grade because that her age was the first grade age.*)
duzbe day after tomorrow
duzde (f) twelve
dû (f) two (dû sed *two hundred*) (dû cara *twice*)
dûê second [series] (bu cara dûê *for the second time*)
dwazde (f) twelve

e

-e to (Ez diçime sîkê. *I go to the market.*)
 e yes
eθaθê malê furniture
ebed never (Ev şule ebed na çê bit. *This thing will never happen / It's impossible.*) (Ebed ez li gel te naaxivim. *I'll never talk to you.*) (Ebed ez ji te sil nabim. *I'll never be upset with you.*)
ebedî eternal (Bes Xwedê ebedî ye. *Only God is eternal.*)
Ebîya Abijah
ecêb (1) perfect [very nice situations or things]
 (2) (Mala te! Pa Çîmen ecêb e! Çû, gote xoşkê min Nazdarê

'emeliatê çêkirî. *Oh my goodness! Why did Çîmen do that? She went and told my sisters, "Nazdar had surgery."*)

ecinebî (Ar) foreign (Ez ezmanê ecinebîa zanim. *I know a foreign language.*)
ecinebî (m/f) (Ar) (1) foreigner
 (2) foreign language
edab pus (infection) (Kulka çîçkê min edab jê têt. *My breast lump is oozing pus (infection).*)
edeb (f) (1) bathroom
 (2) toilet
 (3) literature
edebxane (f) (1) toilet
 (2) bathroom
edepsis shameless (Ev biçîke edepsis e. *This child is shameless.*)
edir (m) (*see 'edir*)
edî insect
Efrîqîa Africa
eha husa likewise
ehl (m) people
ehlî private school
ehîfâl love??
ehya (f) biology
ekîd (Ar) (1) yes
 (2) of course
 (3) certainly
 (4) apparently (Seyara wê de'mî, bes ekîd çi li wê ne hati ye. *She had a car accident, but apparently she wasn't hurt.*)
El 'efu. I'm sorry.
elaqe (f) hanger
elêhî eselat weselam (Ar) [phrase said after a prophet's name is spoken]
Elîzabêt Elizabeth
elmes (f) diamond [gem]
Elu? Hello? [said when answering the telephone]
elwan (f) (Ar) crayon
elwan kirin, elwan bike to color
em (1) we [direct]
 (2) us [direct]
emir (m) order
emîn (1) close [to one's heart] (Hevala min emîn e. *My friend is a very close friend.*) (Bawerîa min pê têt çîngo emîn e. *My beliefs are very close to my heart.*)
 (2) safe [places or people] (Em emîn in. *We're safe.*)

emîr (m) prince
emîre (f) princess
Emrîka Jêrî North America
Emrîka Jurî South America
Emrîke (f) America
Emrîkî (m/f) American
emud feqerî spinal column
enenas pineapple
enî (f) forehead
enîşk (f) elbow
Enqere Ankara
Enşallah. (Ar) “if God wills” [said as a response to many things (e.g.,
A: Will you come to the party? B: Enşallah)]
erd (m) (*see* ‘edir)
Errarrat (f) Aarat
Erxîlaw Archelaus
erzan (1) inexpensive
(2) cheap
erzanî (f) sale [price] (Ev kirase min di erzanîê da kirrî. *I bought this dress on sale.*)
erzaq food [groceries] (Tu çûî, te erzaq wergirt? *Did you go get the free food?*) (Min erzaq kirrî. *I bought food.*)
erzînk (f) chin
Es’ia Isaiah
esle’ bald
Espanî Spanish
etek (m) slip
Eşîr Asher
eşkemce torture (da eşkemce biden *in order to be tortured*)
ev (m/f) (1) this [direct] (ev sale *this year*) (ev şeve *tonight*)
(2) these [direct]
eva (m/f) these [oblique]
evan (m/f) these [oblique]
evê (f) this [oblique]
evî (m) this [oblique]
evîndar (1) sweetheart (Dilnaz u Şerzad bi evîndarî şî bi êk u dû kirin.
Dilnaz and Şerzad were sweethearts and got married.)
(2) lover
(3) valentine
evro today (evro sîharê *this morning*)
evroke today
evru today
evruke today

Evxanî Afghan
Evxanistan Afghanistan
ew (1) he [direct] (Ew ket. *He fell.*)
(2) she [direct] (Ew hat. *She came.*) (Ew hat mala me. *She came to our house.*)
(3) it [direct] ([Ew] li ser kursîkê ye. *It’s on the chair.*)
(4) they [direct] (Ew çûn. *They left.*)
(5) that [direct] (ew kitêb *that book*)
(6) those [direct] (ew piskuêt *those cookies*)
(7) him [direct] (Min ew dît. *I saw him.*)
(8) her [direct] (Wî [ew] xwast. *He asked her [to marry him].*)
ewa (1) that which (Ew dê êt u ewa di dilê wî da hafî ye çandin dê dizîtobit. *He will come and steal that which was sown in his heart.*)
(2) those [oblique]
ewan those [oblique]
ewê (f) that [oblique]
ewî (m) that [oblique]
ewil firman adverb
ewil nav adjective
ewilî (Ar) (1) in the beginning (Ewilî Xwedê edir çêkir. *In the beginning God created the earth.*)
(2) first (series) (biçîke ewilî *the first child*)
ewir cloudy
ewir (m) cloud
ewns ounce
ewraqe paper in reams
Ewrope Europe
exbar (f) (Ar) news (Exbarêt Kurdistanê çi hene? *What’s the news from Kurdistan?*)
exisai specialty (Tu exisai î? *Are you a specialist (doctor)?*)
(Tu biçî exisai? *Will you specialize?*)
exlaq (m) (1) purity (Exlaqê Dilnazê delal e. *Dilnaz’s purity is beautiful.*)
(2) moral (Ev miruve bi exlaq e. *This person is pure / moral.*)
exta reş (1) chalkboard
(2) blackboard
eşeleb (m) (Ar) majority (Mîsil eşelebê wê Kurd in. *Mosul has a Kurdish majority.*)
ey an expression of emphasis in conversation (ey heval *friend*)
(ey mamusta *teacher*)
eyle (f) (Ar) family (Navêt di hemî eyla xwe bidin me. *Give me the names of all your family members.*)

ez (1) I [direct] (Ez hatim. *I came.*) (Ez dê çim. *I'll go.*)
 (2) me [direct] (Te ez dîtîm. *You saw me.*)
ez benî “sir” or “ma’am” [said by men]
ez gurî (te bim) [said by a mother to her children; sweetie, honey, etc.;
 literally “I hope I’m sacrificed for you.”]
ez xudam “sir” or “ma’am” [said by women] (Bila ez xudam ezê şulê te
 hemîa kim. *Certainly, ma’am, I’ll do all your work.*)
ezelat (m) muscle
ezman (m) (1) language (Ezmanê min Kurdî ye. *My language is
 Kurdish.*) (Ezmanê Kurdî baxive. *Speak Kurdish.*)
 (2) tongue (Ezmanê wî fis e. *He has a speech impediment.*)

ê

êdî never (Qet êdî ez naçime Tirkîe. *I’ll never go to Turkey.*) (Tûbe bit
 ez êdî drewê bikim. *I promise to never lie.*)
êdz aides (HIV)
êk (f) one (êk ji heştê *one-eighth*) (êk êk *one after the other*) (Biçîk êk
 êk çûn medresê. *The kids went to school one after the other*) (êk carî *one
 time* Êk carî ne! *Not one time! [it’s impossible]*) (êk ji wan *one of them*)
êk rê one-way (ticket)
êk ser (1) at once
 (2) immediately (Heker tu geheştî malê, êk ser telefuna min bike. *When
 you get home, call me immediately.*)
êk u dû each other [used in conversation, as in talking to or agreeing
 with each other]
êkê (1) first [series]
 (2) someone (Êkê da min. *Someone gave it to me.*)
êkşemb (f) Sunday
êlek (m) (1) bra
 (2) vest
Êlîas Elijah
êş sick people (California êş zehî in. *There are a lot of sick people in
 California.*)
êş (f) pain (êşa zirav *tuberculosis*) (Êşa nesaxîa kete di nav milletê. *The
 pain of the sick was felt by the people.*)
êşan, biêşe to have pain (Dihî zikê min êşa. *My stomach hurt
 yesterday.*) (Ez ketim, ez êşam. *I fell [down] and got hurt [something
 caused me pain].*)
êşandin hurt

êşandin, biêşîne to hurt (Kê tu êşandî? *Who hurt you?*) (Hikmetê biraê
 min girtin, êşandin. *The government arrested my brother and hurt him.*)
êvar (f) (1) afternoon (Se’et sê heta pênc êvar e. *3:00 - 5:00 is
 afternoon.*)
 (2) evening
êvarî (f) afternoon/early evening (se’et çarî êvarî *4:00 in the afternoon*)
 (her êvarî *every evening*) (Êvarî emê timbelê bajoîn. *We’ll drive in the
 afternoon.*) (Evro êvarî ezê çim sîkê. *This afternoon I’ll go to the market.*)
Êvarî bi xêr. Good afternoon. [said from 3 - 5 p.m.]
êxistên, bêxî to put in (Min patrî êxistê. *I put the battery in (the fire
 alarm).*)
êxistin di nav da, bêxe di nav da to put together
êxistin, bêxe to take off (Min fanêle êxist. *I took off the t-shirt.*) (Ez
 dersukê naêxim serê xwe. *I won’t take the scarf off my head.*)
êxtîar old (very) people

f

fafun aluminum
fax faks (f) (Vê wereqê bu min faks ke. *Fax this paper for me.*)
falçî palm reader
falik (f) small pieces (Eve falika te ya kêkê. *Kêka xwe bike falik falik.
 This is your piece of cake. Divide it into small pieces.*)
fanêle (m) (1) t-shirt
 (2) undershirt
fas (f) cleanser [for scrubbing]
fasolî (f) white beans (fasolî yêt ter *green peas*)
 (fasolîa qodîka *refried beans*)
fast (f) bleach
fehîs (f) (Ar) (1) medical examination (da fehîsa min bikit *in order to
 have an exam*)
 (2) medical test (fehîsa xwînê *blood test*)
 (3) pregnancy test (Hadarê fehîs çêkir. *Hadar did a pregnancy test.*)
fehîs kirin, fehîs bike to check
felañ (m) (Ar) peasant (in feudal societies) (Felañ bu axaî şul dikin.
Peasants work for the agha.)
Fenuêl Phanuel
feqîr (a person who is) very wonderful
feqîr (m/f) poor

feraş (m) (1) janitor
(2) custodian
(3) busboy

ferawle (f) strawberry

feriq (f) (1) different (Feriqê hey. *There are differences.*)
(2) different from (A feriq e ji B-ê. A (is) different from B.) (A ji B-ê ferqa. A (is) different from B.)
(3) difference between (Feriq navbeyna biçîka wê u kiça wê yazde heyv e. *There are 11 months difference between her baby and her daughter.*) (Çi feriq heye di nav beyna kiçê u kurrî da? *What's the difference between girl and boy?*) (Çi feriq beyna wan da heye? *What's the difference between them?*)
(4) opposite from (Ez ji Nîazê feriq im. Ez ze'îf im; ew qelew e. *I'm opposite from Nîaz. I'm thin; she's fat.*) (Bilind feriq e ji kort. *Tall is opposite from short.*)

feriq u cidahî nav miruva racial discrimination (Ez ne gel wan im ewêt feriq u cidahî nav miruva dikin. *I'm against racial discrimination.*)

Ferisî (m) Pharisee

ferişa ser textî (1) bedspread [thin]
(2) quilt
(3) comforter

ferman (f) (1) commandment
(2) order
(3) decree

ferqo cidahî kirin, ferqo cidahî bike to favor (Xanê ferqo cidahî dikit navbeyna bîkê xwe da. *Xanê favors some of her daughters-in-law over the others.*)

ferrheng (m) dictionary

fesîh pure (e.g., a language without foreign words)

fetisandin, bifetise to suffocate (Dê fetisit. *He'll suffocate.*)

fetisandin, fetisîne to strangle (Ez te fetisînim. *I'm strangling you.*) (Te ez fetisandim. *You strangled me.*)

feyde (m/f) (1) profit (bê feyde *without a profit*) (bi feyde *for a profit*)
(2) winner (Ew feyde bî. *He was the winner.*)
(3) fruitful (Şulê min feyde yê têda hey bu Kurda. *My work is fruitful among the Kurds.*)
(4) useful
(5) interest
(a) (Ez gel wê çûm sîkê çinko feydê min tê da bî. Min bi xwe kirasek kirî. *I went to the market with her because I was interested in doing that. I bought a dress for myself.*)

(b) (Banq feydê dideynit ser parêt min. *The bank gives me interest on my money.*)

feydek jê kirin, feydek jê bike to gain (Min \$100 hebîn. Min kirin şulî ra. Min feydek jê kir. *I had \$100. I invested it and gained more money.*)

fêqî (m) fruit

fêr (f) (1) learning
(2) understanding

fêr bîn, fêr bibe to learn (Bi xwe ji min fêr bibin. *Learn from me.*)

fêr kirin, fêr bike to learn (Min xwe fêr kir Kurdî. *I learned Kurdish.*)

fêr kirin, fêr bike to teach

fêrr (f) curling iron

fêyezana (f) (1) flood
(2) tidal wave

fi'el (Ar) (m) verb

fihusat vaccination??

fihusat standin, fihusat biştîne to vaccinate??

filan some (Filan şevê emê êin mala we. *Some evening [this week] we'll come to your house*)

Fileh (m/f) Christian

filfil (m) pepper (filfilêt reş *black pepper*) (filfil u biharet *spices*) (filfîlkê sorr *red pepper*)

filfîlik (m) (see filfil)

Filhanî Assyrian (language)

filim movie

filis (f) Iraqi money [coins]

fincan (f) small Kurdish coffee cup

findeq (f) (Ar) hotel

Fir'ewn (Ar) Pharaoh

firçe (f) (scrub) brush (firça didana *toothbrush*) (firça mijîlanka *mascara*) (firça tuzê *feather duster*)

firçe kirin, firçe ke to brush teeth

fireh (1) loose
(2) wide

firehî (f) width (Firehîa wê hevde înc e. *Its width is 18 inches.*)

firêkirin, firêke to send (Wî firêkiri ne di nav rezî da. *He sent them to the vineyard.*)

firêzer freezer

firîşte (m/f) angel

firman (m) verb

firne (f) (1) oven (Min mirîşka xwe di firnê da çêkir. *I baked chicken in the oven.*)
 (2) bakery

firneçî (Ar) baker

firotin, bifiroşe to sell (Min pezê xwe ne firotin. *I didn't sell my sheep.*)

firr dan, firr bide to fly/hop simultaneously [like a chicken]

firrîn, bifirre (1) to fly (Ew teyrike firrîn ser darê. *That bird flew to the tree.*)
 (2) (*see also* teyare)

firuk airplane

firutin, bifiruşe to sell

fis impediment (speech) (Ezmanê wî fis e. *He has a speech impediment.*)

fisteq (f) (1) nuts (fisteq ebîd *peanuts*) (Herre fisteqa bîne. *Go bring some nuts.*)
 (2) pistachio

fî kirin, fî ke to put an X in a box [e.g., on an application]

fîl (m) elephant (Fîlî dû guhêt mezin yê heyn. *The elephant has two large ears.*)

fîrfîrk (f) smoke detector (fîrfîrka agirî *fire detector*)

fîşek (f) bullet (Min fîşek kirne di debanca xwe da. *I put the bullet in my pistol.*)

fit (1) tape measure
 (2) fine [slang; very casual] (Ez fit im. *I'm very well!*)

fitamîn vitamin

fîter (m) mechanic

fitfit kirin, fitfitê bike to whistle

fitînî (f) whistle

fizîa (f) physics

fravîn (f) lunch

Frensa (f) France

Frensî (f) French (language, people)

futka ser textî (1) bedspread [medium]
 (2) quilt
 (3) comforter

g

ga (m) bull

garran (f) (1) flock [cows, sheep, goats, horses, camels] (Min garranek pezîê hey. *I have a flock of sheep.*)
 (2) herd [cows, sheep, goats, horses, camels]

gava when [specific time] (Gava tu hatî def min, ez ne xweş bîm. *When you came to me, I was sick.*)

gavan shepherd (who stays at the farm and doesn't go out with the sheep)

gavê (1) for now (Dersa Kurdî vê gavê bes e. *I've had enough of the Kurdish lesson for now.*)
 (2) for the present
 (3) for the time being
 (4) so far

gaz (f) kerosene

gazinde ... kirin, gazinde ... bike (1) to complain (Min gazinde ji xoşka xwe kirin. *I complained about my sister.*) (Min gazinda te kir. *I complained about you.*)
 (2) to reproach / show someone where they are at fault (Gazinda jê bike. *Show him where he is at fault.*) (Min gazinda te kir. Buçî tu naçî nik me? *I reproached you. Why don't you come visit us?')*

gazî kirin, gazî bike (1) to call [someone's name] (Gazî deyka xwe ke. *Call your mother.*)
 (2) to summon [someone] (Gazî Îsaî kir u pisîar jê kir ... *He summoned Jesus and asked him ...*)
 (3) (*see also* hewar kirin)

gazînû (f) tea house

gehan, bigehe (1) to arrive
 (2) to reach
 (3) to create

gehandin, bigehîne (1) to pick up [transport] (Tu dê şê min bigehîni? *Can you pick me up (in your car)?*)
 (2) to take (Şirînê ez gehandim def dixturî. *Sirîn took me to the doctor.*) (Evê kaşezê bigehîne Dilnazê. *Take this paper to Dilnaz.*)

geheştin, bigehe (1) to arrive (Em geheştin. *We arrived. [Said when you get to where you're going.]*) (Em drengî geheştine pasê. *We got to the bus too late.*)
 (2) [idiomatic] (Kiçik digehit, yê geheştî, yê li şîa ye. *The girl "has arrived", is "ripe", should get married.*) (Ew digehet. / Dengê wî bedil dibit. *He has arrived. / His voice is changing.*)

geheştin, bigehene to inherit (Tiştê wê dê gehene min. *I will inherit her things. / Her things will come to me.*) (Mîratê wî geheşte min. *I inherited his things. / His things came to me.*)

geheştî (1) ripe [fruit]
 (2) adolescent [idiomatic] (Kiçik u kurrik geheştî ne. *The girl and boy are "ripe." / The girl and boy are adolescents / going through adolescence.*) (Kiçik digehit, yê geheştî, yê li şîa ye. *The girl "has arrived", is "ripe", should get married.*)

gel with (Ez gel Nadîraê çûme mektebê. *I went to school with Nadîra.*)
(Ezê gel axivim. *I want to talk with her.*)

gelek (1) very (Ez gelek ne xweş im. *I'm very sick.*)
(2) many
(3) lots of (Min gelekê hene. *I have lots [of them].*)
(4) plenty of (Min gelek cilik hene. *I have plenty of clothes.*)

gelek di nav sala da old [people] (Her dû gelek di nav sala da çû bîn.
They were both well along in years.)

gelen gallon

gel êk with (*see also li gel êk*)

gel êk çûn, gel êk bice (herre) to carpool (Ez u tu li gel êk biçîn şulî.
Let's you and me carpool to work.)

gemirandin, bigemarine to rub (Destê xwe gemirand. *She rubbed her hands.*)

gemî (f) ship (Gemîêt leşkerê Emrîkî geheştin di behrê da. *The US Army ships reached the ocean.*)

genc (m/f) teenager

genim (m) wheat seed (genim şamî *corn*)

gerac (f) (parking) garage (Bê gerac e. *It doesn't have a garage.*)

gerim (1) hot
(2) warm (temperature) (Min gerim e! *I'm hot!* [*The temperature is hot to me.*]) (Gerim e. *It's hot.*)

gerim (f) heat (weku hişikîa germa havînê *like the heat of summer*)

germav (f) hot springs

gerr(h)an, bigerre to look (for something) as you go out and return

gez yard

gezu cashew

gêj (1) dizzy (Ez gêj im. *I feel dizzy.*)
(2) unconscious

gêlaz (f) cherry

gêsik (f) broom [villagers say this]

gêsik kirin, gêsik bike to sweep

gêzer (f) carrot

gifik (m) area where the trash is located

gihark (m) earrings

gijluk (f) (1) hail (Gijluk hate xwarê. *Hail came down.*)
(2) hail storm

gijluk barîn, gijluk bibare to hail (Evroke gijluk dibarît. *It's hailing today.*)

gilêş (m) (1) trash
(2) garbage

gilop (f) light [bulb or lamp] (Gilopa min sutî ye. *My light's burned out.*)

gindur (m) melon [cantaloupe, honeydew]

gir big (Ev nukêt he gir in. *These chick peas are big.*)

giran (1) expensive
(2) heavy (Barê min giran e. *My bundle is heavy.*)
(3) deep (nivistinekî giran *a deep sleep*)
(4) difficult (Inglîzî giran e. *English is difficult.*)

gîrar (f) (1) bulgar [cooked]
(2) rice [cooked]
(3) (general term for grains)

girêdan, bigirêde (1) to fasten (Qaîşê xwe bigirêde. *Fasten your seat belt.*)
(2) to buckle (Min qaîşa sendelêt xwe girêda. *I buckled my sandals.*)
(3) to bind (Her tiştêkê hîn bi erdî ve girê didin, dê bi esmanî ve ête girêdan. *Whatever you bind on earth will be bound in heaven.*)
(4) to tie (a knot) (Min berxikê xwe girêda. *I tied my lamb.*)
(5) to cover (Serê xwe girêde. *Cover your head.*)

girêçk (f) knuckle

girêk knot

girêle bîn, girêle bibe to roll [active voice] (Ez girêle bîm. *I rolled [down the hill].*)

girêle kirin, girêle ke to roll [passive voice] (Min girêle kir. *I made [him] roll [down the hill].*) (Herre xwe girêle ke. *Go roll yourself [down the hill].*)

girî (f) (1) weeping
(2) crying (Girîa wê ne xweş bî. *Her crying was awful.*)

girîn, bigirî to cry

girtin, bigire (1) to close (Derrgehî bigire. *Close the door.*)
(2) to hold (Hana ne vêt ez destê wê bigirim. *Hana doesn't want me to hold her hand.*)
(3) to grab (Vê kitêbê bigire. *Grab this book.*)
(4) to take (Vê kahezê bigire. *Take this paper.*)
(5) to commit [something to someone] (Em rojîa bu Xwedê digirîn. *We commit the days to God.*)
(6) to catch (Min dû masî girtin. *I caught two fish.*) (Min tepik girt. *I caught the ball.*) (Min tepik ve girt. *I caught the ball.*) (Vê tepkê bigire. *Catch this ball.*)

gîa (m) grass

gîan (m) body (Gîanê min li erdekî çûl u hişik u bê av xerîbîa te diket. *my body longs for you, in a dry and weary land where there is no water.*)

gîfank (m) (1) trash
(2) dump

gîz (f) walnut

gîzahind(ê) (f) coconut
gîzan (f) razor (blade) (Min gîzan divêt. *I want a razor.*)
gîzan kirin, gîzan bike to shave (Zikê pişikê gîzan kir. *The cat's stomach was shaved.*)
goşt (m) (1) flesh
 (2) meat (goştê çêlê *beef*) (goştê barazî / goştê xinzîrî *pork*) (goştê berxê *lamb*) (goştê heywanê avê *seafood*) (goştê teyrî *poultry*)
gotin, bêje (1) to say (Belê ez dibêjime hewe *but I say to you ...*)
 (2) to tell (Min got Rojî, "Bixwe." *I told Roj, "Eat."*)
 (3) to dictate
 (4) think [idiomatic] (Ez dibêjim. *I think so.*)
 (5) (*see also* gûtin, bêje)
grrovirr (1) round (Ev grrovirr e. *This is round.*)
 (2) circular
grrovirr (f) circle
grrovirr kirin, grrovirr bike to circle
guh (m) ear (Guhêt wî giran e. *He's hard of hearing.*) (Guhê min diêşit. *My ear hurts.*)
guh lê bîn, guh lê bibe to hear (Min guh li te ne bî. *I didn't hear you.*)
 (Hewe ya guh lê bûî ku ya hatî ye gûtin ... *You have heard that it was said ...*)
guhan (f) milk sack [of a sheep, goat, cow] (guhanêt pezî *sheep teats*)
guhark (m) earring [said by villagers] (Xwezî ez guhark bama guhê te bama. *I wish I were an earring in your ear. / "I wish I were a fly on the wall."*)
guharrtin, biguhurre (1) to change (Min destikêt derrgehî guharrtin. *I changed the handles of the [refrigerator] door.*) (Herre çerçefa xwe biguhurre. *Go change the sheet on [the bed].*)
 (2) to replace
guhastin, biguhêze to bring (the bride to the wedding) (Em dê bîka xwe guhêzîn. *We'll bring our bride.*)
guhdar (m) listener
guhdarî kirin, guhdarî bike to eavesdrop (Hevalê te piş derrgehî guhdarîa te kir. *Your friend eavesdropped [on your conversation] behind the door.*)
guhê xwe dan, guhê xwe bide (1) to listen (to) (Guhê xwe bide min! *Listen to me!*) (Hevalê te piş derrgehî guhê xwe da te. *Your friend listened [to your conversation] behind the door.*)
 (2) to take care of (Cîrana min guhê xwe dit pişikê min. *My neighbor takes care of my cats.*)
guhişîn u qehirîn, biguhişe u biqehire to be disappointed (Wextê Şîrînê şî kirî, ez guhişîn u piçekê qehirîm. *When Şîrîn got married I was disappointed.*)

guhişîn, biguhişe (1) to be amazed (Ez guhişîm. *I was amazed.*)
 (2) to be surprised (Ez guhişîm wextê Faris hat. *I was surprised when Faris came.*)
guhurrîn, biguhurre to change (Ezê çim pêlava xwe guhurrim. *I'll go change my shoes.*)
gul (f) (1) flower (Ez hês ji gulêt pîvazî dikim. *I like pink flowers.*)
 (2) plant
gulçêker florist
gulçîsk (f) kidney
gulkê dermala fattened calf
gulte crutches (Ew bi gulta bi rê ve çit. *He walks with crutches.*)
gumbabuk (f) mushroom
gund (m) (1) village
 (2) town
gunnebar criminal (Heker gunnebar ne ba... *If he weren't a criminal ...*)
gunneh (m) (1) sin
 (2) wrong
 (3) bad mistake
gunnehbar a debtor who doesn't pay back his debt (Wî gunnehbarî kir. *He didn't pay back his debt.*)
gunnehkar sinner (gunnehkarek peşêmanêt *a sinner who repents*)
gupal (m) (1) cane
 (2) shepherd's staff
gure (f) sock (gura bi derpê *pantyhose / tights [for girls]*)
gurig (m) wolf (orênia gurga *the wolf's howl*)
gurî bîn, gurî bibe to sacrifice
gurî kirin, gurî bike to sacrifice (Xwedê heywanekê gurî kir. *God sacrificed an animal.*)
gurz (1) bundle
 (2) large bunch [of flowers]
gusik (f) small jug [for water] (Min gusik bire ser banî da bitezit. *I brought a jug [of water] up on the roof so that it would get cold.*) (Gusik nî ye, av tezî ye. *A new jug, nice cold water.*)
gustîrk (f) ring (Gustîrka min zêrr e. *My ring is gold.*)
gutinêt mezin proverb
guv (f) barn (Min deh pezêt heyn di nav guvê da ye. *I have 10 sheep in the barn.*)
guv (f) ranch (guva çêla *corral*)
guzek (f) ankle
gûtin parable
gûtin, bêje (*see* gotin, bêje)

h

- Habîl** Abel
- har** (1) very active [child]
(2) undisciplined [child]
(3) naughty [child] (Ev biçîkêt te çend har in! *Your children are so naughty!*)
(4) into everything [child]
(5) angry
(6) difficult / impossible to live with (e.g., fights a lot) (Bîka wan çi har e! *Their daughter-in-law is hard to get along with!*)
(7) (*see also* xatîn)
- harî (karîa) ... kirin, harî (karîa) ... bike** (1) to help (Min divêt tu harî (karîa) min bikî. *I want you to help me.*) (Te evroke gelek harî (karîa) mi kir. *Today you helped me a lot.*) (Harî min bike! *Help me!*)
(2) [idiomatic] independent (Bi xwe harî karîa xwe bi tinê dicit. *He does [the work] by himself.*)
(3) [idiomatic] dependent (Her harî karî divêt. *He wants help with everything.*)
- harîet (f) (Ar)** liberty
- harîkar** helper (Min harîkar nîne. *I don't have a helper.*)
- Harun** Aaron
- haş xwe hebîn, haş xwe (he)be** to be careful
- hatin bîne xwarê, were bîne xwarê** to be marked down [on sale] (Ez evroke çûme sîkê. Gelek tişt hat bîne xwarê. *I went to the store today. Many things were marked down.*)
- hatin def ..., were def ...** to have sex (Jiberî bêt def te lastîkî kit ber xwe. *Before he goes to you to have sex, put on a condom.*)
- hatin ve, were ve** to come back
- hatin xwar, were xwar** to come down (Gijluk hate xwarê. *Hail came down.*)
- hatin, bê (were)** to come (Ez hatim. *I came.*)
- havêjine** to throw [in the fire or something]
- havêtin, bavêje** (*see* havêtin, pavêje)
- havêtin, bihavêne** to throw [something] into [something else]
- havêtin, pavêje** (1) to push [so as to make someone/thing fall] (Pişîka min qelemê min havêt. *My cat pushed my pen [so that it fell.]*)
(2) to throw away
(3) to discard
(4) to take out (Ziblî pavêje. *Take out the garbage.*)
- havîn (f)** summer

- havîn (f)** summer
- he** [specific reference marker] (Ev qelemê he sorr e. *This [specific] pen is red.*)
- hebîn, hebe** (1) to be
(2) to exist
(3) to have (Te qelem heye? *Do you have a pen?*) (Min dû qelemêt heyn. *I have two pens.*) (Min sê pişikêt heyn. *I have three cats.*)
(4) [idiomatic] (Min şulekê te hey. *I want to talk to you about something.*)
- hedîe (f) (Ar)** gift
- hejandin, bihejîne** to shake [someone] (Ezê te hejînim. *I'm going to shake you!*) (Destê min bihejîne. *Shake my hand.*)
- hejar** poor (Nanî belave ke li ser hejara. *Give the bread to the poor.*)
- hejde (f)** eighteen
- hejî** (1) subject to
(2) answerable to
(3) in danger of (something)
- heker** (1) if (Heker ez çûm ... *If I went ...*)
(2) when (Heker tu bê mala me, wê bîne. *When you come to our house, bring her.*)
- hel kirin, hel bike** (*see* hil kirin)
- helbet** of course (Helbet ez u tu dê çîne mala Çîmenê çinko dê çine Kurdistanê. *Of course you and I will go to Çîmen's house, because they are going to visit Kurdistan.*)
- helgirtin, helgire** to take on (Barsulê min helgirin. *Take my yoke upon you.*)
- helkêşan, helkêşe** (1) to root up (da ku genimî ne helkêşin *in order that the wheat won't be rooted up*)
(2) to pull out (Mîa wê helkêşit. *Her hair was pulled out.*)
- helkêşe** (*see* helkêşan)
- hema** just because (Hema ez piçekê çûm sîkê. *I went shopping just because.*)
- hema kengî bit** anytime
- hema wexte bêt** (1) soon
(2) expected time (Ka, eve ne hat Şîrîn? Hema ewe wexte bêt. *Hasn't Şîrîn come yet? She'll come when she gets here.*)
- hemd (m)** praise (Em hemdê bu Xwedê dikin. *We're praising God.*)
- hemî** (*see* hemî)
- henere??** to send (pictures) (Bu wî risim henerim. *I send him pictures.*)
- henêre** (*see* hinart)
- her** (1) every (her roj *every day*)
(her çar pênç roja *several days / every four to five days*)
(her dû sê roja *a few days / every two to three days*)

(2) always (Kesma u kadêt xwe her husa çeke. *Always make your cookies like this.*) (Ez çûme mala Adarê. Her wesa Şîrîn gel min hate malê. *I went to Adar's house. Şîrîn always came with me [like this – to Adar's house].*)

her car (1) usually

(2) always

her cêh da immediately (Her cêh da ez çûm. *I left immediately.*)

her çende although (U her çende 'Îsaî jêravkirin ne dikir ... *Although Jesus did not baptize ...*)

her dem (1) usually

(2) always

her dû both (Her dû hatin def min. *They both came to my house.*)

(2) [idiomatic] (her dû roja carekê *every two days*)

(3) [idiomatic] (her dû rojê çûm *for the last 2 days*)

her roj daily

her u her (1) always

(2) forever (Ez dê mînim li Kurdistanê her u her. *I will stay in Kurdistan forever.*)

(3) eternal

herre (*see çûn*)

hesik (m) spoon (large) used for cooking for crowds

hesp (m) horse (Ez sîar bîm [li hespî]. *I rode [the horse].*)

hestî (m) bone (Hestîê destê min şikest. *My arm bone broke.*)

hestî giran miserable [person]

hestî sivik pleasant [person]

hestîê heçî pelvis

hestîê piştê spinal column

hestîê serî skull

hestîfka ziblî dust pan

heşt (f) eight

heştê (f) eighty

hetik (f) (1) disgrace [a very, very bad disgrace] (Te hetka min bir. *You disgraced me.*)

(2) scandal (Monicê hetka Clintonî bir. *Monica and Clinton had a scandal.*)

heval (m/f) friend (Ez u tu hevalêt êk îm. *You and I are friends.*)

(hevalê berîkê *fair-weather friend [idiomatic]*) (hevalê dilvêteng *all-weather / faithful friend [idiomatic]*)

hevalanetî (f) relationship (Hevalanetîa min u Nazdarê li gel êk u dû xweş e. *My relationship with Nazdar is great.*)

hevde (f) seventeen

hevîr kirin, hevîrê bike to knead

hevîr tîrş (m) yeast

hevîng (m) brother-in-law [husband of my wife's sister]

hewa (m) wind

hewar kirin, bike hewar to shout (Min hewar kire Nazdarê ji derve. *I shouted for Nazdar outside [because she was lost].*)

hewe (1) you (pl) [oblique]

(2) your (pl) [oblique]

hewîe i.d. card [social security card, drivers license, health/car insurance card, etc.]

heyamek a short time [days, weeks] (Eve heyameke min biraê xwe min ne dîte. *I haven't seen my brother for a few days.*)

heyamek dî after a short time [days, weeks]

heyv (f) (1) month (heyva bê *next month*) (heyva têt *next month*)

(heyvek dî *next month*) (heyva çû *last month; a month ago*)

(heyva êk (f) *January*)

(heyva dû (f) *February*)

(heyva sê (f) *March*)

(heyva çar (f) *April*)

(heyva pênc (f) *May*)

(heyva şeş (f) *June*)

(heyva heft (f) *July*)

(heyva heşt (f) *August*)

(heyva neh (f) *September*)

(heyva deh (f) *October*)

(heyva yazde (f) *November*)

(heyva duzde (f) *December*) (Heyva duzde ez Xwedê dam. *I was born in December.*)

(2) moon (heyva temam *full moon*) (heyva dû sê rojê main *crescent moon*) (nîva heyvê *quarter moon*) (heyv nî *new moon*) (Heyva me ye li çardê ye. *Our moon is full.*)

heyvî pregnancy [idiomatic] (Zikê min heft heyvî bî. *I was/am in my seventh month of pregnancy.*)

heze (f) earthquake (Evro hezek çê bî li Tirkîe. *There was an earthquake in Turkey today.*)

hezîret (f) presence of [someone] (Ew derket ji hezîreta Xwedê. *He went out from the presence of God.*) (dî nav hezîreta Xwedê da *in the presence of God*) (Deyka min yê hezîreta Xwedê da. *My mother is in the presence of God.*)

hêdî slowly (Ez hêdî çûm da kes min ne bînit. *I went slowly so no one would see me.*)

hêdî hêdî slowly (Hêdî hêdî em bigehîne sîkê. *Go slowly until we get to the market.*) (Hêdî hêdî were xwarê da çi lê ne êt. *Go slowly! and come here so that nothing happens to you [said to children].*)

hêja [a title of respect, especially for presidents] (Hêja Şîrîn hat mala me. *[This respected person] came to our house.*)

hêjîr (f) fig

hêjîra bîladî (f) cactus

hêk (f) egg (Mirîşk hêka dikit. *The chicken lays eggs.*)

hêk kirin, hêk bike to lay eggs (Mirîşk hêka dikit. *The chicken lays eggs.*)

hêl (f) cardamon (Hêlê bike di nav çayê da. *Put cardamon in the tea.*) (Min çayek bi hêl vexwar. *I drank tea flavored with cardamon.*)

hêlan, bihêle (1) to allow
 (2) to let (Pişikî min nahêlit ez şul bikim. *My cat won't let me do my work.*) (Bihêlin her dû pêk ve şîn bibin. *Let them both grow together.*)
 (3) to keep
 (4) to cause
 (5) to leave (Min mala xwe hêla ez hatim Emrîke. *I left my house when I came to America.*) (Bu min axiftina xwe ser mekînê bihêle. *Leave me a message on the machine.*) (Min hevala xwe hêla Shopper's. *I left my friend at Shopper's.*)
 (6) to abandon (Babî biçîkê xwe hêlan. *The father abandoned his children.*)
 (7) to give up (Wextê ez çûm Kurdistanê, min hindek 'edetêt Emrîka hêlan. *When I went to Kurdistan, I gave up some of my American culture.*) (Bihêle. Paşî çêke. *Leave it/give it up; do it later.*)

hêlikupter (f) helicopter

hêlîn (f) nest (Teyr lîsîn ser hêlîna xwe. *The bird perched on his nest.*)

hêş (1) yet
 (2) more (Hêş bixwe. *Eat some more.*) (Ka hêş bide min. *Give me some more.*)
 (3) almost (Biraê min hêş ne bî ye çil salî. *My brother is almost 40 years old.*)

hêş ka tu a long time (Hêş ka tu heta tu xilas bî. *It was a long time until you finished.*) (Dê kengî çî Kurdistanê? Hêş, ka tu? *When will you go to Kurdistan? Oh, not for a long, long time! [not now]*)

hêz (f) strength (Hêza wî ne maî ye. *His strength is gone.*)

hiçik (m) sleeve

hijde (f) eighteen

hijmar (f) (1) settlement
 (2) number
 (3) accounts

hijmarê kirin, hijmarê bike to settle accounts / issues (Paşîkê vîa hijmarê di gel kuîlêt xwi biket. *A king wanted to settle accounts with his servants.*)

hijmartin (f) number (Hijmartinê bu min bêje. *Say the number for me.*)

hijmartin, bihijmêre to count (Min gîz hijmartin. *I counted the walnuts.*)

hil kirin, hil (bi)ke (1) to set fire
 (2) to light [fire, lamp] (Vî agirî hil ke. *Light this fire.*)

hilavêtin, bihilavê (1) to throw up (Dilê min xirab bit, ez dê hilavêjim. *I feel like I'm going to throw up.*)
 (2) to vomit

hilgirtin, hilgire (1) to keep (Evî qelemî bu min hilgire. *Keep this pen for me.*)
 (2) to save (Tu çawa pare hildigirî? *How do you save money?*)
 (3) to leave (Ewan zerra hilgire. *Leave the gold.*)

hilingiftîn, hilingifte to choke (Dihî tu hilingiftî. *Yesterday you choked [on food or water].*)

hilkêşan, hilkêşe (*see* helkêşan, helkêşe)

hilkêşe (*see* hilkêşan)

hilkirin, hilke to turn on (Gilopê hilke. *Turn on the light.*)

Hilû! Get up! Move!

hinar (f) pomegranate (Hinarê bu min hîr ke da ez bi kefçikî bixwim. *Take the seeds out of the pomegranate so I can eat them with a spoon.*)

hinartin, bêhinêre to send [people or things]

hinartin, henêre to send [people or things] (Ez dê bu wî hinêrim. *I will sent him [the pictures].*) (Min hinart. *I sent [it].*)

hinartin, binhêre to mail (Min mektuba xwe hinart. *I mailed my letter.*)

hinav êsî intestinal parasites

hind enough

Hind (f) India

hinda lost (Ez hinda bîm. Me nizanî rêkê. *I was lost. I didn't know the way.*)

hinda kirin, hinda bike to misplace (Hinda ne ke! *Don't lose it.*)

hindav above

hinde ca sometimes

hindek (1) several (Hindek mirov li mala Leymînê bîn. *Several people were at Leymin's house.*) (Hindek şekirê bide min. *Give me several [cubes of] sugars.*)
 (2) some (Min hindek gilas hene. *I have some drinking glasses.*)
 (3) a number of (Min hindek xîar kîrrîn. *I bought a number of cucumbers.*)
 (4) a little

hindek cara sometimes
hindek roja almost (Hindek roja ji heftê ez dewî vedixwim. *Almost every day I drink the yogurt drink.*)
hindek tişt something
Hindî East Indian
hindî even though (Hindî min ne vîa ez biçim, paşî ez çûm. *Even though I didn't want to leave, I left.*)
Hinduk American Indian
hiraî kirin, hiraî bike to grind (Em darçînê hiraî dikirîn. *We ground the cinnamon.*)
hiravî (m) legend (“Mam u Zîn” hiravîekî kevin e ji kelepurê Kurdî. *“Mam u Zîn” is an ancient romantic Kurdish legend in Kurdish history.*)
hirç bear
hircîmî ... kirin, hircîmî ... ke to attack (Şêrî hircîmî min kir. *The lion attacked me.*)
hirçke sleeve
hirmîk (f) pear (Hirmîkê ji darê bike. *Pick the pear [off the tree].*)
hirub winds (Hiruba hatin u bi vî xanî ketin. *The winds blew and beat against that house.*)
hişîar awake
hişîar bîn, hişîar bibe to wake up [by oneself]
hişîar kirin, hişîar ke to wake up [someone] (Pişîka min ez hişîar kirim. *My cat woke me up.*)
hişîara xwe bîn, hişîara xwe be to be careful (Leymîn hişîara xwe ne bî u ket. *Leymîn wasn't careful and fell down.*)
hivde (f) seventeen
hizar (f) (1) one thousand
 (2) mind (with all your mind *ji hemî hizara xwe*)
hizar milyon one billion
hizir (f) idea (Hizirek hate bîra min. *I got an idea.*) (Min çî hizir nînin. *I don't have any ideas.*)
hizirê xwe kirin, hizirê xwe bike (1) to think about (Hizirê xwe bike; paşî bêje min. *Think about it and tell me later.*)
 (2) to daydream (Tu çî hizirê xwe dikî? *What are you daydreaming about?*)
hîç (Ar) nothing
hîn (1) you (pl) [direct] (Hîn werin! *Y'all come!*)
 (2) just right: not cold, not hot [weather]
hîngê (1) at that time
 (2) then (A: Tu kengî çû mala Canê? B: Hîngê, wextê em ji

medresê hatin. *A: When did you go to Canê's house? B: Then, when we got home from school.*)

hîngivîn (m) honey
hîr petite (Senar hîr e! Kulilk jî gelek hîr e. *Senar is very small. Kulilk is also very petite.*)
hîr kirin, hîr (bi)ke (1) to chop (Pîvaza hîr ke. *Chop the onions.*)
 (2) to cut [into small pieces with a knife] (Xîarî hîr ke. *Cut the cucumber.*)
 (3) to separate the small seeds of a pomegranate (Hinarê bu min hîr ke da ez bi keçîkî bixwim. *Take the seeds out of the pomegranate so I can eat them with a spoon.*)
hîrde (1) change [money]
 (2) fare
hîrk a little bit
hîrkê kotilka (f) soup with meat patties
Hîrudês King Herod
hîter (f) heater [electric]
hîvî kirin, hîvî bike to hope (Ez hîvî dikim biçim Kurdistanê. *I'm hoping to go to Kurdistan.*)
